



# KNK Bulten

Bultena Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê \* Hj.: 3 \* Tîrmeh 2007

## Kombûna mezin ya KNKyê di rojên 23 û 24ê Hezîrana 2007ê da li merkeza KNKyê li Brukselê pêkhat

KNKyê bi beşdarîya 70 endamên xwe kombûna xwe ya mezin kir. KNK kombûna xwe ya giştî du sala carekê dike, belê salê carekê jî kombûna xwe ya mezin digel hemû endamên xwe pêktîne. Ev kombûna 23 û 24ê Hezîranê, kombûna normal ya endaman û beyî hilbijartin bû. Serokê KNKyê Elî Egîd kombûn bi rê ve bir û axivtina vekirinê kir. Raporê konseya rêvebir Rojan Hazim pêşkêş kir. Bersiva pirs û rexneyên endaman jî Felemez Başboxa da. Raporê xebata salekê ya konseya rêvebir ji teref endaman ve bi berfirehî hate biha kirin û digel rexne û razibûnan, rapor bi yêkdengî hate herê kirin. Di kombûnê da jî kontenjana konseya rêvebir çend endamên nû jî sûnd xwarin û bûne endam. Konseya Rêvebir ya KCKyê, PYD, PJAK û PÇDKyê jî mesajên piştgirîyê şandin.

Serokê KNKyê Elî Egîd [Ali Yigit] bi deqîqeyek rêzgirtina şehîdan kombûn vekir û pêşniyara konseya rêvebir ya li ser rojevê pêşkêşî kombûnê kir û rojev bi herêkirina endaman hate qebûl kirin.

[Li ser “Kombûna mezin”, binêrin rûperê 2yê.]

***Murat Karayilan:  
”Bila rojêke zimanê  
Kurdî jî hebe”***

### ***14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî hate pîroz kirin***

*Serokê Konseya Rêvebir ya KCKyê [nihe KCK] Murat Karayilan mesajek bo Konseya Rêvebir ya KNKyê şand:*

*„ Ji bo birêz serok û rêvebirîya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê,  
Ji bo we hemûyan, silav û rêzên xwe pêşkêş dikin û di xebata we da ji bo we serkevtinê em dixwazin. Biryara 14ê Gulanê, bi roja zimanê Kurdî be, em jî biryareke di cih da dibînin. Bila rojêke zimanê Kurdî jî hebe...”*

[Li ser “Cejna Zimanê Kurdî” binêrin rûperê 13ê.]

# Kombûna mezin ya KNKyê

Kombûna mezin ya KNKyê bi vê rojeva li jêr  
pêkhat:

## ROJEVA KOMBÛNA MEZIN YA KNKYÊ

(Kombûna 7. – 23 - 24. Hezîran. 2007, Bruksel)

### Roja Yêkemîn: 23. 06. 2007

Seet :

13.00	Vekirin
13.30	Merasima sûndxwarinê ji bo edamên nû
14.00	Axivtina serokê KNKyê
14.30	Pêşkêşîya rapora xebatê ya Konseya Rêvebir
14.45	Riberiz [munaqêşe] û gotûbêja li ser raporê
15.45	Navbir
16.30	Axivtina li ser bûn û bûyerên sosyal û polîtîk yê li Kurdistanê û cîhanê
18.00	Navbira şîvê

### Roja Duyemîn: 24. 06. 2007

09.00	Gotûbêj û pêşniyarên j ibo xebata paşerojê
10.00	Kombûnên komisyonan
12.00	Navbira firavînê
13.00	Riberiza [munaqêşeya] giştî li ser pêşniyaran
14.30	Xala serbest
15.00	Girtin

# Axivtina serokê

## KNKyê

## ELÎ EGÎD

## ya di vekirina

## kombûna mezin ya

## KNKyê da kirî, li jêr

## didin:

**Dîwana birêz,**

**Endamên hêja,**

Di serî de em we teva bi hûmet silav dikin û hûn bi xêr hatin. Cîvata giştî ya KNKyê ya 7. li we teva pîroz dikin.

Civîna me di demekî ku li rojhilata navîn û li welatê me bûyerên girîng derbaz dibin çêdibe. Tevlî hevî û rewşa alozî hîna jî berdewam dike. Ji aliyê dî şerekî mezin li Kurdistanê tê meşandin. Li her alî gelê me di nav tekoşînekê mezin de ye. Ji aliyê din li hember tekoşîn û destkeftiyên gelê Kurd êrişên dagîkeran bi awayekî berfireh tên meşandin.

Em wek Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNK, ku dezgehekî Kurdistanê ye, wezîfa me ev e deskeftiyên ku hatine çêkirin biparêzin û li hember êrişên li ser deskeftî û tekoşîna gelên me tên meşandin xebatê bikin. Û van êrişan vala derxin. Tekoşîna li her çar perçeyên Kurdistanê ku tê meşandin destek bikin.

**Dîwana birêz,**

**Endamên hêja,**

Me divêt dema derbasbûyî de heger tam bersivê xurt nedabe jî, li gor îmkanan hinek kar û xebat hatin meşandin. Lê belê, divêt em bêjin ku di dema ku derbas bûyî de hinek pisgirêkên me hebûn. Ji demekê pêde me ev problem hinekî çareser kirin. Wek hûn dizanin, KNK li ser çend xalên esasî xebatê dimeşî. Karên yêkîtiya neteweyî û xebatên dîplomasîyê yê derve. Meseleyên ziman û çandî jî di nav xebatên me de karên bingehîn in.

Em di vê bîr û baverîyê de ne ku di dema pêş da em

dê bikarin KNKyê wek dezgehekî hîn bi rêk û pêk bidin xebitandin. Endamên xwe bêhtir tevî xebatan bikin. Derfet û îmkân ji dema derbasbûyî baştir xuya dikin. Em naxwazin li ser xebatên di dema derbasbûyî de bisekinin. Ji ber ku di rapora xebatên Konseya Rêvebir de ew dê pêşkêşî civata giştî bibe.

**Endamên birêz,**

Di dema derbasbûyî de ji bona endamtîya KNKyê hinek heval hatin pêşniyar kirin. Li ser esasê civata giştî ya KNKyê ya destpêkê ku ji bona standina endaman selahîyet dabû Konseya Rêvebir. Heval wek endam ji aliyê Konseya Rêvebir hatin hilbijartin. Û kontejanên Partîyan, wek PJAK, PÇDK û PYD ji yêkê bûn du.

Wek hemî caran em carek dî bang tevayîya partîyan, dezgehên neteweyî û şexsîyetên Kurdistanî dikin û dibêjin vê dema em têda derbas dibin demeke pir muhîm e ji her demê bêhtir pêwîst e em li wezîfeyên xwe yê neteweyî xwedî derkevin. Û kar û xebatê bikin.

Em carek din we tevan bi hurmet silav dikin. Û em hêvîdar in di vê civîna me da dê biryarên herî xurt derkevin.

23. 06. 2007

**Elî Egîd (Alî Yîgît)**  
**Serokê KNKyê**

\*\*\*

***”... Wek hûn dizanin,  
KNK li ser çend xalên  
esasî xebatê dimeşîne.  
Karên yêkîtîya neteweyî û  
xebatên dîplomasîyê yê  
derve. Meseleyên zîman û  
çandî jî  
di nav xebatên me de  
karên bingehîn in...”***

# Rapora Konseya

## Rêvebir ya

## Kongreya

## Neteweyî ya

## Kurdistanê,

## endamê konseya

## rêvebir ya

## KNKyê

## ROJAN HAZIM

## pêşkêş kir:

**Endamên hêja,**

Hûn hemû bi xêr hatin kombûna mezin ya KNKyê. Wekî hûn dizanin, KNKyê kombûna xwe ya giştî par, anku sala 2006ê li 13 û 14ê Gulanê li Brukselê pêkînbû. Em difikirîn ku vê kombûna xwe ya mezin jî dîsa ve di 12 û 13ê Gulanê da, anku tam piştî salekê, pêkînin. Lê belê, bûyerên ne di hesabê da rûdan, lewma me demê kombûnê teqrîben mehekê paşda ji bo van rojên Hezîranê. Em gelek şa ne ku vaye hûn hemû li vê derê ne û kombûna me ya mezin bêyî astengî pêkhat û dubare xêr hatinê li we didin û spas dikin ku hûn hatine.

**Endamên birêz,**

Di midehê salekê da helbet dem nerawesta û bi hêz û hêla çemên Kurdistanê herikî. Di binê pirên

Kurdistanê û welatên di yên cihanê da gelek av fûryan û herikîn. Di vî demê dirêj da gelek bûn û bûyer li Kurdistanê û li dorberê Kurdistanê û li cihanê qewimîn. Heke em bi rêza giringîyê van qewimînan vewejêrin tabloyeke bi vî rengî derdikeve ber me:

Piştî kombûna giştî ya Gulanê, li havîna 2006ê bûyera herî balkêş û bi tesîr axivtin û riberiza li ser îlankirina agirbesê bû. Li bîra we hemûyan e, ji ber hindê hewce nake ku em bikevin kûrahîya wê prosesê. Axir Amerîka û hukûmeta Kurdîstana Federal dîrekt-îndîrekt rolek leyistin û HPGyê bi biryara polîtîk ya birêz Ocalan û KKKyê, [ji nîveka meha Gulanê were jî êdî bû KCK], serê Îlona 2006ê biryara agirbesê da û agirbesê ji serê meha Çirîyê [meha deh] pêve dest pê kir. KNKYê di vî warî da piştevanîyeke xurt, germ û bihêz da prosesê û lewma jî ev prosesa nû ji teref hemû xelkê Kurd ve jî hate destek kirin. Piştî îlana agirbesê û destpêkirina prosesa nû, atmosfereke gelek pozîtîv hakimî jîyana polîtîk ya Kurdistanê bû. Vî hewayê nû tesîreke baş li ser rewşa Kurdîstana Federal jî kir. Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê jî bi axivtinê jî be ev prosesa nû bi başî biha kirin û hêvîya domandina vê prosesê kirin. Lê mixabin ku piştî demekî kurt, dewleta Tirk manayeke giring neda vê polîtîka û pozîsyona nû ya terefê Kurd û êrişên xwe yên leşkerî zêdetir û berfirehtir kirin. Dewletê ev gava nû ya alîyê Kurd şaş mana kir, wekî jar û lawazîya terefê Kurd biha kir û bi hisabeke gelek xelet operasyonên xwe li Kurdistanê zêde kirin.

Ji Gulana 2006ê heta Gulana 2007ê jî dewleta Tirk bersiveke pozîtîv neda pêşengîya xelkê Kurd û operasyonên xwe yên birandinê domandin. Dewlet bi operasyonên xwe yên leşkerî û polîsî ve nema, mekanîzmayên xwe yên dadîyê jî aktîve kirin û bi doz li ser dozê vekirinê adeta bêhn li xelkê Kurd hate çik kirin ku kar û xebata legal pêşnekeve. Îro bi dehan polîtîkerên Kurd di hefsê da ne. Li ser, di serî da Ocalan û hemû girtîyên polîtîk yên Kurd, îşkence û şiddeteke nedîtî tete bi kar înan. Di dawîyê da derkete meydanê ku Ocalan bi plan tete jehrî dan ku di di demekî dirêj da bête mirandin.

Helbet di vî demê nazîk da krîza polîtîk ya nav dewleta Tirk jî bi hemû reng û rûyên xwe ve derkete meydanê. Di merkeza krîzê da hilbijartina serokkomar dihate nîşandan. Belê di esas da kakilê krîzê pîrsa Kurdî bû. Ertêşa Tirk hukûmet kire nav devê meqesê ku bi berekê du çûçîka bikuje û hem hukûmetê bêxe nav tengavîyê, hem jî bi destê hukûmetê polîtîka antî Kurd radikalîze bike. Hukûmetê jî her ji bûyera Şemdîna pêve hevsarê xwe bi destê ertêşê ve

berdabû. Lewma jî ji serê sala 2007ê pêve însîyatîv ji destê xwe revand û hevsar ket destê ertêşê. Di rojên kîvşkirina namzet û rikeberîya opozîsyona nav parlamentê da, ertêşê muhtiraya faşîst ya 27ê Nîsanê da ku tîrên herî dijwar dirêjî xelkê Kurd kiribûn û êdî kontrol bi timamî kete destê ertêşê û ji xwe dadgeha makqanûnê jî paralelî muhtiraya leşkeran û opozîsyona nasyonalîst biryar da û êdî hukûmetê jî prosesa hilbijartinan da dest pê kirin.

[Ji xwe wekî hûn dizanin hilbijartin di 22yê Tîrmehê da tene kirin û Kurd bi namzetên serbixwe dikevin hilbijartinan û KNKYê jî piştevanîya xwe kîvş kir bo namzetên serbixwe yên DTPyî. Bi vê munasebetê em careke di bangî xelkê xwe dikin ku piştevanîyeke xurt bidine namzetên DTPyî ku grûbeke parlementerên Kurd jî bikevin parlamenta Tirkîyeyê.]

Wekî li Tirkîye û bakura Kurdistanê ev bûyer diqewimîn, dewleta Iranê jî êrişkarîya xwe gelek bi şiddet didomand li rojhilata Kurdistanê. Di navbeyna hêzên gerilla yên PJAKê û ertêşa dewleta Iranê da şerekî diwar hêj jî dom dike. Beramberî van êrişên Iranê, berxwedana xelkê me jî ne tinê di warê leşkerî da, herweha li unîversîteyan, li bajêran bi rengê sivil jî berdewam e.

Dewleta Sûrîyeyê jî di reftara xwe ya antî Kurd da guhorînek nekirîye û di hilbijartinên 22yê Nîsanê da jî antî demokratîzma xwe bi şiddet domand û rê neda ku xelkê Kurd nûnêrên xwe hilbijêre ji bo parlamenta Sûrîyeyê. PYDyê ev reftara hukûmeta Sûrîyeyê ya antî deokratîk bi xurtî protesto kir.

Di encam da, di midehê salekê da, anku ji piştî kombûna giştî ya KNKYê ya 2006ê heta kombûna mezin ya 2007ê ya KNKYê, ne di polîtîka dewleta Tirk da, ne jî di polîtîka dewletên Iran û Sûrîyeyê da ji alîyê pozîtîv ve tişteke pêknehatiye, tam bereks dijberîya bizava neteweyî ya xelkê Kurd tûjtir û diwartir bûye. Kurdistan bi taybetî di du parçeyan da, li bakur û rojhilat, bûye meydana operasyonên leşkerî, ku ji xwe ji van operasyonên dawîyê jî eve xuya dibe.

Piştî kombûna giştî ya Gulana 2006ê, KNKYê daxuyanîyek belav kiribû û wisa gotibû ; « ... di roja îro da konfilîkta sereke di navbeyna hêzên demokrasîxwaz û antî demokratîk da ye... » Ev tesbîte di derbareyê pîrsa Kurdî da hem li Tirkîye, Iran û Sûrîyeyê û hetta di Iraqa nû ya Federal da, hem jî li seranserê cihanê jî xala sereke ye. Rastîya vê tesbîte îro jî kîvş e. Bizava neteweyî ya xelkê Kurd

di rêza pêşiyê ya bizava giştî ya demokrasîyê da ye li rojhilatanavîn. Çareserîya konfilîkta sereke bêyî çareserîya pîrsa Kurd pêşnakeve li rojhilatanavîn ku eve tesîrê li ser polîtîka cîhanê jî dike. Anku îro kililê vekirina pîrsgirêkên li rojhilatanavîn ji çareserkirina pîrsa xelkê Kurd derbaz dibe. KNK îro jî di vê bawerîyê da ye û em dê kar û xebata xwe li ser çareserkirina vê konfilîkta sereke vehûnin û ji bo pêkînan tifaqa navxweyî ya neteweyî jî bê rawestan kar bikin.

### **Kar û xebata salekê**

Ji Gulana 2006ê were, KNKyê kar û xebata xwe bi plan di rê birîye. Konseya rêvebir her du meha carekê perîyodîk kom bû. Piştî sefera Kurdistana Federal konseyê di meha Sibatê da jî kombûneke awarte kir. Li ser her bûn û bûyerên welatî daxuyanî hatine dan. Komîsyonên me kom bûne, karên xwe kêm zêde kirine. Komîsyona karê derve kar û xebatên dîplomatîk kirin û di amadekirina konferansa Çirîya 2006ê da ya li Parlemta Ewrûpayê, roleke giring leyist û bi navê KNKyê jî endamê Konseya Rêvebir Adem Uzun axivtinek kir.

Ji nav komîsyonên me, “Komîsyona ziman û perwerdeyê” kar û xebatên gelek baş, dînamîk û balkêş kirine. Di serî da, planê xebata xwe birin serî. Kampanyaya ziman organîze kirin û di rê birin. Digel organîzasyonên polîtîk, sosyal, kulturî û hunerî kombûneke fireh li 12ê Tebaxa 2006ê li Kolnê kirin û encamên wê kombûnê jî di hejmara yêkê ya Bultenê da cih digirin. Destpêka sala nû, di 12ê Çileya 2007ê da sempozyûma zimanî di Parlemta Belçîkê da kom kirin. Biryara pîrozkirina 14ê Gulanê, roja « Cejna Zimanê Kurdî » dan û hazirîyên pîrozîyê kirin. Afîşek ji bo cejnê hate çap kirin. Reklamek jî bi sponsorîya ROJ TVyê hate amade kirin û ji bo danasîna roja « Cejna Zimanê Kurdî » di ROJ TVyê da hate weşandin. Agahîyên li ser cejnê di hejmara duyê ya Bultenê da hatin weşandin. 14ê Gulanê êvarî jî, bi beşdarîya gelek bîyanî û Kurdan, resepsiyonek li avahîyê KNKyê hate dan. 14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî bi desteka KKKyê, [nihe bû KCK], li seranserê Kurdistanê û meydanên cuda yê dîasporayê bi boşahî û coş û heyecaneke mezin hate pîroz kirin û bi pêşengîya KNKyê bû tradîsyoneke neteweyî.

Komîsyona Jinan jî, ji bilî hazirkirina konferansa jinan, xebateke berfireh nikarîye bike û « Konferansa Jinên Kurdistanê » jî di rojên 30ê Hezîranê û 1ê Tîrmehê da li bajêrê Elmanya li Bonnê dê bête

kirin.

Komîsyona Civakî û Çandî ji ber rewş û ji hev dûrîya endaman û nebûna îmkânên aborî karê ku jê dihate hêvî kirin nikarî bike.

Komîsyona Karê Neteweyî jî, ji ber rewş û atmosfera polîtîk ya şîthayî û nebûna diyaloga navxweyî ya organîzasyonên Kurd û Kurdistanê, mixabin ku karê ku jê dihate hêvî kirin nikarî pêkbîne. Hevdîtîna û têkilîyên hewce yê di çarçoveya neteweyî da, direkt bi xebata konseya rêvebir hatin kirin.

Di payîza sala 2006ê da sê kombûn digel ronakbîr û polîtîkerên serbixwe yê Kurd li Berlîn, Koln û Stockholmê hatin kirin û encamên wan kombûnan jî di hejmara yêkê ya Bultenê da cih digirin. Herwisa li Kopenhagê jî semînereke li ser ziman hate dan. Li aliyê dî, ji serokê KNKyê heta endamên konseya rêvebir û endaman, seradanîya komele û enstîtuyên Kurdî hatîye kirin. Dîsa KNKyê beşdarîya hemû şîna û behîyên malbatên şehîda jî kirîye û xema wan parve kirîye.

KNKyê sê cara seradanîya Kurdistana Federal kir. Cara pêşîn endamê konseya rêvebir Rojan Hazim di meha 11an ya 2006ê da çû û di midehê du heftîyan da digel kes û hêzên Kurd hevdîtîna pêkînan û herweha seradanîya rêvebirîya KKKyê jî kir. Di sala nû da jî heyeta KNKyê ku ji serokê KNKyê Elî Egîd, endamên konseya rêvebir Tahir Kemalîzade, Rojan Hazim û Adem Uzun pêkdîhat, bo sê heftîyan çûn Kurdistana Federal û hevdîtînen berfireh pêkînan. Ji partîyên desthilatê heta yê opozîsyonê, ji serokatîya parlementê heta parlementera û wezîran, ji ronakbîr û nivîskaran heta hunermenda û xelkê sade hevdîtînen gelek berwer pêkînan. Heyeta KNKyê digel heyeta KKKyê jî rûnişt û li ser kar û xebata KNKyê lihevhatîneke maqûl pêkînan. Di vê seradanîyê da teklîfa vekirina buroya KNKyê jî bo berpirsiyarên Kurdistana Federal hate kirin û şertên vekirina buroyê hatin gihandin û biryara vekirina buroyê hate dan. Îro herçend avahîyek hêj nehatibe kirê kirin jî, belê temsîlkarê KNKyê li başûr e û di nav têkilîyan da ye. Heyeta sêyê jî di meha Adarê da çû ku ji Felemez Başboga, Hesên Nozedzade û Adem Uzun pêkdîhat. Wan jî gelek hevdîtîna kirin digel polîtîker û ronakbîran û li Hewlêrê kombûneke berfireh pêkînan, ku wezîrê kulturê, nûnêrên partî û rêxistinên sîvîl û demokratîk, ronakbîr, nivîskar, hunermend beşdar bûn.

Di pîrozîya Newrozê da jî KNKyê li meydanên dîasporayê însiyatîv wergirt û li du mekezên giring



yên cografyaya Yêkîtiya Ewrûpayê cejna Newrozê bi resepsiyonan pîroz kir. Yêk li salonên parlamenta eyaleta Berlînê bi beşdarîya mêvanên Elman û Kurdan, ya duyê jî di avahîyê merkeza KNKYê da li Brukselê dîsa ve bi beşdarîya mêvanên bîyanî û Kurd hate pîroz kirin.

KNKYê hevkarî û piştevaniyeke xurt jî da greva Strasburgê û di roja destpêkê da serokê KNKYê Elî Egît û endamê konseya rêvebir Nizamedîn Toğuç bi xwe jî beşdar bûn. Herweha di berdewamiya grevê da çend endamên di yên KNKYê jî beşdarî vê kiryarê bûn. KNKYê di hevdîtinên digel CPTyê da jî roleke çêker leyist. Ji xwe KNKYê nameyek jî li ser jehrdayîna Ocalan û şandina doktorên bispor bo muayeneya Ocalan li Imralîyê, ji berpirsyar û mezinên UN û YE ra hatibû şandin ku di Bultena me hejmara duyê da jî cih digire.

KNKYê di mehên Nîsan û Gulanê da li Fransa û Spanyayê jî digel partî û rêxistinên sivil û demokratîk hevdîtin pêkînan.

Ji alîyê weşan û ragihandinê ve jî, malpera KNKYê hate aktive kirin û di weşanê da ye. Heta nihe du hejmar KNK Bulten jî hatine weşandin. Daxuyanîyên KNKYê yên ji Gulana 2006an heta îro û gera heyeta KNKYê ya sefera duyê di van du Bultenan da cih digirin, lewma me di raporê da cih neda firehiya daxuyanîyan, ku hûn dê di Bultenan da bibînin. KNKYê di vî demê salekê da xwe ji kar û xebata neteweyî neda alî û ji bo têkilî û dîyaloga navxweyî çî jê hatîye kir.

Axirî, di vê sala derbazbûyî da helbet me dixwast ku xebateke hêj rêkûpêktir bikin û hêj zêdetir endaman tevî xebata pratîk bikin. Lê mixabin ku ji ber sebebên malî me nikarî vê daxwaza giştî bi cih bînin. Aşkera ye ku gelek kar û xebat ji ber tengaviya ekonomîk pêşnakevin. Lê hêvîya me heye ku di peryoda nû da em dê bikarin bi hev ra îmkana bi dest ve bînin, bi pêşniyarên konkret bikarin çareserîyekê peyda bikin û vê xwezîya xwe bînin cih.

Wekî di jî, helbet em di nav kar û xebatê da ne û di nav karê pratîk da kêma û kasî û hindêk şaşî jî dibin. Wê jî em dihêlin bo teqdîra we endaman.

Digel rêz û silavên me.

## **Konseya Rêvebir ya KNKYê.**

23 – 24 Hezîran 2007, Bruksel

\*\*\*

# **Daxuyanîya Kombûna mezin ya KNKYê**

**Kombûna mezin ya KNKYê,  
[Kombûna hemû endaman], di  
navbeyna rojên 23 – 24 yê Hezîrana  
2007ê da li merkeze KNKYê li  
Brukselê pêkhat.**

Kombûna mezin ya KNKYê di demê wisa da kombû ku dewletên dagîrker yê wekî Tirkîye, Îran û Sûriyeyê dozaja êrişên xwe di dereceya herî bilind da didomînin. Bi taybetî dewleta Tirk adeta bi nave sistêmê kolonyalîzma pir dewletî pêşengîya van êrişan dike. Dewleta Tirk hem di ware polîtîk û dîplomatîk, hem jî di ware leşkerî da rola koordînatîyê şerê dijî xelkê Kurd û Kurdistanê dike. Dewleta Tirk ev demek e ku timamî ertêşa xwe rijandîye ser tixûbên “Îran û Iraqê” û ji gundên Zaxo heta yê sêkuçeya Kêleşînê, navçeyeye fireh ya Kurdistanê dide ber topan. Ertêşa Tirk di nav manewrayeke şer da ye û ji Sêwasê heta Hekarîyê operasyonên xwe didomîne û di van êrişên xwe da hemû cure sîlehan bi kar tine. Bi armanca “Çiyayê Qendîlê” ku wekî biryargeha HPG û PKKYê dibîne, gefan li Kurdistanê Federal jî dike. Ertêşa Tirk baskê sefera xwe fireh kirîye û enîya şerekî berfireh danaye beramberî neteweyê Kurd. Belê digel vê pozîsyona dewleta Tirk ya antî Kurd û antî Kurdistan, ertêşa Tirk li nav “tixûbên fermî” jî ketîye nav tengaviyê û li hember berxwedana parastinî ya gerîllayên HPGyê gelek kuştîyan dide. Herwisa rêvebirîya Kurdistanê Federal û hemû xelkê Kurd jî, dijî êrişeke muhtemel ya ertêşa Tirk ya li ser başûra Kurdistanê bi yêkdengî û piştgirîyeke neteweyî, radiwestin. Îro li seranserê Kurdistanê û meydanên diasporayê, xelkê Kurd dijî êrişkarîya dewleta Tirk dengê xwe bilind kirîye û protesto dike.

Kombûna KNKYê ya mezin di van şertên dijwar da pêkhat û ev rewşa aloz û giriftar ji hemû alîyan ve hilkola û biryarên giring standin. Endamên

KNKyê di vê kombûna mezin da giring dîtin ku bangî xelkê Kurd, rêber û rêvebirên xelkê Kurd, hemû organîzasyonên Kurd û Kurdistanî bikin ku beramberî van êrişên wêranker, welatê xwe, bihayên xwe yên neteweyî di cepheyekî herî fireh yê neteweyî da bi yêkdengî biparêzin. Endamên KNKyê herweha di vê kombûnê da xwastin dengê xwe bigihînin cîhana humanîter jî ku digel xelkê Kurd piştgir û destekdar bin. Di kombûna mezin ya KNKyê da herwisa daxwaz ji dewletên mezin û xwudan desthilat û organîzasyonên navneteweyî jî hate kirin ku hevkarîya xelkê Kurd bikin û êrişên li ser Kurdistanê bidine rawestandî.

Kombûna mezin ya KNKyê bi van biryar, daxwaz û hêvîyan bi serkevtî xilas bû.

### **Biryarên kombûna mezin ya KNKyê**

1. Selahîyeta encamdayîna pêşniyara KCKyê ya li ser yêkkirina KNK û Kongreya Gel û riberiza (munaqeseya) mijarê, ji bo konseya rêvebir ya KNKyê hate dan.
2. Di hilbijartinên parlamentê yên 22ê Tîrmehê yên Tirkîyeyê da desteka ji bo namzetên serbixwe yên DTPyê hate kivşkirin û bang li xelkê Kurd hate kirin ku biçine ser sindoqê û rehîyên xwe bidine wan.
3. Şehridarê Sûra Amedê Abdullah Demirbaş ji ber xizmetguzariya pir zimanîyê û bi kar înanana zimanê Kurdî ji teref dewleta Tirk ve ji kar hate dûr kirin. KNK vê kiriyara dewleta Tirk şermizar û protesto dike û destekê dide Demirbaş û herweha bang li dewleta Tirk dike ku Demirbaş vegeftinê ser karê xwe.
4. KNK Civata Giştî ya Kongreya Gel ya di meha Gulanê da pêkhatî pîroz dike û serkevtinê ji wan ra dixwaze û bi hêvîya hevkarîyê xurt, desteka xwe careke dî dide kivş kirin.
5. KNK teror û êrişkarîya dewleta Tirk ya li ser Kurdistanê şermizar û protesto dike û hukûmeta Tirk hiştar dike ku biryara bê huqûq û bê qanûnî ya leşkerî ya îlankirina “navçeyên ewlekarîyê” li Kurdistanê zûtirîn dem bide betal kirin.
6. KNK destekê dide prosesa referandûma Kerkûkê û bangî hemû terefan dike ku rêzê li biryar û xwasteka li qedera xwe xwudan derketinê ya xelkê Kerkûkê bigirin, ku di

madeyê 140 yê makqanûna Iraqê da hatîye misoger kirin.

7. KNK ji YEyê daxwaz dike ku destekê bide bizava azadîxwaz ya xelkê Kurd û PKK-Kongreya Gel ji listeya terorê derêxe û herweha fişarê bide ser dewleta Tirk ku dawî li operasyonên li Kurdistanê bîne û xwastekên demokratîk yên xelkê Kurd qebûl bike.
8. KNK bang li Amerîkayê (USA) dike ku destekê bide bizava azadîxwaz ya xelkê Kurd bi tevahî û rê li ber êrişkarîya dewleta Tirk bigire û herweha PKK-Kongreya Gel ji listeya terorê derêxe.
9. KNK bang li Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan [UN] jî dike ku destekê bide bizava azadîxwaz ya xelkê Kurd û operasyonên li ser Kurdistanê bide rawestandî.
10. KNK terora li ser jina Kurd şermizar dike û kuştinên bi navê namûsê protesto dike.
11. KNK asîmilasyona li ser zimanê Kurdî rûrêş dike û bangî xelkê Kurd dike ku li zimanê xwe xwudan derkeve û di her xelega jîyanê da bi kar bîne û herweha 14ê Gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî wekî tradisyoneke neteweyî bide jîyandin.
12. KNK bang li YEyê dike ku di welatên li nav cografyaya xwe da, perwerdeya bi zimanê Kurdî bide fermî kirin.
13. KNK êrişên li ser parçeyên Kurdistanê bi tevahî protesto dike û bang li dewletên dagîrker, Tirkîye, Îran, Sûrîye, dike ku dawî li van kiryarên xwe yên antî demokratîk û dijî mirovî bînin.
14. KNK hêvî dike ku hemû organîzasyonên neteweyî yên xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê, pirs û pirsgerêkên navxweyî bi rêya diyalogê û metodên demokratîk çareser bikin.
15. KNK dê hewilanên xwe yên ji bo pêkînanana konferanseke li ser yêkîtiya neteweyî bidomîne, ku biryar di kombûna giştî ya Gulana 2006ê da hatibû standin.
16. KNK çêkirina barajên avê li Kurdistanê, wekî xirabkirin û wêrankirina dîrok, kultur

û demografiya Kurdistanê dibîne û vê projeya dijî bihayên mirovî red dike û bang li dewleta Tirk dike ku vê projeya vandalîst betal bike.

17. KNK tecrîd, şiddet û jehrdana birêz Adullah Ocalan potesto dike û digel piştgiriyê, silav û rêzên xwe jê ra dişîne û herweha bang li dewleta Tirk dike ku Ocalan rojek zûtir bête berdan û bigihe azadîya xwe.

18. KNK bang li dewletên dagîrker, Tirkîye, Îran û Sûrîye, dike ku hemû girtiyên polîtîk yên Kurd berdin.

Serkevtin ya xelkê Kurd û hemû xelkên Kurdistanê û yêkitîya neteweyî ye.

**Kombûna mezin ya KNKyê**

23-24 Hezîran 2007, Bruksel

\*\*\*

***“... Endamên KNKyê di  
vê kombûna mezin da  
giring dîtin ku bangî  
xelkê Kurd, rêber û  
rêvebirên xelkê Kurd,  
hemû organîzasyonên  
Kurd û Kurdistanê bikin  
ku beramberî van êrişên  
wêranker, welatê xwe,  
bihayên xwe yên neteweyî  
di cepheyekî herî fireh yê  
neteweyî da bi yêkdengî  
biparêzin...”***

**Di kombûna mezin ya  
KNKyê da pêşniyarên  
komisyona jî hatin qebûl  
kirin û bûn biryarên  
giştî yên KNKyê. Di nav  
van biryaran da, ya herî  
balkêş, piştî ”14ê Gulanê,  
Cejna Zimanê Kurdî”,  
biryara damezrandina  
”Akademîya Zimanê  
Kurdî” bû. Li jêr biryarên  
komisyonan didin:**

**Biryarên Komisyona Ziman û Perwerdeyê**

1. Amadekirina Konferansa Zimanê Kurdî
2. Amadekirina rapora li ser ziman û perwerdeya giştî
3. Şehridarê Sûra Amedê Abdullah Demirbaş ji ber kar û barên li ser zimanê Kurdî di xizmetguzariya şehridariyê da ji kar hate dûr kirin ji teref TCyê ve. Komisyona me daxwazê dike ku ev kiryara TCyê bête şermizar û protesto kirin û mesaja destekê bo Demirbaş bête şandin.
4. Asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî bête şermizar kirin û bang li xelkê Kurd bête kirin ku li zimanê xwe xwudan derkeve û herweha 14ê Gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî hersal wekî tradisyoneke neteweyî bête jîyandin. Herweha bang li dewletên dagîrker yên Kurdistanê dikin ku perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî fermî bikin.



5. Em rêza hemû zimanan digirin û li ber vê prensîbê rêza me ji bi zimanê Tirkî jî heye. Belê, ji ber ku TC zimanê Tirkî wekî zimanekî asîmîlator li ser xelkê Kurd û zimanê Kurdî bi kar tîne, em bang li xwandekarên Kurd dikin ku beşdarî –Cejna Zimanê Tirkî ya li 26ê Îlonê nebin û asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî protesto bikin.
6. Bultena zimanê Kurdî bête weşandin.
7. Arşîva materyalên ziman û perwerdeyê bête girtin.
8. Akademîya Zimanê Kurdî bête damezrandin.
9. Li hemû dezgehên Kurdî semînerên Kurdî bêne dan.
10. Ji YEyê daxwaz dikin ku di cografyaya xwe da perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bide fermî kirin. [Ev xal dê bi hevkarîya "Komisyona Karê Derve" bête realîze kirin.]

**24 Hezîran 2007**

\*\*\*

#### **Biryarên Komisyona Jinan:**

1. KNK azadîya jinan wekî prensîbeke bingehîn dibîne û ji bo azadîya jina Kurd xebatê dike. Komisyona jinan ji bo pêkînana yêkîtiya neteweyî dê roleke aktîv bileyize û bi rêya diyalog, bang û gazîyan pêşengîya vê têkoşînê bike.
2. Ji bo komkirina "Konferansa Jinan ya KNKYê" li Kurdistana Federal, dê xebat bête kirin û têkilî bêne danan.
3. Daku zimanê Kurdî li Kurdistanê û her derê ku Kurd lê dijîn bi rengê xwandin û nivîsînê di jîyanê da pêş bikeve, divêt jina Kurd pêşengîyê bike. Herweha xebat ji bo nêzîkkirina zaravayên Kurdî bête kirin.
4. Li hemberî şiddeta fizîkî û manewî û kuştinên bi navê namûsê yên li ser jinan divêt bête şermizar û mehkûm kirin. Dîsa recm, kuştin

û zextên ku jina ber bi xwekuştinê ve dibe, rûreş dikin. Ji bo ku rê li ber van kirêtîyan bête girtin û di pratîkê da jî tedbîrên qanûnî bêne girtin jî têkoşîneke xurt bête dan.

5. KNK li hemberî şûkirina pêguhorkî û berdêlî û herweha şûkirina (zewaca) bi jîyekî biçûk û bêdil, bi darê zorê û next (qelen) û sunneta jinan û firotna leşê jinan bi xurtî radiweste û şermizar û mehkûm dike.
6. KNK ji bo çareserîya pirsgerêken jinên Kurd, digel organîzasyonên jinan têkilîyan xirt bike û bi hev ra li ser pirsgerêkên jina Kurd û jinên cîhanê raweste û herweha divêt her jineke endama KNKYê li her welatekî ku lê dijî, têkilîyan bi rêxistinên jinan yên li wî welatî pêkbîne û ji bo vê yêkê jî konferans û civînên perwerdeyî amade bike. Herweha têkilî bi taybetî bi jinên Kurd li Kurdistanê ya rêxistina jinan ve girêdayî partîyên siyasî û serbixwe jî were xurt kirin, çalakî û projeyên hevpar bêne derêxistin.
7. Tevî têkoşîna xelkê Kurd, ji bo başkirina rewşa tendurustîya rêberê KCKyê birêz Abdullah Ocalan, ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatîye jehrî dan, xebat bête kirin. Dewleta Tirk di vê sîyasetê da bi îsrar e. Em wekî komisyona jinan, vê sîyasetê mehkûm û şermizar dikin. Em tevî hemû çalakîyên bi armanca başkirina tendurustîya wi dibin.

\*\*\*

#### **Biryarên Komisyona Karê Derve:**

1. Firehkirina xebatên komisyona karê derve li Kurdistana Federal û zêdekirina endamên wê.
2. Bi navê KNKYê li Ewrûpayê, Rohhilatanavîn, Amerika (USA) û cografyaya Sovyeta berê, pêşxistina karê dîplomasîyê.
3. Têkilîyên dîplomatîk li ser esasê demdirêjî bêne pêşxistin.
4. Ji bo vala derêxistina polîtîkên antî Kurd, pêşxistina têkilîyan, pêkînana hevdtînan û amadekirina dosyayan.
5. Pêşxistina têkilîyan bi sazîyên sîvîl ra.

6. Bi armanca agahdarîyê, amadekirina panel û seminerên li welatên munasib. [Ji bo parçeyên Kurdistanê û Asûrîyan.]
7. Di karê dîplomatîk da, hessasîyeteke hemberî jehrdana Ocalan bête nîşan dan.
8. Ji YEyê daxwaz dikin ku di cografyaya xwe da perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bide fermî kirin. [Ev xal dê bi hevkarîya “Komisyona Ziman û Perwerdeyê bête realîze kirin.]

\*\*\*

### **Biryarên Komisyona Karê Neteweyî**

1. Bi hemû sazî, rêxistin, komele, ronakbîr û kesayetîyên polîtîk yê Kurdistanî ra peywendî bêne danan.
2. Bi kesayetîyên polîtîk û ronakbîr, nûnerên rêxistin û sazîyan ra, bi mexseda gotûbêjkirina pirsgirêkên neteweyî û rêyên çareserîyê di programên TVyê da hevdîtin bêne kirin.
3. Hewildan bêne domandin ji bo firehtirkirina çarçoveya KNKyê û têkilî digel alîyên di jî bêne xurt kirin ku ew jî bêne nav KNKyê.

\*\*\*

### **Biryarên Komisyona Civakî û Çandî**

1. Pêkîna lêkolînên li ser organîzasyon, dezgeh û komeleyên ku xebatên civakî, çandî û hunerî dikin û amadekirina dosyayeke agahdariyan ji bo piştgirî u bi hêz kirina wan.
2. Piştgirîya organîzasyonên ku kar û xebatên civakî, çandî û hunerî yê Kurdî di warê navneteweyî da dikin bête kirin.
3. Destnîşankirina pîrozkirin û nasandina bi xelk ra ya rojên taybetî yê wekî bîrînan (bîranîn) şehîdan, heftîya şehîdan û jenosîda Helepçeyê, cejnên neteweyî û dînî û y.d.
4. Piştgirî û teşwîqkirina dem û dezgeh û kom û komeleyên jinan, ciwanan, yê sosyal, kulturî, hunerî, sinetî, govendî û sporê bête kirin.

5. Li dijî nerîn û nakokî û ji hev cudaxwazîya li beramberî civata Kurd, xebatên çareserîyê û yêkitîyê û ewlekarîyê xebat bête kirin.
6. Têkilî û plansazîyên hevpar bi şeweyekî çalak, digel sazî û dezgehên civakî û çandî bêne kirin.
7. Ji bo danasîna çanda Kurd, di warê navneteweyî da xebat û hewildan bêne kirin.
8. Ji bo berjewendîyên civak û çanda Kurd, lêkolîn li ser çavkanîyên aborî û alîkarîyên navneteweyî bêne kirin.
9. Li goreyî şertên têkoşîna Kurdan, plan û xebatên awarte bêne kirin.
10. KNK divêt hemû endamên xwe, di warê têgihîştina erk û armancên giştî da perwerde bike.
11. Li dijî raman û çanda dagîrkeran ya asîmîlasyonîst di nav bizav û têkoşîneke xurt da bin.
12. Komîsyon kombûnên xwe yê sê mehî di demê xwe da dê pêkbîne.
13. Bi rêya çapemenîyê erk û xebatên komîsyonê bi panel, semîner, kombûnan bêne ragihandin.

\*\*\*

***“... Asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî bête şermîzar kirin û bang li xelkê Kurd bête kirin ku li zimanê xwe xwudan derkeve û herweha 14ê Gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî hersal wekî tradîsyoneke neteweyî bête jîyandin. Herweha bang li dewletên dagîrker yê Kurdistanê dikin ku perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî fermî bikin...”***

# Konseya Rêvebir ya KCKyê, mesejeke niviskî şande kombûna mezin ya KNKyê. Li jêr didin:

## Ji bo 7. Civata Giştî ya KCKyê

Herêma Rojhilatanavîn, ji nû ve tê şewandin ku dergûşa şaristanîyê ye, herweha di demê yêkemin civaka çînî de û pişt re jî di erdnîgarî û cîh û warên cûr be cûr de bûye xwedî wate û dergûşa hemû şaristanîyan e. Di vê sererastkirina nû de cîgirtina gelê kurd jî tê nîqaşkirin ku yek ji gelên madovanên bingehîn ê herêma Rojhilata Navîn e. Ji ber vê yekê Tekoşîna Azadîya Kurdistanê ketîye nava serdema herî giring ya dîroka xwe. Li milekî wan rejîmên deshilatdar, despot û dîktatorîyal yên li herêma rojhilatanavîn pêda gerîdikin di wê statîkoya ku hatêye çêkirin ji alî mercên sedsala derbasbûyî ve, li hemberî vîya zanebûna azadîya gelan û bi vîya ve girêdayî helwesta çalakgerîya wan her ku diçe xurtir dibe. Ev rewş roleke giring dilîze di alî veguhêrtina bijareya wekhevî û azadîya gelan bo pêvajoya veguhêrandineke pêşdatir ve.

Di vê sedsala ku em têde ne tekoşînên li ser vê herêmê heta radeya dawî bi leztir bûne, ji ber ku rîşeya dîrokî û çandîya herêma Rojhilatanavîn hem pir kûr e hem jî çarenivîsa sîstemên cihanê jî ji nêzik ve eleqedar dike. Ji ber vê yekê tekoşîneke pir mezin tê meşandin di navbera statûkoparêzîya herêmê û sîstema kapîtalîst de, ku yek ji alozîyên herî bi rîşeyê dîroka xwe dijî. Encama ku derkete holê di wê naverokê de ye ku dikarê pêşveçûnên dîrokî biafirîne; dema em helwesta azadane ya gelên herêmê lê zêde bikin ku li ser bingeha hêza xwe bi xwe ye ku hişyar bûye û hêdî hêdî bûye xwedî wate. Hebûna mercên ku ji derve de ew hinde gihîştine; ji hundir ve jî asta sazîbûn û rêxistingerî û herweha helwesta çalakgerîyê, ku Tekoşîna Azadîya Kurdistanê xwe

gihandiyê, van hemî faktorên gelê Kurd dikin yek ji dînamîkên herî giring yên vê pêvajoya guherînê.

Bê guman hemî pêşketinên ku hene û yên ku kêlî bi kêlî tên jîyan di rasterîya berjewendîyên gelê Kurd de ne. Mercên dîrokî hene ku doza azadîya Kurd bigihîjê serkeftinê. Lê belê wan dewletên desthilatdar ku dixazin Kurdistanê di bin kontrola xwe de bihêlin û her weha hêzên dijmin bi awayekî hevbeş bi hev re tev digerin bi armanca ku gelê Kurd ku ji van fersendan sûd wernegre. Li herêma Rojhilatanavîn hema hema bi awayekî rojane peyman û itîfaqên nû ku înkarkirina Kurdan dixin rojeva xwe, tên pêşxistin.

Wan peymanên dij-bi Kurd ku ji alî dewletên Tirkîyê, Iran û Suriyê ve her ku diçe tên mezinkirin, hîn jî berdewam dikin; her wisa van peymanan hemî wan pêkhateyên Kurd yên li her çar parçeyên Kurdistanê, ji xwe re kirine armanc. Li hemberî vê yekê, dema ku gelê Kurd têkeve nava tekoşîneke mezin û hemî dînamîkên xwe têxe nava liv û tevgerê, wê demê wê ve zihniyeta înkâr û tunekirinê werê parçekirin. Lewma, xwedî giringîyeke jîyanî ye ku hemî hêzên Kurdistanê bibin yek û li ser bingeha stratejiyeke hevbeş tevbigerin.

Di vê wateyê de, wan xebatên yekîtiya netewî ku heta niha ji alî KCKê va hatine pêşxistin, xebatên pir bi nîrx in. Dîsa mînakeke berbiçav e ku berpîrsîyarî û endîşeya azadîya netewî heta çî rade, bi awayekî kûr tê hîskirin.

Em weke tevgerê, em ketin nava gelek hewildanan bi armanca pêşxistina yekîtiya neteweyî ya demokratîk. Her wisa, emê di van hewildanên xwe de bi berdewamî îsrar bikin. Ji ber ku êdî tehemûla gelê Kurd ya bo jîyana kole nema ye. Dijminên me jî bi awayekî rojane plan û konseptên cûr be cûr pêş dixin, bi armanca ku Kurd nebin xwedî îrade û wan deskeftîyên ku hatine afirandin ji holê werin rakirin. Lewma, rêya herî bi bandor ya valaderxistina konseptên dijminên me, yekîtiya neteweyî ye. Di vê rasterê de, em weke tevger, em amade ne, di xeta yekîtiya neteweyî de, her cûre fedakarîyan bikin. Her wisa em bi biryar in ku hemî erk û berpîrsîyarîyan ku dikeve ser milên me, pêk bînin.

Weke tê zanîn, berî niha, bi caran bangewazîyên me çêbibûn ji bo konferanseke neteweyî. Em heta dawî girêdayî wan bangewazîyên xwe ne, bi armanca li darxistina konferanseke neteweyî. Emê her dem li pey vê bangewazîya xwe bimînin. Em wan xebatên ku KCK ji bo konferanseke neteweyî dide meşandin,

bi awayekî baş dinirxînin. Ji bo vê jî, em wan hemî hewildanên KNKê yên di vê rasterê de destek dikin û emê destekdana xwe jî berdewam bikin.

Di pêvajoyeke wisa de, ku li Rojhilatanavîn û Kurdistanê pêşveçûnên germ tînan jîyan û van hemî pêşveçûnan jî bi sîd wergirtina gelê Kurd de ne, em pêkanîna 7. Civata Giştîya KNKê watedar dibînin. Lewma di vê qonaxa giring ya dîrokê de, em difikirin ku wê KNKê di vê civîna xwe de, di warê ji nû ve rêxistinkirin û bilindkirina têkoşînê de, biryarên giring bigire.

Em bawer dikin ku wê rojeveke were diyarkirin li ser bingeha bangewazîya serok APO ya ji bo yekbûna KNK û Kongra-Gel. Em difikirin ku rojeveke bi vî awayî, wê him guftûgoyan kûrtir bike û him jî wê bibe bersiv ji bo zêdetir sazîbûnê û pêdivîyên ku wê pêvajoyê ji me dixwaze.

KCK (Koma Civaka Kurdistan) ku sistemek e ku ji alî serok APO ve ji bo tevahîya Kurdistan û Rojhilatanavîn hatîye pêşxistin, hewil dide ku xwe li her der bi lez û bez xwe bi rêxistin bike û ji bo vê jî xwe gihandîye asta rêxistingerîyeke ku nikare biçûk were dîtin. KCK, sistemeke di wê berferahîyê de ye ku hemî alî dikarin tê da cih bigrin, xwe bi rengekî azad îfade bikin û tê de xebat bikin. Dema ku ev mîsyon û çemka KCKê, di çarçoveyê berfireh ya yekîtiya neteweyî de were fikirandin, wê pêdivîyê derdikeve holê ku her rewşenbîrê Kurd, her weha dost û hevalbendên Kurd hêz bidin vê sistemê. Ji ber ku ev sistem xwedî taybetmendîyeke wisa ye ku paşeroja gelê Kurd ji nezîk ve elaqeder dike.

Em bawer dikin ku ew xebatên ku KNK ji bo yekîtiya neteweyî pêş dixê, wê hîn di asteke bi hêztir de, bigihîne sistem û avabûna rêxistingerîyeke pêşdetir. Wekî din, dema ku li ser bingeha perspektîveke berfireh ya yekîtiya neteweyî de nêzikatî çêbibe, wê ji ber xwe ve diyar bibe ku pêwîst e KNK ji vê yekê re pêşengî bike. Li ser vê bingehê, em careke din bawerîya xwe diyar dikin ku di vê 7. Civata Giştî de ku ji alî KNK ve tê li darxistin, wê di warê yekîtiya neteweyî û pêşxistina sistemeke afirîner de, biryarên dîrokî werin girtin. Bi vê bîr û bawerîyê, em hemî endamên hêja yên 7. Civata Giştî ji dil û can silav dikin û rêzên xwe pêşkêş dikin.

**21 Heziran 2007**

**Serokatîya Konseya Rêvebir ya KCKyê**

\*\*\*

# **Kombûna Mezin ya KNKyê bi mexseda piştgirîya digel Abdullah Demirbaş, biryara şandina nameyekê da û ev nameya li jêr ji şehridarê Sûra Amedê Abdullah Demirbaş ra hate şandin:**

**Ji bo Abdullah Demirbaş,**

**Şehridarê Sûra Amedê**

Kombûna Mezin ya KNKyê, li ser biryara dewleta Tirk ya ji kar dîrkirina we û endamên encumena şehridarîyê rawesta û bi yêkdengî ev biryar wergirt: Kombûna Mezin ya KNKyê di rûniştina xwe ya roja 24ê Hezîranê da, li ser pêşniyara “Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKye” ev mesaja piştgirîyê bi yêkdengî qebûl kir.

**Birayê hêja Abdullah Demîrbaş,**

Em gelek baş dizanin ku we di demê şehridarîya xwe da kar û xebatên mezin kirin û em wekî KNK bihayekî giran didine xebata we. We digel encumena şehridarîyê, xizmeteke hêjayî xelkê Sûra Amedê kir. Xuya bû ku dewleta Tirk ji vê xizmetguzarîya we ya xelkî gelek aciz bû. Bi taybetî biryar û pratîka we ya pîrzimanîyê di kar û barên şehridarîyê da hêjayî teqdîra herî mezin e. Bi vê projeya xizmetguzarîya pîrzimanî we gaveke şoreşî avêt di bi giştî xizmetguzarîya şehridarîyê da. Li goreyî



ve biryar û pratîka we, di serî da zimanê Kurdî û zimanên kêmanîyên di yên li Sûra Amedê xwecih, di nav têkilîyên xelk û şehridarîyê da bi kar hatin û ew barîyera tirsê ya dewleta Tirk ya li ser zimanê Kurdî hate şkandin. Dewleta Tirk ji ber vê gava we ya bi cesaret û demokratîk, fişareke dijwar îna ser we û bi rêya huqûqa xwe ya antî demokratîk hûn û endamên encumene ji kar dûr kirin.

Em wekî KNK her di serî da vê biryara antî demokratîk ya dewleta Tirk rûreş û şermizar dikin. Endamên KNKyê di vê kombûna xwe ya mezin da bi yêkdengî piştgirîya xwe ji bo we û endamên encumena şehridarîyê dane kivyş kirin û pêşkêşî we û endamên encumena şehridarîya Sûra Amedê dikin.

KNKyê herweha hiştarek da dewleta Tirk ku vê biryara xwe ya antî demokratîk betal bike û we û endamên encumenê vegerîne ser kar. KNK digel we ye û daxwaza serkevtinê bo we dike.

Digel rêz û silavên me.

**Kombûna mezin ya KNKyê.  
24 Hezîran 2007, Bruksel**

\*\*\*

***“... Em wekî KNK her di serî da vê biryara antî demokratîk ya dewleta Tirk rûreş û şermizar dikin. Endamên KNKyê di vê kombûna xwe ya mezin da bi yêkdengî piştgirîya xwe ji bo we û endamên encumena şehridarîyê dane kivyş kirin û pêşkêşî we û endamên encumena şehridarîya Sûra Amedê dikin...”***

# **14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî hate pîroz kirin**

**Serokê Konseya Rêvebir ya KKKyê [nihe KCK  
ye.] Murat Karayilan mesajek bo Konseya  
Rêvebir ya KNKyê şand.  
Mesaja Karayilan li jêr e:**

## **”Bila rojêke zimanê Kurdî jî hebe”**

Ji bo birêz serok û rêvebirîya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê,

Ji bo we hemûyan, silav û rêzên xwe pêşkêş dikin û di xebata we da ji bo we serkevtinê em dixwazin. Biryara 14ê Gulanê, bi roja zimanê Kurdî be, em jî biryareke di cih da dibînin. Bila rojêke zimanê Kurdî jî hebe. Zimanê Kurdî belkî di dîrokê da, zimanê herî zêde kevn û di heman demî da zimanê herî zêde di bin zextê da mayîye. Ji bo wê jî zimanekî wiloyî qedîm û pîroz, rojêke xwe hebe di cih da ye. Ji ber wê yêkê em biryara we ya ji bo 14ê Gulanê bi roja zimanê Kurdî be, piştbazîya wê dikin. Dîsa di vê salê da, ev roja wekî roja zimanê Kurdî bête pêşwazî kirin, em jî tiştê ku bikeve ser milê me em dê bikin. Têkoşîna Azadîya Kurdistanê gelek bi cefa û bi ked û bi şehîd pêşdikeve. Têkoşîna Azadîya Kurdistanê di vateyekî da ji bo çanda Kurd e ji bo zimanê Kurdî ye. Me heta niha ji bo ziman û çandê gelek şehîd dan. Şehîdên me dayî ji bo jîn û jîyandina çand û zimanê Kurdî ye. Eger ne Têkoşîna Azadîya Kurdistanê bûya, bi taybetî di Kurdistana Bakur da, ji salên 70yî şûnda, di pêşengîya rêber Apo da, ev pêlên têkoşînê ya berxwedanî pêşneketa, belkî îro zimanê Kurdî pir di halekî xirab û belengaz da bûya ... Lê ema berxwedana şoreşgerên Kurdistanê, çanda Kurdî, zimanê Kurdî rûh danê, hêz danê û xurt kirin.... Iro gelek sazî û dezgehên ji bo çand, ji bo ziman, li hundir welat, li derveyî welat da li ser vî esasî çêbûne. Û ji vir pêvê jî em dê ji bo pêşxistina

ziman hêj zêde hewildanê pêşxînin. Heta niha gelek caran me kampanya çêkirine. Car dî curbecur wek şewazên perwerde em pêşdixînin. Bi van hemû hewildanan em dixwazin, zimanê me, zimanê Kurdî, bi rastî di civakê da, di hemû têkilîyan da zimanê esasî be. Lê mixabin vê xisûsê da lawazî heye. Ev lawazî raber dike ku dîsa em hêj zêde, bi israr vê têkoşînê bibin pêş. Û hertim wek rewşeke kampanya birêxînin. Ji bo ku her kesek bi Kurdî bixwûne, bi Kurdî bifikire, bi Kurdî binivîse. Di vî derheqî da, xebatên hûn pêşxînin, hemûyan em piştbazê wan in. Îro di Kurdistanê da gelek zarava hene. Hebûna zaravayan, zengîniya edebiyata Kurdî ye, zengîniya zimanê Kurdî ye. Divêt ku mirov li van zaravaya hemî lê xwedî derkevin û xurt bikin. Yekî nexe pêş yekî, li ser hemîyan bixebitin. ... Lê ema, îro di Kurdistanê da, pêvîstî bi yêk zaravayî heye, wek zaravayekî millî, pêvîstî pê heye. Di heman demî da, pêvîstî bi tîpên yêkbûyî heye. Îro niha li alîyekê bi tîpên Latîni tê nivîsîn, li alîyê dî bi tîpên Erebi tê nivîsîn. Vaya wilo nabe. Pêvîst e hevbeşî hebe, tîp yêkbin û zaravayekî me yê millî hebe. Vaya elbet xebatekê dixwaze, hewildanê dixwaze û dem dixwaze. Lê tiştê herî pêvîst ew e ku mirov xebateke wilo birêbixîne. Vê xisûsê da em dibêjin, KNK dikare pêşkêşiyê bike, rolekê bileyize. Yanî rola KNKyê ne tinê di warê siyasî da, heman demî da di warê ziman û çandî da jî ji bo ku ber bi hevûn çêbe, ji bo hevbeşî pêşkeve, dikare xwudan xebat û rol be. Di vê xisûsê da jî em, xebata ku KNK bimeşîne, em dê her tim piştbazîya wê bikin. Li ser vî esasî ez carek dî we hemûyan ra silav û rêzên xwe pêşkêş dikim û di xebata we da serkevtinê dixwazim.

**Murat Karayilan**

**Serokê Konseya Rêvebir ya KKKyê [nihe KCK].**

\*\*\*

***“... Biryara 14ê Gulanê, bi roja zimanê Kurdî be, em jî biryareke di cih da dibînin. Bila rojeke zimanê Kurdî jî hebe. Zimanê Kurdî belkî di dîrokê da, zimanê herî zêde kevn û di heman demî da zimanê herî zêde di bin zextê da mayîye. Ji bo wê jî zimanekî wiloyî qedîm û pîroz, rojeke xwe hebe di cih da ye. Ji ber wê yêkê em biryara we ya ji bo 14ê Gulanê bi roja zimanê Kurdî be, em piştbazîya wê dikin...”***

## Resepsiyona Cejna

### Zimanê Kurdî

14ê Gulanê, “Cejna Zimanê Kurdî” bi resepsiyonekê li merkeza KNKyê li Brukselê hate pîroz kirin. Ji bîyanîyan heta Kurdan nêzikî 70 kes beşdarî vê resepsiyonê bûn. Resepsiyon bi axivtina serokê “Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê” Rojan Hazim dest pê kir. Paşê jî endamê komisyona ziman û perwerdeyê Nîzamedîn Togûç jî axivt. Hozan Dilovan bi cumbaşa xwe û kurê wî Reşo jî bi meya xwe, sazband Hekîm jî bi bilûra xwe muzîkeke xweş pêşkêşî mêhvanan kirin. Ji bîyanîya nivîskar Dogan Ozguden û xanima xwe, serokê “Institute for International Assistance and Solidarity”, Gerd Greune ji Belçîk û çend kesên dî yên Belçîkî beşdarî resepsiyonê bûn. Ji organîzasyonên Kurdan jî, serokê KNKyê Elî Egîd, serokê Kongreya Gel Zubeyir Aydar, serokê PYDyê Fuad Barzan, serokê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê Derwêş Ferho, serokê Civata Îslamî ya Kurdistanê Mela Şafiî, nûnerê DTPyê (Partiya Civata Demokratîk) yê Yêkitiya Ewrûpayê Faîk Yagizay, endamên konseya rêvebir ya KNKyê Gulistan Perwer, Hêwî Berwarî, Ferîde Abbasoglu, Tahir Kemalîzade, Felemez Başboga, Corc Aryo, endamên komisyona ziman û perwerdeyê Haydar Işîk, Mîrhem Egîd, Mamoste Maşallah, Ehmed Aktaş, ji Akademîya Hunermendan Seyitxan, serokê Yêkitiya Mamostayên Kurdistanê Muharrem, ji Yek-Komê Bahaddin Dogan, temsîlkarê PDK-Iran, Kawa, ji nivîskaran Medenî Ferho, Amed Tigrîs, Dîyar Bohtî, Jîr Dilovan û ji rojnamevanên Roj TV û Radyoya Dengê Mezopotamyayê, Mamoste Kazim, Ejder Şêxo, Mehmûd Onder, Duzgun Deniz, Aynur Bozkurt û herweha gelek mêhvanên dî jî beşdarî resepsiyonê bûn. Resepsiyonê seet 18.00yê êvarî dest pê kir û heta 21.00ê şevê dom kir. Di resepsiyonê da xwarinên edetî ji mêhvanan ra hatin pêşkêş kirin.

Roj TVyê resepsiyon bi kamerayê kêşa û kire nûçe û belav kir. Rojnameya Özgür Politikayê jî nûçeyê resepsiyonê weşand.

Berî pîrozîya “Cejna Zimanê Kurdî” spotreklamek bi sponsorîya ROJ TVyê hate çêkirin û heftîyekê di TVyê da zivîrî. Di spotreklamê da serokê KNKyê Elî Egîd, serokê Kongreya Gel Zubeyir Aydar, serokê Konseya Rêvebir ya KKKyê [nihe KCK] Murat Karayilan, serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê Rojan Hazim, serokê Kon-Kurdî

Nizamedin Toguç, jina Kurd Şehnaz Atug, zarok Merîvan Denîz [keça rojnamevan Düzgün Denîz], nivîskar Medenî Ferho, rojnamevan Avesta Aysel Aydın bi zaravayê kurmancî, rojnamevan Erdal Er bi zazakî û rojnamevan Pûran jî bi soranî spotên li ser giringîya makziman û Cejna Zimanê Kurdî pêşkêş kirin.

Nûçeyê "Cejna Zimanê Kurdî" di ROJ TV, Radyoya Dengê Mezopotamyayê, Rojnameyên Azadîya Welat, Yeni Özgür Politikayê û gelek malperên Kurdî yên wekî Xweza, Diyarname, Ciwan û gelekên di da jî cih girt.

\*\*\*

# Axivtina ROJAN HAZIM ya li resepsiyona "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî"

**Mêhvanên hêja,**

Hûn hemû bi xêr hatin vê resepsiyonê. Îro 14ê Gulana 2007ê ye û di dîroka Kurdistanê da ewil car e ku rojek wekî "Cejna Zimanê Kurdî" tête pîroz kirin. Zimanê Kurdî yêk ji wan zimanan e ku cejneq heq kirîye. Heta îro gelek ziman bi ber asîmîlasyonên xelk û dewletên serdest ketine û hindêk jî wan jî mixabin ku helîyane û ketine nav rûperên dîrokê. Belê, zimanê Kurdî jî vê kadastrofa mezin, bi ket û rabê jî be, xwe rizgar kirîye û jîyana xwe garantî kirîye. Ev berxwedana zimanê Kurdî di kêma zimanan da tête dîtin. Kêma ziman hene ku li ber asîmîlekirin û birandina herî dijwar karîne xwe li ser pêya jînde bihêlin. Gerçî ew êrişkarîya asîmîlasyonîst hêj jî dom dike li ser Kurdî û bi taybetî jî li parçeyê bakur, li Tirkîyeyê, Tirkîzasyon di dereceya herî birandêr da tête domandin. Belê heke bi giştî li rewşê bête nêrîn, herçend jar û

lawazkirina Kurdî bête dîtin jî, lê mirandina Kurdî ji teref asîmîlatorên Tirk ve êdî ne mumkun e, ji ber ku bizava neteweyî ya xelkê Kurd, wekî pêla ava biharê fûrya ye û ev pêşkevîne tesîra pozîtîv li ser ziman jî dike û bi kar înan Kurdî her diçe pêşdikeve. Vêca ji ber vê berxwedana pîroz ya zimanê Kurdî ya beramberî asîmîlasyonê Tirkî û zimanên di yên dewletên serdest yên Kurdistanê, "cejna ziman" êdî heqê zimanê Kurdî ye jî. Gelek ziman hene li cîhanê "cejnên xwe" pîroz dikin. Yêk ji wan jî Bengalî ye ku ew jî 21ê Sibate cejna xwe pîroz dikin. Bengalî jî vê rojê, bi munasebeta dijî asîmîlasyonê Urdu ya di demê kolonyalîzma Pakistanê da ku ji bo fermîkirina Bengalî têkoşîn kirine, pîroz dikin. Nimûneyek jî ya zimanê Tirkî ye ku wekî zimanekî asîmîlator li ser zimanê Kurdî tête bi kar înan; Cejna Zimanê Tirkî jî 26ê Îlonê ye û ev biryare jî 26ê Îlona 1932ê di "Kongreya yêkemîn ya zimanê Tirkî" da hatîye girtin û ji wê rojê were jî fermîyen tête pîroz kirin. Û helbet gelek nimûneyên di jî hene li cîhanê...

KNKyê jî sala 2006ê, bi pêşniyara „Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê“ 14ê Gulanê wekî roja „Cejna Zimanê Kurdî“ qebûl û îlan kir. Eve gav û biryareke dîrokî ye. Ji ber ku zimanê Kurdî hêj jî berxwedana xwe ya dijî asîmîlasyonê didomîne. Di serda jî, di nav Kurdan bi xwe da jî edetê kêma axivtina Kurdî her diçe zêde dibe û eve rê li ber otoasîmîlasyonê jî xweş dike. Lewma zimanê Kurdî ji du alîyan ve, hem dijî asîmîlasyonê der ve, hem jî dijî otoasîmîlasyonê navxwe berxwe dide. Vêca ev pîrozkirina cejna zimanê dê şuûra li ziman xwedîderketinê mezin û bilind bike di serê mirovê Kurd da.

Erf û edet, bi giştî tradîsyon piştî bûn û bûyeran pêktên. Destpêkirina pîrozkirina «Cejna Zimanê Kurdî» jî dê bibe çeperekî xurtkirin û pêşvebirina zimanê Kurdî û em hêvî û bawer dikin ku dê di nav xelkê me da bibe tradîsyoneke saxlem û her sal ji sala borî geştir bête pîroz kirin.

Em „14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî“ li neteweyê xwe, li neteweyê Kurd pîroz dikin.

Herweha em ji dil spasîya we jî dikin ku hûn hatin beşdarî vê roja „Cejna Zimanê Kurdî“ bûn û vê cejna bihadar li we jî pîroz dikin.

**ROJAN HAZIM**

Endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê

Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê

**14ê Gulana 2007ê, Bruksel**



# Nivîsarên li ser ”14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî” li jêr in:

## 14ê Gulanê roja ”Cejna Zimanê Kurdî” ye

01 Gulan 2007, Yeni Özgür Politika

### ROJAN HAZIM

Cejn, ji hewcehiyên erf û edefî, sosyokultürel, sosyopolîtîk, neteweyî, dîrokî anjî dînî bin, ji bo ”ferd” û ”civatê” bûyîn û bûyer û platformên pîrozîyê ne. Civat wekî pêkhatineke kolektîv bi hev ra cejnên xwe pîroz dike. ”Ferd” jî cejna xwe digel ”ferdên dî” parve dike. Lewma karakterîstîka sereke ya ”cejn”ê, pîrozîya kolektîv e. Cejn li ser bûn û bûyîn û bûyeran ava dibin û bi vî rengî jî dibin tradîsyonên komî yên mayînde û berdewam. Cejn di jîyana ”ferdî” da be, anjî di ya ”komî” da be, şahîyê sembolîze dike. Cejn herweha ”ferdî” be, an ”komî” be, encama ”serkevtînekê” ye. Di jîyana xelk û neteweyan da sedan cejn hene ku bi hizir û bîreke tîr û tijî ya hevrayî têne pîroz kirin. Di nav van cejnên bi hevratîyeke bilind da têne pîroz kirin, yên neteweyî û dînî, di serî da tîn. Lê di nav vê silsîleya cejnan da jî yên herî kolektîv cejnên neteweyî ne. Netewe wekî hebûneke kolektîv, ji aliyê sosyolojîk û bîr û hizirî ve heterojen e, belê ji aliyê stûna ragir ve homojen e. Ziman stûna ragir ya neteweyî ye û ji xerca homojen ya neteweyî pêkhatîye. Netewe bi zimanê xwe yê ”yêkpare” hebûna xwe diparêze û bi vî rengî xwe mayînde û berdewam dike. Neteweyên bi ber êriş, dagîrî û birandinê dikevin, di serî da xwe bi hêza

zimanê xwe li ser pêya dihêlin. Êrişkar, dagîrker û kolonyalîst jî, xelk û neteweyên ku bindestkirî, her di serî da ji aliyê ziman ve hildigirin binê zeptûrepta xwe û metodên birandina zimanê wan bi kar tînin û zimanê xwe serdest dikin. Têkoşîna dijî van dagîrker û kolonyalîstan jî di serî da bi parastina ziman dest pê dike. Di rikeberîya xelkê Kurd û dewleta dagîrker û kolonyalîst ya Tirk da ev prosese hate jîyan û mixabin ku hêj jî dom dike. Dewleta Tirk, birandina neteweyê Kurd her ji destpêka komarê pêve bo xwe kire armanc û ji bo vê politîka xwe ya qirêj jî aşê hêrana zimanê Kurdî, anku mekanîzmaya asîmilasyonê di dereceya herî bilind da xebitand. Dewleta Tirk bi politîka asîmilasyonê xwast reya jîyanê ya neteweyê Kurd bibire û xelkê Kurd nîne bike. Belê nîkarî û di vê politîka xwe ya dijmirovî da sernekevt. Zimanê neteweyê Kurd, Kurdî, her bi çî rengî be xwe parast û pêşve bir. Zimanê Kurdî, wekî alaya dengî ya neteweyê Kurd, di hiş û bîr û gewrîya mirovê Kurd da jînde ma û heta hêza xwe ya dawîyê, dijî asîmilasyona ”Tirkî” berxweda. Dewleta Tirk, herçend îro jî politîka xwe ya asîmilasyonê didomîne jî, lê êdî nikare Kurdî bihelîne. Zimanê Kurdî, dijî asîmilasyona Tirkî, serkevtîye û cejna xwe heq kirîye. Neteweyê Kurd, deyndarê zimanê xwe ye û divêt bi cejneke mezin vê serkevtina zimanê xwe pîroz bike. Vêca di van waran da pêşengîyek jî pêdivî ye.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê jî, di vî warî da gaveke dîrokî avêtîye û ”14ê Gulanê” wekî roja ”Cejna Zimanê Kurdî” qebûl û îlan kirîye. KNKyê di banga xwe ya 4ê Adara 2007ê da wisa gotîye: ”Hemû xelk û neteweyên cîhanê, di rojê salê da, cejna zimanê xwe pîroz dikin. Heta nihe tradîsyoneke bi vî rengî di nav xelkê Kurd da nehatibû dest pê kirin. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNKyê, di sala 2006ê da, bi pêşniyara komîsyona ziman û perwerdeyê ya KNKyê, 14ê Gulanê wekî roja ”Cejna Zimanê Kurdî” qebûl kir û dîyarî xelkê Kurd kir. KNK hêvî dike ku xelkê Kurd dê li roja cejna zimanê xwe xwudan derkeve û hersal vê cejna zimanê xwe pîroz bike û vê cejnê mayînde bike û wekî tradîsyon bidomîne. Zulm û zora li ser xelkê Kurd di serî da bi qedexekirina zimanê Kurdî dihate kirin û îro jî têtê domandin. Asîmilasyona li ser zimanê Kurdî hatîye kirin, li çu zimanan nehatîye kirin. Belê xelkê Kurd bi rikeke nedîtî, li zimanê xwe xwudan derket, zimanê xwe jînde kir. Bi jînde mana zimanê Kurdî xelkê Kurd jî jînde ma. Xelkê Kurd bi parastina zimanê xwe, xwe jî parast, paşeroja xwe ronahî kir.” Ev biryare gelek di cih da ye, biryareke neteweyî ye. Di prosesa têkoşîna azadîya xelkê Kurd û parastina zimanê Kurdî da,



beramberî asîmilasyona zimanên dewletên dagîrker û kolonyalîst û bi taybetî jî dijî asîmilasyona Tirkî, berxwedaneke xurt hate dan û di vê rikeberîyê da zimanê Kurdî, digel hemû kême û kasîyan jî be, serkevtî bûye. Lê belê, tehlikeya li ser zimanê Kurdî hêj jî dom dike û divêt hişyarî û baldarîya ji bo parastina zimanê Kurdî bête domandin û şûra li zimanê xwe, li Kurdî xwudanderketinê jînde bête girtin û bizava di vî warî da neête sist kirin. “Cejna Zimanê Kurdî” ji ber vê yêkê dê bibe platforma herî xurt ku xelkê Kurd hem dijî asîmilasyonê bi zanîn û serwextî li zimanê xwe xwudan derkeve, hem jî bi bîr û hizirike yêkgirtî ya neteweyî nîşana hebûna xwe, anku zimanê xwe, bi cejnekê pîroz bike û ev cejne dê bibe binasê bilindbûna hiş û bîr û şûra parastina zimanî di nav civatê da ku eve herweha dê otoasîmilasyona li navxweyî jî bişkêne. Bi vê hêvîyê, 14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî, bila li neteweyê Kurd pîroz be!

Ez vê carê nivîsara xwe bi paragrafa ji banga KNKyê bi dawî tînim. KNK bangî xelkê xwe dike, guh bidinê: “Bo organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokultûrel, sosyoekonomîk, medyaya Kurdî, ronakbîr, nivîskar, rojnamevan, hunermend, rêvebirên polîtîk û îdarî yên Kurdistanê û timamî xelkê Kurd; Ji nav elementên ku neteweyan pêktînin, ziman yê sereke ye. Ziman îdentîtêta neteweyan e. Ziman alaya dengî ya neteweyan e. Zimanê me, zimanê Kurdî jî, nîşana hebûna xelkê Kurd e. Zimanê me, zimanê Kurdî, îdentîtêta xelkê me ye. Zimanê me, zimanê Kurdî, alaya dengî ya neteweyê me ye. Zimanê me, zimanê Kurdî, bi salan ji teref dewletên kolonyalîst û dagîrker ve hate qedexe kirin, asîmilasyonê nedîtî li ser zimanê Kurdî hate bi kar înan û ev polîtîka asîmilasyonê bi rengên cuda îro jî têtê domandin. Belê xelkê me, wekî hemû xelkên cîhanê, bi rik, berxwedan û têkoşîneke xurt, ev hebûna xwe ya pîroz parast. Îro xelkên cîhanê salê rojekê cejna zimanên xwe pîroz dikin. KNKyê jî bi vê bîr û bawerî û bihazanîna berxwedana pîroz ya zimanê Kurdî ya dijî asîmilasyonê, roja 14ê Gulanê wekî roja ”Cejna Zimanê Kurdî” qebûl û îlan kir. KNK hêvî û bawer dike ku xelkê Kurd dê vê rojê bi hizir û bîreke bilind ya neteweyî pîroz bike û wekî tradîsyon bidomîne. KNK bang dike ku ”14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî”, li Kurdistanê, li her derê ku Kurd lê, bi şahî, bi semîner, konferans, sempozyûm û axir her bi çi rengî be, bête pîroz kirin. Parastina Kurdî, parastina Kurdetîyê ye. KNK ji nihe ve 14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî pîroz dike.”

\*\*\*

## Ziman û mirov

25 Nîsan 2007, Yeni Özgür Politika

AHMED AKTAŞ

Li ser ziman gelek axaftin hatine kirin. Ev gotinên hatine kirin hemî di cihê xwe de ne û rast in. Lê mixabin hêz û dewletên desthilat nahêlin her kes û her gel bi kêfa dilê xwe zimanê xwe bi kar bîne û çand û hunera xwe bijî. Machiavelli, di pirtûka xwe ‘Prens’ de, dibêje; “Eger hûn hez dikin gelekî bixin bin destê xwe, pêwîst e hûn berî hemî tiştî ziman û çanda wî di nava ziman û çanda dewleta xwe de bihelînin (asimile bikin)”. Dewletên dagirker hemî, lê bi taybetî Dewleta Tirkîyeyê, wisa xuyaye ku şîreta Makyavel baş girtiye û dev jê bernade! Ne bi tenê zimanê kurdan qedexe kiriye û di nava zimanê xwe de dihelîne, navên erdnîgariyê û heta yên ajalan jî guheriye. Bi vê jî ranewestîya ye, hemî çanda kurdan jî ji xwe re dixê mal û bê şerm ji cîhanê re jî wisa dide diyarkirin. Eha qaşo cejna xwe ya 23’ê avrêlê ya zarokan pîroz dikin. Ji hemî gelên cîhanê zarokan tînin Tirkîyeyê. Zarokên her gelfî bi zimanê xwe diaxive, tu astengî nîn e. Lê xwedêgîrevî zarokên 40 milyon kurdan yên birayên wan in û mixabin ev zarok, cejna wan be jî bi zimanê xwe pîroz kirina wan qedexe ye. Ma ew qas jî bêwijdanî dibe? Ev çend salên dawî dest bi sextekariyê berfireh kirine; qaşo dixwazin zarokên kurdan bidin xwendinê, ji bo zarokan dibistanan vedikin, internet, kompîtur, û hwd.dibin Kurdistanê. Wey mala minê, ewqas li ber zarokên kurdan dikevin û dixwazin wan jîr û zana bikin! “Bavo min bişîne dibistanê”, bi van navên balkêş hez dikin keçikên me jî bibin xwendekar û pêşve bikevin! Hedef ev e “bavo min bişînine bike tirk.” Ev helwestên wan dema kevn tîne bîra mirovan, ku bi navê “dibistanên herêmê...” zarokên kurdan biçûkanî digirtin û dibirin dikirin tirk. Ev qenciya wan e ji kurdan re! Qenciya wan bixwe serê wan! \* \* \* Gotinek heye, cudatiya mirovan ji ajalan mejî ye. Rast e, lê ji bo ramana mejî bibe malê hemî mirovan pêdivî bi ziman heye û hema piştî vê jî jiyana hevbeş a civakî çand têt. Eger ev her sê bi hev re be, encex behsa nasnama mirovekî rast, civakeke rast, gelek an jî neteweke rast bête kirin. Ji ber ku, dagirkeran derbe li ev taybetmendiyên me dane, lewma kesayetî û civaka me tevlihev e. Bi tenê cihê dilxweşiyê ev e ku, diyar e ziman û çanda me pir dewlemend e, lewma dagirkeran heta niha nikaribû bi tevayî tîk bidana. Dîsa cihê şanaziyê ye ku, her çend kêmasî hebin jî, sazî û dezgehên me yên neteweyî û ziman û

çand û hunerê gelek hatine avakirin.

Niha saziya me ya bilind KNK, ji bo ziman û çanda me biparêze û xurt bike û pêşve bixe, dest bi rêzeçalakiyan kiriye. Yek ji van çalakîyên gelek bi rûmet û pir giring ev e ku, 14ê gulanê weke Cejna Zimanê Kurdî pejirandiye. Divê di serî de hemî kesên xwe rewşenbîr dibînin û hemî gelê me vê rojê weke cejneke neteweyî pîroz bike û li her cihê û her roj di jiyana xwe de zimanê xwe bi kar bîne. Bi zanistî jî hatiye pejirandin ku, mirov bi zimanê dayika xwe baştir dikare pêş bikeve.

\*\*\*

## Cejna Zimanê Kurdan [\*]

11 Gulan 2007, Yeni Özgür Politika

### HAYDAR IŞIK

„Zimanê neteweyekê, ruha wî neteweyî ye“ dibêje zanyarê Elman Humbolt. Ruha neteweyê Kurd jî; Makzimanê wî yê Kurdî ye ku xelkê Kurd li ser reyên wî yên sosyal radigire, huvîyetê û rengî didê. Belê ruha xelkê Kurd li Tirkîyeyê di bin qedexetiya makqanûnê da ye. Di maddeyê 42. yê makqanûnê da: „Ji bo hevvelatîyên Tirk, ji bilî Tirkî çu zimanên dî di dezgehên perwerdeyê da nikarin bêne dan. Çarçoveya rêzîkên perwerdeya zimanê bîyanî yên di dezgehên perwerdeyê da bêne dan û perwerdeya li dibistanên ku bi zimanên bîyanî perwerdeyê bikin, bi qanûnê tete danan.“ „Herwisa maddeyên 3. û 4. yên makqanûnê jî: „Dewleta Tirkîyeyê bi welat û neteweyê xwe ve yekpare ye û lêkve nabe. Zimanê wê Tirkî ye. Maddeyê 3. nikare bête guhorîn û teklîfa gihorînê nikare bête kirin“ tete gotin û ev qedexê di maddeyê 81. yê qanûna partîyên polîtîk da jî dom dikin. Disa li maddeyê 42ê „Perwerde, bi armanca şoreş û prensîbên Atatürk û prensîbên zanyarî û perwerdeya hevdem û di bin çavdêrî û kontrola dewletê da tete kirin. Cihên perwerdeyê yên dijî van norman nikarin bêne vekirin.“ Çi ne ev şoreş û prensîbên Atatürk ku hinde tene gotin? Cilê unîform e. Kirasê dînan e. Tîmarxane ye. Sulteya generalan e. Çetefî ye. Nijadperêsi ye. Faşîzm e. Bi kurtî sistemê dewleta Tirk e. Barbarîya ku Kurdan li fabrîkayên asîmilasyonê bihelînine. Zimanê neteweyê Kurd hildigire binê qedexê û zulmê û ruhê lê tarî dike, huvîyet û kesayeti û hebûna mirovîyê nîne dike. Xelkekî ku zimanê wî hatîye qedexê kirin,

ji reyên xwe yên sosyal tete piçandin. Bê huvîyet û bê şexsiyet dibe. Darek çawa li ser reyên xwe şîn dibe û bejn dide, xelkek jî li ser zimanê xwe dibe xwudan huvîyet, kultur û şexsiyet. Kurdî qedexê ye, li dibistanên dewletê nayête fêr kirin, dîyar e ku qedexê ye, hingê tete xwastin ku xelkê Kurd ji reyên xwe bête piçandin. Tiştê ku min li jorî gotî, rewşa Kurdan ya îro ye; Kurdê hişyarbûyî, Kurdê welatvîn dij radiweste, vê prosesa asîmilasyonê asteng dike. Belê li milê dî em Kurd bi zimanê ku li me sanahî [hesan] têt diaxivin û dinivîsin. Anku bi rengê em hevkarîya kolonyalizmê dikin. Otosansûrê tînin ser zimanê neteweyekî mezin.. Etnologê Elman Prof. Eickstedt dibêje ku, xizmeta herî mezin ya Kurdan ji bo dîrokê, ev ziman ji kûrahîyên dîrokê heta îro îmane. [Berê xwe bidin pirtûka Tirk-Kurd-Îranî, ji demên destpêkê heta îro] Zanyarên ku qazanc dîtine, mixabin ku Kurd nabînin. Disa heke bi çavekî unîversal lê bête nêrin, makziman wekî mafekî bingehîn yê mirovî tete dîtin. Başê Kurdan ji bo vî mafê kolektîv heta îro tiştê kirin? Mirov dikare bêje ku nikarîne heta îro tiştê bikin. Heke Tirkîyeyê ji ber tîpa ”W”, birêz Osman baydemîr derêxiste pêş dadgehê, dîyar e ku me mesele hêj nedaye tégihîştin. Ewrûpa zimanê Kurdî di dereceya mafê kesîni da dibîne. Başê kîjan kampanyaya me da zanîn ku ev maf ne mafekî kesîni ye, mafekî kolektîv e? Berî ku em bêjin ténagihin, me karî tégihînin? Komisyona ziman ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], ku li ser vê pirsê difikire û riberizê dike, sere vê salê li Parlemeta Belçîkê sempozyûmeke ziman pêkîna. Şik têda nîne ku dikarî berfirehtir biba, belê tiştê min dîtî, di van salên dawîyê da yêk ji xebatên pêşve bû. Serokê komisyonê heval Rojan Hazim li ser zimanî polîtîka nûkirin, aktîvî û lê xwudanderketinê di pratîkê da bi kar tîne. Li goreyî vê yêkê, KNKyê 14ê Gulanê wekî roja „Cejna Ziman“ îlan kir û ji nihe û pêve jî dê wekî tradîsyon bidomîne û pîroz bike. Şik têda nîne ku ev gave divê ji alîyê xelkê me yê ku ruha wî hatîye êxsîr kirin wekî gaveke giring bête dîtin û her Kurdekî bi rûmet, xwudan şexsiyet û huvîyet divê destekê bide vê gavê. Di serê meha Adara îsal da enstîtuyeke Belçîkî sempozyûma li ser „Makziman û jin“ li Dêrsimê fînanse kir û yêk ji berpirsiyarên ku beşdarî vê sempozyûmê bûyî ji min ra wisa got: „Min mereq kir çu kes bi makzimanê xwe nedixivt. Piştî pîrsa min dest bi axivtina Kurdî kirin“. Ma eve resmê kêmasîya me ya di vî warî da nîşan nade? Em wekî ferdên xelkê ku hatîye kolonî kirin, ne di nav paranoyayê da ne ku bêjin zimanê Kurdî maka zimanan e. Belê xwudanderketina li zimanê ku neteweyekê ji nav kûrahîya dîrokê înayî, tete manaya xwudanderketina mirovahîyê. Rewşa

me ya îro ji ya berê baştir e. Berê medyaya me nebû. Îro TVyên me, radyo û rojnameyên me hene. 14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî ya ku KNKYê îlan kirî, bila li we hemûyan pîroz be! Li zimanê xwe yê bab û bapîran xwudan derkevin. Bi Kurdî biaxivin, têr rûmet bin. Kirmancî qesey bike! Kirmancî biwane! Kirmancî fikre xo waze!

[\*] Kürt Dil Bayramı  
11. 05. 2007

**Kurdîya wê: ROJAN HAZIM**

\*\*\*

## Zimanê Kurdî û Cejna

### Zimanê Kurdî [\*]

10 Gulan 2007, Yeni Özgür Politika

**MAŞALLAH ÖZTÜRK**

Di roja me da, yêk ji mijarên ku zêdetir li ser têtê rawestan û riberiz kirin, ziman e. Binasê ku li ser ziman zêdetir têtê rawestan û riberiz kirin ji hêz û giringîya zimanî têtin. “Ziman, aletê pêşîyê yê dîroka medenîyetê ye ku gava mirov ji demê jîyana kûvî derbazî jîyana mirovbûnê bûyî. Di naskirin û têgihîştina mirov ya xwezayê da, di manadan û parvekirina digel mirovên dî da faktorekî giring e” û di eynî demî da, “di navbeyna ferd û civakê da wekî alet rola yêkparekirinê dibîne” û “berê xîmî yê bihayên civakî ye”.

Di vê kontekstê da ziman timamîya kultur, huner û bihayên hatine afirandin yên civakê ye. Ji ber vê yêkê jî zimannas û ramanwerê Elman W. von Humbolt wisa gotîye; “Zimanê neteweyekê ruha wî ye”. Bi vê gotinê ji bo neteweyekê giringîya jîyanî ya zimanî destnîşan kirîye. Li ser vê xalê neteweyan bi jîyandina zimanî xwe jîyandine, yên ku li zimanê xwe xwudan derneketine, zimanê xwe nedayne jîyandin pûç bûne. Lewma hebûn û nebûna xelkekê bi zimanê wî ve hatîye girêdan. Li goreyî hindek lêkolîneran di nav van 400 salên dawîyê da ji 1000an zêdetir ziman berze bûne çûne. Di rewşa îro da ji 6000 zimanên ku têne axivtin, bahra pitir bi tehlîkeya nînebûnê ve rûbirû ne. Tehrîbatên kolonyalîzmê, koç

û emperyalîzma kulturê jî vê yêkê dilezîne. Şik têda nîne.

Yêk ji xelkên ku zerara mezin ji kolonyalîzmê, parçebûnê û koça bi darê zorê dîtî jî Kurd in. Kolonyalîzma Tirk, Erebb û Farisan ku Kurd razandine ser doşeka mirinê, bi sedsalan e xwûnê ji devê Kurdan divereshînin. Hemû bihayên neteweyî yên xelkê Kurd hatin îpotek kirin. Kurdî hate biçûk kirin. Lewma ew zulma ku xelkê Kurd dîtî, êşa kêşayî, çu xelkan nejiyaye. Bi taybetî TCyê [Komara Tirkîyeyê] politîkeke nedîtî ya asîmîlasyonê di rê bir û navên gund û çiyayên Kurdî guhortin, navên zarokên nûbûyî bi zorê kirine Tirkî û hertiştê ku bêhna Kurdî jê hat qedexe kir. Li ser vê zihniyeta qedexetîyê ya dewletê, hebûna dibistanên bi razan yên navçeyî û TVyên Tirkî jî, asîmîlasyon rabû dereceya herî xedar.

Bi xurtbûna hereketa PKKyê ya di nîveka salên 1970yî da, qedera Kurda jî ya zimanê Kurdî jî hate guhorîn. Bi gotina birêz Mehmûd Baksî, ku em bi rehmet bi bîr tînin; “Ev zimanê ku berê tinê ji teref ronakbîran ve rexbet didît, bi derketina PKKyê ve milyonên ku zimanê wan ji teref TCyê ve hatibû kilil kirin, vebû. PKKyê tîrsa TCyê şkand. Kurdî kifinê xwe dirand û kasetên Kurdî ne tinê li Kurdistanê, li metropolan jî rexbeteke mezin dît. Gerçî astengên fermî li pêşîya zimanê Kurdî ranebibûn.

Belê milîtanên PKKyê singên xwe beramberî fişekan kirin sîper û dane legal kirin. Gelek xwûn rijya. Bedelê wê gelek giran bû. PKKya ku herdicû xurt dibû, pêşîyê bi weşana rojnameyan, paşê jî bi weşana radyoyan Kurdî jî nînebûnê rizgar kir. Kovarên mîzahî yên Kurdî, pirtûkên Kurdî bazar û çarsû xemilandin. Kurdî êdî bû zimanekî axivtinê û jê hate hez kirin û lê hate geryan.”

Li ser van, kar û xebatên ji weşana Med TV heta Roj TV, ku di pêşveçûna zimanê Kurdî da roleke unîversîteyê leyist, kampanyaya Parlemeta Kurdistanê ya li derveyî welat ya „Kurdî bifikire, Kurdî biaxive, Kurdî binivîse“ û konferansên li ser ziman yên ku enstituyên Kurdî amade kirî dewam kir. Ê kelebçeya li ser zimanê Kurdî hatîye danan hate parçe kirin.

Li ser vê yêkê gaveke dîrokî jî KNKYê avêt. Dijî tehlîkeya otoasîmîlasyona heyî, bi armanca ku zimanê Kurdî bidin hez kirin, pêşve birin û bidin axivtin, di kombûna xwe ya giştî ya 2006ê da, biryareke dîrokî wergirt û 14ê Gulanê wekî “Cejna Zimanê Kurdî” qebûl kir. Di manaya xwudanderketin û pêşvebirina



zimanê Kurdî da ev biryara KNKYê biryareke gelek giring e. Şik têda nîne. Ev cejna ku dê ewil car 14ê Gulanê bête pîroz kirin, dê hem mil bide pêşveçûna zimanê Kurdî, hem jî dê hessasîyeta li ser zimanê Kurdî bilind bike.

Di vê çarçoveyê da ji bo xebata KNKYê ku cejna zimanê Kurdî bike tradisyon divêt destek bête dan. Rêya ku manayê bidine vê cejnê jî ew e ku, li malê, li kar, li dibistanê, li kolana, bi kurtî li hemû warên jîyanê bi Kurdî bête axivtin, bi Kurdî bête xwandin û nivîsîn û ya herî giring jî ji zimanê Kurdî bête hez kirin.

Çiku: "Zimanê Kurdî zimanê me ye. Zimanê Kurdî ev rewşa me ye. Zimanê Kurdî hebûna me ye. Ew winda nabe, heta em hebe."

[\*] Kürt Dili ve Kürt Dil Bayramı  
10. 05. 2007, Yeni Özgür Politika

**Kurdîya wê: ROJAN HAZIM**

\*\*\*

## Cejna Zimanê Kurdî

14 Gulan 2007, Yeni Özgür Politika

### MEDENÎ FERHO

Gelê Kurd di demjiyana îroyîn de, li ser azadî, aşî û demokrasîya cîhanê diaxive. Ev destîniya gelên bindest e. Dema gelên bindest, ji bo jiyaneke bi rûmet dest bi têkoşînê kirin, pêwîste destdirêjiyan li bextê cîhanê bikin. Destdirêjiya li bextê cîhanê, hiş û ramanên nû, siyasetên nû, felesefeyên nû di afirîne, rê û şivîleyên nû derdixe holê. Di her alî de erdhejînek çêdibe. Dema gelên bindest hebin, ademiyet nîne, mafê mirovan bin pê dibe, mafê jiyaneke bi rûmet û azad tune ye; bextê cîhanê têkçûye, zordestî, wêranî û talanê dest pê kiriye; yase, rêbaz, peyam û peymanên navneteweyî û gerdûnî ji holê hilatine. Bi gotineke din, hinek ji gelan hene ku di şaristaniya cîhanê de, di rûmetdariya jiyane de cihê xwe ne dîtine. Lewra dixwazin bigihin xisletên pîroz yê cîhan û jiyane. Ev jî, wî gelê pêwîstî şer dike. Gelê Kurd jî, yek ji van gelan e û di nava civata cîhanê de bêxwedî û bêxwedan e. Lewra, piralî, berfireh û li eniyên cuda cuda şer dike. Dijminê gelê Kurd, dixwazin

ku despotîzma pirranî û dîroka xwedest, gelê Kurd gunehkar bikin, bikujin, pîrozîyên wî pûç bikin. Lê em dikarin bi şanazî û serbilindî destnîşan bikin û bibêjin ku, Têkoşîna Azadixwaz a Gelê Kurd, li dijî vê destîni û dîroka xwedest, têkoşîn kir û paşerojên gelê Kurd, ji wêranziyê xelas kirin. Îro serazadên gelê Kurd, li her çar aliyên cîhanê, di nava şerekî piralî û berfireh de ne. Îlan kirina Cejna Zimanê Kurdî, eniyeke nû, lê dijwar ya şer e. Gelê Kurd, xwe siparta bextê cîhanê, xwe avête tor û bextê navê mirovaniyê. Lê Kurdan ev dexalet bi xwîna xwe da. Gelê Kurd ku bêbextî, bextreşî û xiyaneşî baş nas dike, îro, xwedî hêz e ku nirxên xwe, bi diparêze. Yek ji van nirxan kultur e. Kultur xweser Birca babîl e. Û ziman.... Kultur eger xisletek ji ya hebûna neteweyî be, bêguman ziman xeleke sereke ye. Pir balkêş e ku gelên cîran, ji bo şaristanî û kultura xwe zindî bigirin serî li nirxên gelê Kurd dane. Feylesofê Frensî, Paul Valery dibêje: "Bedena şer, ji lawirên dixwê pêk te". Dijminên gelê Kurd jî, ji bo "ecdad"ê kultur û nirxên xwe çêbikin, piştî talan û diziyê, kultur, ziman û hebûna gelê Kurd înkâr dikin. Gelê Kurd, li hemberî vê dorpeçana berfireh, kirêt û zexim, li gelek eniyan şer dike û "sefalet" a cîhanê diqîre. Têkoşîna 30 salî şoreşek derxistiye holê. Ev şoreş, bûye sîstem û asoyên dîtin û nêrîna gelê Kurd di çepereke berfireh de vekiriye. Grewa birçîbûna Starsbourgê şerek e... Meşa Strasbourgê û hwd. şerek e... Pîroz kirina Cejna Zimanê Kurdî li payîtexta YE Brukselê, li avaniya KNKê şerek e. 10ê Tebaxa 1702 an, Saint-Just li parlamena Frensa, Destura Bingehîn pêşkêşî parlamentaran dikir û digot: Îro em li ser azadiya cîhanê diramin û diaxivin, Gelên Cîhanê we temaşe dikin û hun li hember azmuneyê mezin in. Roja ku we Destura Bingehîn da gelê Frensa, hunê qîral, -tacîdar- ji holê rakin, hûnê bi peyama bingehîn, bersivekê bidin cîhanê. Her gel layiqî jiyana bi rûmet û xîret e. Ev gotinên ku berî 295 salan li parlamena Frensa olan vedidan, îro li salonên Kongreya Neteweyî a Kurdistanê bi rengekî cuda olan vedidin. Gelê Kurd, şerê azadiya gelên bindest dike. Cîhanê, di azmûneya azadî, mafê mirovan û huquqê navneteweyî de, di "sînif"-pol de ma. Îlan kirina Cejna Zimanê Kurdî, xwedî derketina li nirxên gelên bindest e. Di demeke ku li Strasbourgê 18 cengawerên Kurd, canê xwe, ji bo xwedî derketina li rûmet û xîreta Kurd, li ser ferşê teneşîrê dirêj kirine, îlan kirina Cejna Zimanê Kurdî, pîrr watedar e. Barê vî karê pîroz li ser milên şakirdên zimanê Kurdî ye. Em çiqasî gunehkariyê bikin aliyê dijmin û kefika gunehên wan giran bikin xêr nake. Saziyên kulturî yê Kurd jî, pêwîste bizanibin ku Ferheng nasnameya zimanê gelan e



û ne tenê dewlemendiya ziman destnîşan dikin, zanistiyên dema xwe jî himbêz dikin û pêwiste kêmasiyên di vê hêlê de bêne temam kirin. Larousse, xweser pirtûkxaneyek e. Ziman, saziya hunandina dengên civakî ye û xwedî taybetmendiyên giyanê neteweyî ye. W. Humboldt dibêje: Zimanê gelekî giyanê wî ye, giyanê wî jî zimanê wî ye. Barê vî karê giring li ser milên, rojnamevan, entel, rewşenbîr, arîstokrasî û pirtir ji her kesî li ser milên nivîskaran e. Pêwiste ev çînê bijarte, di berz kirin, pêşxistin û xurtkirina kadroyên gotina edebiyata Kurdî de, bi termînolojiyên cûda yên civakî û jiyanê, di rengekî şoreşî de di “sinif”- pol de nemîne. Eniya çînê bijarte, heya îro di “şerê gotinê” de, serneketiye. Hêviya me ewe ku ji niha û pê de serketin bête bidestxistin. Cejna Zimanê Kurdî, li gelê Kurd pîroz be.

\*\*\*

**„... Îlan kirina Cejna Zimanê Kurdî, eniyeke nû, lê dijwar ya şer e. Gelê Kurd, xwe siparta bextê cîhanê, xwe avête tor û bextê navê mirovaniyê. Lê Kurdan ev dextalet bi xwîna xwe da. Gelê Kurd ku bêbextî, bextreşî û xiyanetê baş nas dike, îro, xwedî hêz e ku nîrxên xwe, bi diparêze. Yek ji van nîrxan kultur e. Kultur xweser Birca babîl e. Û ziman..... Kultur eger xisletek ji ya hebûna neteweyî be, bêguman ziman xelege sereke ye...”**

## **Pîrozbahîya “Cejna Zimanê Kurdî” ji nav gerîlla jî hat.**

Nivîskar û ronakbîr Hesên Huseyîn Denîz digel pîrozbahîyê, nivîsarek jî şand. Belê mixabin ku ji ber mîzanpaja rûperan me birek ji nivîsarê wergirt. Name û nivîs li jêr in:

### **Hevalê Rojan,**

Beyankirina we ya li ser Cejna Zimanê Kurdî min xwend, gelekî kêfxweş bûm. Veqetandina rojekê ji bo zimanê kurdî pêwîstiyek û grîngiyek e. Bi vê sedemê ez jî cejna we pîroz dikim û hêvî dikim ku ji aliyê gelê me ve weke cejneke netewî were pejirandin, himbêz kirin û pîroz kirin. Em jî tiştê ji destê me were, emê bikin.

Li gel silav û rêzên germ.

Hesên Huseyîn Denîz  
13 Nîsan 2007

## **ZIMAN HEBÛN E; BÊZIMANBÛN TINEBÛN E!**

Dawî, em Kurd jî bûn xwedî cejneke zimanê xwe. Ji aliyê KNKê (Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê) ve, roja 14ê Gulanê wekî Roja Cejna Zimanê Kurdî hatiye pejirandin û beyankirin. Destpêkê em vê rojê li tevahiya mirovên kurd û li giştîya mirovahiya cîhanê, ya bi sedê salan e li hemberî qirkirina li ser gelê Kurd, zimanê Kurd, çand û wêjeya Kurd bê deng dimînin dikin ku belkî bi saya vê roja cejna zimanê Kurdî hinekî bala wana bikişê ser nîrxên Kurdan û hinek ronahî bikeve wijdanê wan û ji bo rakirina zulma li ser zimanê me qe ne nebin alîkarê dagirkerên Kurdistanê.

...

Dîsa hêvîdar im ku ev cejna 14ê Gulanê ya ji aliyê KNKê ve hatiye beyankirin ji aliyê tevahiya sazî, rêxistin, dezgeh û kesayetên Kurdî ve were

pejirandin û rûmeteke tê xwestin were dayîn. Divê neyê jibîrkin ku ziman navgîneke gelemperî ye; ew ne zimanê beşekê, çînekê, komekê, zayendekê yan girseyekê ye. Ew zimanê giştîya nijadê û kesên wî zimanî bikar tînin e. Bîrûbaweriya wan kesan çî dibe bila bibe zimanê wana dikare hevbeş be û rêzîkên rêziman, xwedîderketin û jiyandina rêziman her kes pêwîst û girîng dibîne. Kesên demokrat jî, yên sosyalîst jî, yên lîberal jî, yên faşîst jî ger di nava civakê de cih digrin û ew civak zimanekî bikar tîne, bê ku van cudahiyan bidin ber çav, pêwîst e her kes li ziman xwedî derkeve û bide jiyandin. Ji bo vê em wekî civaka Kurd jî; cudahiyên ramanî, olî, zayendî çî dibin bila bibin, divê em tev li zimanê xwe xwedî derkevin û ger ji aliyê cihekî ve ji bo lipêşxistin û jiyandina zimanê me gaveke erênî li ku derê were avêtin, divê wekî ew gav ji aliyê me ve hatiye avêtin em lê xwedî derkevin û bidin jiyandin.

Bi vê hizirê hêvîdar im her Kurd li vê pêngava ji aliyê KNKê ve hatiye avêtin xwedî derkeve û ji bo pêşdebirin û jiyandina wê hemû hêz û jêhatîniya xwe derxîne holê.

Bi van hest û ramanan ez Cejna Zimanê Kurdî li tevahiya Kurdan cardin pîroz dikim.

Li gel silav û rêzên Kurdinî.

**HESEN HUSEYÎN DENÎZ**

\*\*\*

## **Pîrozbahîya Samî Tan, serokê Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê:**

### **Cejna Zimanê Kurdî pîroz be!**

Me jî dixwest di vê roja girîng de di nav we bin, lê belê ji ber pirsgirêkên vîzeyê me nekarî li wir amade bin. Têkoşîna gelê kurd a ji bo azadî û parastina nîrxên neteweyî her ku diçe geş û gurtir dibe. Zimanê kurdî girîngtirîn nîrxê neteweyî ye. Parastin û pêşvebirina zimanê kurdî barê ser milên hemû mirovên azadîxwaz e. KNK'ê di warê têkoşîna parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de gaveke girîng avêt û 14ê gulanê wekî Cejna Zimanê Kurdî destnîşan kir. Em vê rojê di serî de li rêberê gelê kurd û li têkoşerên azadîxwaz, li hemû kurdên

azadîxwaz pîroz dikin. Em bawer dikin ku dê ev roj di geşbûna doza parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de bibe destpêkeke nû. Bi van bîr û baweriyên em Cejna Zimanê Kurdî li we pîroz dikin û rêz û silavên xwe pêşkêş dikin.

**Samî Tan**

Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê  
Berdevkê demê yê Tevgera Ziman û Perwerdehiya  
Kurdî (TZPKurdî)

**11 Gulan 2007**

\*\*\*

## **Nûçeyên ji Kurdistanê yê li ser pîrozîya ”14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî” ji rojnameya Yeni Özgür Politika û ajansa DIHAyê:**

### **Li Elkîya Hekarîya jî Cejna Zimanê Kurdî hate pîrozkirin**

Li Navçeya Elkî ya Hekarîya bi munasebeta 14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî, banga xwudanderketina li zimanê Kurdî hate kirin. Rêxistina Partîya Civata Demokratîk (DTP) ya bajêrkê Elkî, li ser “14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî” daxuyanî da çapemenîyê. Şehridarê Elkîyê, Faîk Dursun û Serokê Rêxistina DTPyê ya navçeyê Yusuf Temel jî di nav da nêzîkî 100 kes beşdarî daxuyanîya ku li avahîyê DTPyê ya navçeyê hatiye dan bûn. Serokê Rêxistina DTPyê ya Elkîyê Yusuf Temel, di daxuyanîyê da bal kêşa ser asimilasyona ku li ser zimanê Kurdî tête meşandin û wisa got: ”Tinê binasê (sebebê) hebûna me xwudanderketina li çand û ziman me ye. Em Kurdîyê pêşda bibin û dewlemendiyên wê bi cîhanê bidin nasîn.” Piştî axivtînan hindêk nivîsarên li ser zimanê Kurdî hatin xwandin û derheqê ziman da agahî hatin dan.

**14.05.2007, Elkî**

## Li Wanê jî "Cejna Zimanê Kurdî" hate pîroz kirin:

WAN - Partiyên sîyasî û rêxistinên civakî yên sîvîl yên li Wanê, "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" bi daxuyanîyekê pîroz kirin. Rêxistina DTPyê ya Bajêrê Wanê, GOÇ-DER, YODER, Şaxê ÎHDyê, TUHAD-DER, Şaxê KURDÎ-DERê, Komeleya Hevwelatîyên Azad, Navenda Çand û Hunera Serhedê, Mala Dengbêjan û TZP-Kurdî, bi munasebeta "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" li Kuçeya Hunerê daxuyanîyek hevpar dan çapemenîyê. Li ser navê sazîyan Rêvebirê Şaxê KURDÎ-DERê yê Wanê Selîm Ozkan daxuyanî xwand. Ozkan, dîyar kir ku ziman nasname, rûmet û hebûna miletekî ye û da zanîn ku miletekî bêziman weke miletekî mirî ye. Ozkan, got ku mixabin bi salan e ji aliyê hêzên serdest ve bi rengên cuda li ser ziman û bihayên xelkê Kurd yên herî xwezayî polîtîkên inkar û ji halê rakirinê têne meşandin. Ozkan, îna ziman ku di serî da ziman, bihayên neteweyê Kurd têne inkar kirin, ji ber vê yêkê bi renegekî sîstematîk zext û zorên li ser xelkê Kurd têne zêde kirin. Ozkan, got ku bi taybetî jî li ser çand, huner û zimanê Kurdî polîtîkên qedexekirin, inkar, asîmîlasyon û nînekirinê têne domandin. Ozkan, daxuyand ku her ku xebatên parastin û pêşxistina nasname û zimanê Kurdî geş dibin, ev polîtîkên inkar û nînekirinê jî zêde dibin. Xebatên parastinê her roj zêdetir dibin. Ozkan, bal kêşa ser xebatên parastina zimanê Kurdî û wisa pê da çû: "Li hemberî van polîtîk û kiryarên li dijî huqûq û mirovahîyê têkoşîna ji bo parastina nasname û zimanê Kurdî jî, her roja diçe geş û gurtir dibe. Têkoşîna hişyarî û hişmendîya parastina zimanê Kurdî û şikandina polîtîkên asîmîlasyon û otoasîmîlasyonê her roja diçe pêş ve diçe. Nişana vê yêkê ya herî berbiçav jî îlankirina "Cejna Zimanê Kurdî" ye." Ozkan, bang li hemû Kurdan jî kir û wisa dawî li axivtina xwe îna: "Em bang dikin ku hemû derdorên Kurd û xelkê Kurd bi çu rengî polîtîkên asîmîlasyon û otoasîmîlasyonê qebûl nekin û li dijî vê yêkê derkevin. Divêt neyê ji bîr kirin ku ziman nasname û rûmet e, divêt wekî hemû xelk û neteweyan li nasname û rûmeta xwe xwudan bête derketin. Bi vê munasebetê, em bi hêviya ku hemû zimanên cîhanê û zimanê Kurdî azad bibin Cejna Zimanê Kurdî li xelkê Kurd pîroz dikin."

DÎHA - YENÎ ÖZGÜR POLİTİKA

15 Gulan 2007

## Pîrozîyên dî yên "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî"

KNKyê 14ê Gulanê wekî Cejna Zimanê Kurdî îlan kiribû. Ji bo vê yêkê pêr li gelek cihan Cejna Zimanê Kurdî hate pîroz kirin.

14ê Gulanê ku ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ve wekî 'Cejna Zimanê Kurdî' hate îlan kirin, bi resepsiyonekê li merkeza KNKyê li Brukselê hate pîroz kirin. Li Wan û Enqereyê jî bi şahîyan hate pîroz kirin. Herwisa, şehridarîya Pirsûsê jî şahîyek organîze kir. Dîsa li navçeya Elkî ya Hekarîya jî bi munasebeta 14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî, banga xwedîderketina li zimanê Kurdî hate kirin.

Resepsiyona KNKyê bi axivtina Endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê û herwisa Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê Rojan Hazim dest pê kir. Gelek kes beşdarî resepsiyona ku li merkeza KNKyê ya li Brukselê hatiye amade kirin bûn. Hazim di axivtina xwe da roja Cejna Zimanê Kurdî pîroz kir û got: "Îro 14ê Gulana 2007ê ye û di dîroka Kurdistanê da ewil car e ku rojek wekî "Cejna Zimanê Kurdî" tête pîroz kirin. Zimanê Kurdî yêk ji wan zimanan e ku cejneq heq kirîye. Heta îro gelek ziman bi ber asîmîlasyonên xelk û dewletên serdest ketine û hindêk ji wan jî mixabin ku helîyane û ketine nav rûperên dîrokê. Belê, zimanê Kurdî ji vê kastrofa mezin, bi ket û rabê jî be, xwe rizgar kirîye û jîyana xwe garantî kirîye. Ev berxwedana zimanê Kurdî di kêz zimanan da tête dîtin. Kêz ziman hene ku li ber asîmîlekirin û birandina herî dijwar karîne xwe li ser pêya jînde bihêlin. Gerçî ew êrişkarîya asîmîlasyonîst hêj jî dom dike li ser Kurdî û bi taybetî jî li parçeyê bakur, li Tirkîyeyê, Tirkîzasyon di dereceya herî birandêr da tête domandin. Belê heke bi giştî li rewşê bête nêrîn, herçend jar û lawazkirina Kurdî bête dîtin jî, lê mirandina Kurdî ji teref asîmîlatorên Tirk ve êdî ne mumkun e, ji ber ku bizava neteweyî ya xelkê Kurd, wekî pêla ava biharê fûrya ye û ev pêşkevîne tesîra pozîtîv li ser ziman jî dike û bi kar înanê Kurdî her diçe pêşdikeve. Vêca ji ber vê berxwedana pîroz ya zimanê Kurdî ya beramberî asîmîlasyona Tirkî û zimanên dî yên dewletên serdest yên Kurdistanê, "cejna ziman" êdî heqê zimanê Kurdî ye jî." Hazim bi bîr xist

ku, KNKYê sala 2006ê, bi pêşniyara “Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKYê” 14ê Gulanê wekî roja “Cejna Zimanê Kurdî” qebûl û îlan kirine û “14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî” li neteweyê xwe, li neteweyê Kurd pîroz kir. Piştî axivtina Hazim, endamê komisyona ziman Nîzamedîn Togûç jî axivtinek kir. Her wisa Hozan Dilovan bi cumbaşa xwe û kurê wî Reşo jî bi meya xwe, sazband Hekîm jî bi bilûra xwe muzîkeke xweş pêşkêşî mêhvanan kirin. Ji bîyanîya nivîskar Dogan Ozguden û xanima xwe, serokê Institute for International Assistance and Solidarity, Gerd Greune, ji Belçik û çend kesên di yên Belçikî beşdarî resepsiyonê bûn. Ji organîzasyonên Kurdan jî, serokê KNKYê Alî Yigit, serokê Kongreya Gel Zubeyir Aydar, serokê PYDYê Fuad Barzan, serokê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê Derwêş Ferho, serokê Civata Îslamî ya Kurdistanê Mela şafî, serokê Yêkitîya Mamostayên Kurdistanê Muharrem, ji Yek-Komê Bahadîn Dogan, temsîlkarê PDK-Iran, Kawa, ji nivîskaran Haydar Işık, Medenî Ferho û ji Roj TV û Radyoya Dengê Mezopotamyayê û herweha gelek mêhvanên di jî beşdarî resepsiyonê bûn. Di resepsiyonê da xwarinên edetî ji mêhvanan ra hatin pêşkêş kirin.

#### ‘Xwedî li zimanê xwe derkevîn’

Herwisa ‘14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî’ li Wanê jî bi şahîyan hate pîroz kirin. Di şahîyan da bang li hemû kesan hate kirin ku li dijî asîmilasyon û zulma li ser ziman, herweha otoasîmilasyonê têbikoşin û xwedî li ziman derkevin. Şahîya ji aliyê şaxê KURDÎ-DERÊ ya Wanê ve hatiye organîze kirin, li Salona Navenda Çand û Hunerê ya Serhedê (SKSM) hate kirin. Rêvebirê şaxê KURDÎ-DERÊ Selîm Ozkan ku axaftinek kir, îna ziman ku ew dê ji bo rakirina asîmilasyona li ser ziman, têbikoşin. Ozkan, bang li hemû Kurdan jî kir ku li dijî zulm, asîmilasyon û otoasîmilasyona li ser zimanê Kurdî têbikoşin û xwedî li zimanê xwe derkevin. Piştî axivtinê, şahî bi şanoyek ku bi yêk kesî tete leyistin û mijara wê asîmilasyon û otoasîmilasyona zimanê Kurdî bû, dom kir. Bername bi stranên dengbêjên Mala Dengbêjan ve dawî bû.

#### Li Enqereyê eleqeya ciwanan zêde bû

Li Enqereyê jî, bi heman munasebetê, ji aliyê Meclîsa Tevgera Ziman û Perwerdahîya Kurdî (TZPKurdî) ya Enqereyê ve, li avahîyê Kurd-Derê şahîyek hate kirin. Gelek kes ku piranîya wan ciwan bûn beşdarî şahîyê bûn. Şahî bi rêzgirtina şehîdan dest pê kir. Di

şahîyê da endamê Meclîsa TZPKurdî ya Enqereyê Îhsan Kandemîr, li ser manaya rojê axivtinek kir û li ser giringiya cejnan ya di jiyana kesan û civakê da rawesta. Kandemîr weha got: “Cejn di jiyana kesan û civakê da di heman demî da şahî ne.” Piştî axivtinan, kifteya xav hate çêkirin, şano û leyizên Kurdî hatin nîşandan û çîrokên Kurdî hatin gotin. Şahîya ku dengbêjên Kurd bi dengên xwe rengîn kir, bi dîlanê bi dawî bû.

#### Cejna Zimanê Kurdî li Pirsûsê hate pîroz kirin

Şehridarîya Pirsûsê, bi munasebeta ‘14 Gulan Cejna Zimanê Kurdî’ li Salona şanoyê ya Navenda Çandê ya Prz. Îmam Şahîn şahîyek pêkîna. Di şahîyê da Serokê Rêxistina DTPyê ya Rihayê Îbrahîm Bînîcî, şehridarê Pirsûsê Ethem Şahîn, Serokê Rêxistina DEHAPê ku xwe fesh kir ya Rihayê Ahmet Dagtekîn, nûnerên KESKê, dayîkên şehîdan û nêzîkî 100 kes amade bûn.

Di şahîyê de Endamê Kurdî-Derê Cûdî Îmrek, îna ziman ku ziman nasname, rûmet û hebûna miletekî ye. Îmrek, daxuyand ku ji bo ku zimanê Kurdî pêş bikeve û dewlemend bibe, lazim e hemû civak di hemû warên jiyane da bi Kurdî biaxive û wiha got: “Divêt êdî em dest ji zimanê serdest û bîyanîyan berdin. Pêwist e zimanê civakê, zimanê bazirganîyê û zimanê siyasetê bibe Kurdî. Heta ku di hemû qadên jiyane da Kurdî neyê bikarînan, pêşve naçe. Mirov bi zimanê xwe mirov e. Dîsa neteweyek bi zimanê xwe heye.”

#### CÎK: Inkara Kurdî ne li goreyî musulmantîyê ye

Dîsa Civaka Îslamî ya Kurdistanê (CÎK) ji bo 14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî daxuyanîyeke nivîskî weşand û got ku inkara zimanê Kurdî ne li goreyî îslamîyetê ye. Serokê CÎKê Mela Şafî bal kêşa ser xebata Ehmedê Xanî û got; “Em îro ji mamosteyên Kurd dixwazin ku wekî mamosteyê mezin ji Kurdî hez bikin û xwedî li Kurdî derkevin.” Mela Şafî da zanîn ku Kurdî zimanekî bi qîmet e û xwest xwedî li zimanê Kurdî bê derketin.

#### 16 Gulan 2007

#### Yeni Özgür Politika,

#### Navenda Nûçeyan

\*\*\*



# Li Hekarîya pîrozîya ”14ê Gulanê, Cejna Zimane Kurdî”

Kurdî-Der, li avahîyek li kêleka Aka Hali Saha ya Geverê hate vekirin. Şehridarê Çolemêrgê Metîn Tekçe, şehridarê Geverê M. Salîh Yıldız, Serokê Giştî yê Kurdî-Derê Mehmet Mazhar Akbaş û nûnerên rêxistinên civakî yên sivil bi tevahî nêzîkî hizar kes beşdarî vekirina avahîyî bûn.

Rêvebirê şaxê Kurdî-Dera Geverê Qahir Bateyî ku di merasima vekirinê da axivtinek kir, got ku vekirina şaxê Kurdî-Derê di nihe da watedar e. Bateyî, dîyar kir ku di demekî ku zulma li hemberî zimanê Kurdî zêde bûye da şaxê komeleyê vedikin û wiha dom kir: “Tam di serdemêke ku zimanê me bi nînebûnê ra rû bi rû maye da vekirina sazîyek wiha, wê di hêla xwedîderketina gel ya li zimanê xwe da, ristek giring bilîze. Ji ber ku zimanê me rastî otoasîmilasyonê têt. Herçiqas pergal ji bo nînekirina zimanê me di nav hewildanan da be jî, em jî li hemberî ziman û çanda xwe, xerîb dimînin.”

Serokê Giştî yê Kurdî-Derê Mehmet Mazhar Akbaş jî dîyar kir ku Kurdî di nav zimanên hatine qedexekirin da cih digire û wiha dom kir: “Mirov nikare li hemberî vê yêkê nerazîbûn nîşan nede. Ji ber ku ev zimanê pir dewlemend, Mem û Zînan, Cegerxwînan û gelek bihayên dî ku bûne destan, derxistiye holê. Ji ber vê yêkê, hurmeta xwe ji bo kesên ku zimanê Kurdî belav dikin û di vê rêyê da gelek bedêl dane pêşkêş dikim. Hebûna miletekî, bi zimanê wî xuya dibe.” Şehridarê Gêverê M. Salîh Yıldız jî di axivtina xwe da got ku sazîyên ji bo azadkirin û ragihandina Kurdî hatine ava kirin, gelek pêş ketine.

Piştî axivtinan, kokteylek hate dan û bi awayekî temsîlî, dersa ziman û perwerdehîya Kurdî hate dayîn.

**DÎHA / ÇOLEMÊRG**

**16 Gulan 2007**

**Yeni Özgür Politika, Navenda Nûçeyan**

\*\*\*

# Nameya li ser 14ê Gulanê

**Bo Samî Tan**

**Serokê Enstîtuya Kurdî ya  
Stanbolê**

**Kek Samî,**

KNKyê bi pêşniyara «Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê» 14ê Gulanê wekî roja «Cejna Zimanê Kurdî» qebûl û îlan kirîye. Kongreya KNKyê ya 2006an di 13-14ê Gulanê da pêkhat. «Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê» di roja duyê ya kongreyê da, anku di 14ê Gulanê da hate damezrandin.

Komisyonê jî gava li ser xebata bi giştî zimanê Kurdî plan û programa xwe amade kirî, bo zimanê Kurdî jî bi giringî li ser hewcehîya «cejna zimanî» rawesta û ev roja duyê ya kongreyê, anku 14ê Gulanê, bi yêkdengî wekî roja «Cejna Zimanê Kurdî» teklîf kir û bi yêkdengî jî hate qebûl kirin.

Ev gave di kombûna 12ê Tebaxa 2006ê da li Kolnê ji teref hemû rêxistinên sosyopolîtîk û sosyokultûrel ve jî hate qebûl kirin û KKKyê jî destekeke mezin da vê biryarê.

Ewil car dê 14ê Gulana 2007ê bête pîroz kirin.

Bi hêvîya ku bibe çeperekî xurt yê bizava parastina zimanê Kurdî.

14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî li xelkê me, li we hemûyan pîroz be.

Digel silavên dostane.

**ROJAN HAZIM**

Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê

**11 Gulan 2007**

\*\*\*

# Portreya

## ”14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî”

13-14ê Gulana 2006ê kombûna giştî ya KNKyê li merkeza KNKyê li Brukselê pêkhat. Di roja duyê ya kombûnê da, anku di 14ê Gulanê da, [yêkşemb], bi pêşniyara Rojan Hazim, ”Komisyona Ziman û Perwerdeyê” bi yêkdengîya delegeyan ve hate demazrandin. Di kombûna ewil ya konseya rêvebir ya KNKyê da, 2ê Hezîrana 2006ê, Rojan Hazim wekî serokê komisyona ziman û perwerdeyê hate hilbijartin. Di eynî kombûnê da endamên komisyonê jî hatin kivş kirin. Komisyona Ziman û Perwerdeyê, 8ê Tîrmeha 2006ê kombûna xwe ya ewil li merkeza KNKyê li Brukselê kir. Di kombûnê da ev kes hebûn:

Rojan Hazim, serokê komisyonê  
Nizamedin Toguç  
Haydar Işık  
Mîrhem Egîd  
Maşallah Ozturk  
Ehmed Aktaş  
M. Emîn Yildiz

Serokê komisyonê Rojan Hazim, programa kar û xebata komisyonê pêşkêş kir. Di vê programê da plankirina kampanyaya zimanê Kurdî û kivşkirina roja “Cejna Zimanê Kurdî” hebû.

Di programê da 14ê Gulanê, ku roja duyemîn ya kombûna giştî ya KNKyê bû û herweha komisyon jî di wê rojê da hatibû damezrandin, wekî roja “Cejna Zimanê Kurdî” dihate pêşniyar kirin. Program bi berfirehî hate gotûbêj kirin û bi yêkdengîya endamên komisyonê hate qebûl kirin. Konseya Rêvebir ya KNKyê jî ev program û teklîfa komisyonê bi yêkdengî qebûl û herê kir û bû biryara giştî. Li goreyî vî planî 12ê Tebaxa 2006ê jî digel gelek rêxistinên sosyopolîtîk û sosyokultûrel û medyaya Kurdî li

avahiyê Mala Kurda li Kolnê kombûneke fireh hate kirin.

### Amadekar û koordînasyona kombûnê:

KNK - [Komisyona Ziman û Perwerdeyê]

### Beşdarên kombûnê:

Enstîtuya Kurdî ya Brukselê  
Enstîtuya Kurdî ya Berlînê  
Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê  
Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê [\*]  
Akademîya Hunermendên Kurd  
Pena Kurd – Mehmet Şahîn  
Konfederasyona Komeleyên Kurd, Kon-Kurd  
Yêkitîya Mamostayên Kurdistanê  
Yêkitîya Rojnamevanên Kurdistanê  
Yêkitîya Elewîyên Kurdistanê  
Federasyona Komeleyên Ezidîyan  
Civaka Islamî ya Kurdistanê – Mela Şafî  
Yêkitîya Ciwanên Kurdistanê  
Yêkitîya Jinên Azad – Ewrûpa  
Newaya Jin  
Heyva Sor ya Kurdistanê  
Yeni Özgür Politika  
ROJ TV  
Radyoya Dengê Mezopotamyayê  
Ji “Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojavayê” -  
Selîm Biçûk  
PJAK  
PYD

### Not:

[\*] Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê ji ber binasên teknîkî nikarîn beşdarî kombûnê bibin, belê serokê enstîtuyê Samî Tan bi nameyê piştevanîya kombûnê kampanyayê kirin.

### Nivîskarên ku bi nameyê desteka xwe kivşkirî jî ev in:

Seyitxan Anter  
Necîb Balayî  
Jan Dost  
Berken Bereh  
Feratê Dengizî  
Mehmet Tanrikulu

Planê ku “Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê” pêşniyar kirî, ji teref beşdaran ve hate parve kirin û desteka xurt hate dan. Konseya Rêvebir ya KKKyê (Nihe KCK ye) jî 21ê Tebaxa 2006ê bi daxuyanîyekê destek da vê kampanyaya KNKyê. Li goreyî vî planî ji 8ê Îlona 2006ê pêve heta 14ê

Gulana 2007ê, roja Cejna Zimanê Kurdî, kampanyaya zimanê Kurdî hate dest pê kirin.

Di midehê kampanyayê da, rêze kombûn û semîner hatin kirin û programên radyo û TVyê hatin çêkirin. Kampanyayê di medyaya Kurdî da cihekî fireh girt û hate destek kirin. Di 12ê Çileya 2007ê da “Sempozyûma Zimanê Kurdî” li Parlemeta Belçikê digel Enstîtuya Kurdî ya Brukselê hate kirin. Di 14ê Gulana 2007ê da jî, di dîroka Kurdistanê da ewil car “Cejna Zimanê Kurdî” hate pîroz kirin. Serokê koneya rêvebir ya KKKyê [nihe bû KCK] Murad Karayilan bi rêya TVyê mesajeke piştgiriyê ya pîrozbahîya cejna ziman belav kir. Cejn li seranserê Kurdistanê bi coş û heyecaneke mezin hate pêşwazi û pîroz kirin.

“14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî”, bi pîrozîya 14ê Gulana 2007ê pêve, tradisyoneke nû hate dest pê kirin û ev cejna zimanê dê bibe çeperekî xurt yê parastina zimanê Kurdî. Bila li neteweyê Kurd pîroz be.

Biryara KNKyê ya li ser “14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî”, ji teref TZPKyê [Tevgera Ziman û Perwerdeya Kurdî] ve jî di konferansa Amedê [Diyarbakir] da, 24-25ê Sibata 2007ê, hate qebûl kirin.

\*\*\*

## Spotên Kampanyaya zimanê Kurdî

**Mesajên kurt û balkêş ji bo xelkê**

**Kurd:**

Dayê, babo, digel min bi Kurdî biaxivin!

Em dayîk, divêt digel zarokên xwe bi Kurdî biaxivin!

Kurdî makzimanê me ye, divêt em zarokên xwe bi Kurdî mezin bikin!

Kurdî makzimanê me ye, Kurdî zimanê bab û bapîrên me ye, divêt em bi Kurdî biaxivin!

Kurdîniya xwe divêt em bi Kurdî bikin!

Kurdîyê biparêzin, çiku parastina Kurdî, parastina Kurdetîyê ye!

Zimanê Kurdî, stûna ragir ya neteweyê Kurd e, wê stûnê saxlem ragirin!

14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî ye, bila li xelkê Kurd pîroz be!

Her reng nivîsa xwe bi Kurdî xiyal bikin û bi Kurdî binivîsin!

Nûçeyên jîyanê bi Kurdî bibihîzin û bixwûnin!

Em Kurdî biaxivin, Kurdî bixwûnin û Kurdî binivîsin!

Axivtin, xwandin û nivîsîna Kurd, divêt bi Kurdî be!

Bo hunermendê Kurd, hunera herî mezin, hunera xwe bi Kurdî kirine!

Kurd î? Pêşîyê bi zimanê xwe, bi Kurdî biaxive, paşê jî çend zimanan bizanî fayde ye!

14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî ye, ji bîr nekin, pîroz bikin!

14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî, bila li neteweyê Kurd pîroz be!

**\* Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKye \***

\*\*\*

*„... Zimanê Kurdî girîngtirîn nîrxê neteweyî ye. Parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî barê ser milên hemû mirovên azadîxwaz e. KNK‘ê di warê têkoşîna parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî de gaveke girîng avêt û 14‘ê gulanê wekî Cejna Zimanê Kurdî destnîşan kir...“*

*[Ji pîrozbahîya Samî Tan]*

# 14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî li Kurdistanana Federal jî hate pîroz kirin. Nûçeyê li jêr ji DIHAyê ye û di Özgür Politikayê da hate weşandin.

## Kurdî nasnameya Kurdistan e

‘14ê Gulanê’ ku ji hêla Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ve wekî ‘Cejna Zimanê Kurdî’ hatibû îlan kirin, ji hêla roşinbîrên [ronakbîrên] Herêma Kurdistanana Federal ve jî bi erênî hate pêşwazî kirin.

Roja 14ê Gulanê piştî ji hêla Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ve wekî ‘Cejna Zimanê Kurdî’ hate îlan kirin, li tevahîya deverên Kurd lê dijîn tete pîroz kirin. Li Herêma Kurdistanana Federal jî ev roje bi erênî hate pêşwazî kirin. Roşinbîrên li Herêma Kurdistanana Federal ev roj li hemû gelê Kurd pîroz kirin û nêrînên xwe yê derbareyê rojê da ji DÎHAyê ra înan ziman. Mamoste Mihemed Osman li ser mijarê daxuyand ku bi salane jî bo standartkirina Kurdî xebatê dimeşîne û di vê mijarê da pirtûk nivîsîne. Osman, nêrînên xwe yê li ser 14ê Gulanê bi van gotinan înan ziman:

### ‘Pirsgirêka sereke jî cudabûna zaraveyan e’

“Ji bo neteweyan ziman pir giring e. Ji ber vê yêkê jî Kurdî nasnameya hemû Kurdistan e. Lazim e hemû hewildan û xebatên me ji bo pêşvebirina Kurdî bin. Di zimanê me Kurdî da niha hindêk pirsgirêk hene. Pirsgirêka sereke jî cudabûna zaraveyan e. Lazim e ev kêşe bête çareser kirin. Lazim e zaraveyên nêzîkî hev bèn cem hev û yekitîyek di nav zimanê Kurdî da çêbibe.”

### ‘Alfabeya Latîni zêdetir li gorî kurdî ye’

Li ser cudabûna alfabeyên ji hêla Kurdistan ve tene bikarînan jî Osman derbirî ku piraniya Kurdistan tîpên Latîni dizanin û bi kar tînin. Osman axivtina

xwe weha domand: “Herweha tîpên Latîni zêdetir li goreyî Kurdî ne û pêdivî û peywirên zimanê Kurdî baştir bi cih tînin. Ji ber ku ev alfabe ji bo hemû zaraveyên Kurdî tete bikarînan û guncan e jî. Ku alfabeya Latîni bête bikarînan, dê ev yêk di nava hemû zaravayan da standartbûnekê pêkbîne. Bikarînana tîpên Latîni û hevgirtina zaravayan, dê ji bo standardbûna ziman bibe bingeh.”

### ‘Binemaya herî mezin ziman e’

Dîrokna û Helbestvan Abdulkaliq Sersam jî îna ziman ku meseleya herî mezin ya di destê Kurdistan da mayî zimanê Kurdî ye. Sersam wiha dirêjî da axivtina xwe: “Ziman bingehê her tiştî ye. Tiştê neteweyan dike netewe ziman e. Miletêkî ku zimanekî yekgirtî û dewlemend hebe çu caran ji holê ranabe. Hêvîya min ew e ku hemû roşinbîr [ronakbîr] ji bo zimanê Kurdî bixebitin. Lazim e em zimanek wisa pêşve bibin ku li Amed, Hewlêr, Mahabad û hemû Kurdistanê pê biaxivin. Ez dixwazim hemû Kurd ji zaraveyên hev fêhm bikin...”

## 15 Gulan 2007

ADNAN MISTEFA / NÎHAT KAYA  
DÎHA / HEWLÊR  
YENÎ ÖZGÜR POLİTİKA

\*\*\*

## “Grewa birsîbûnê [birçîbûnê]” ya Strasburgê

Di navbeyna 11ê Nîsan û 19ê Gulanê da greva birsîbûnê [birçîbûnê] li Strasburgê li Mala Kulturê ya Kurdî û Fransî hate kirin. Di grevê da 75 kes bêşdar bûn. Ji van 18 kes, ku endamê konseyê rêvebir ya KKKyê [nihe KCK] Remzî Kartal jî di nav wan da bû, di greva bêtixûb da bûn û yê mayî jî 5 roja carekê doranê dikirin. Armanca grevê balkêşana ser pirsê jehrdiyîna Abdullah Ocalan bû ku CPT heyeteke bisporan bişîne zîndana li giravê Imralîyê û Ocalanî muayene bikin. Grev ji aliyê KNKyê ve jî hate destek kirin û 5 rojên ewil yê grevê serokê KNKyê Elî Egîd jî beşdar bû.

Grevê li seranserê Kurdistanê û meydanên diasporayê deng veda û piştevanîyeke mezin hate nîşan dan. Di



12ê Gulanê da jî li Strasburgê mîtingeke mezin hate kirin û nêzîkî 50 hizar Kurd li Strasburgê kom bûn û bi yêkdengî piştevanîya grevkeran kirin. Grev bi qebûlkirina xwastekên grevkeran 19ê Gulanê xilas bû. CPTYê rojek piştî xilasîya grevê heyetek şande Îmraliyê û di navbeyna 20-23yê Gulanê da lêkolînên hewce kirin li Tirkîyeyê. Heyet du roja li Îmraliyê ma û Ocalan muayene kir û roja dawîyê jî digel wezîrê dadîyê yê hukûmeta Tirk rûnişt û rewşa Ocalanî bo wan jî got.

\*\*\*

## Daxuyanîya KNKyê ya Gulanê

### Konseyarêvebirya KNKyê kombûna xwe di 13ê Gulanê da kir.

Konseya rêvebir ya KNKyê di nav şertên gelek diwar û aloz da kombû. Li milekê êriş û operasyonên berfireh yê dewleta Tirk, li milekê êrişkarîya Îranê, li milekê girtin û şiddeta dewleta Sûrîyeyê li Kurdistanê û li milê dî jî kiryarên terorane yê dewletên cîran yê li Kurdistana Federal her diçe zêde dibin. Tirkîye, Îran û Sûrîye ji serî were destdirêjîya xwe ya li Kurdistana Federal bi her awayî didomînin. Ev dewletên cîran yê kolonyalist bi çu awayî tehemmula tenahî û stabîliyeta Kurdistana Federal nakin û bi îsrar van kiryarên terorîstî bi destê rêxistinên taşeronî yê wekî El-Qaîde, Ensar El Islam û Cepheyê Turkmena û ajanên xwe pêkftînin. Terora dawîyê dîsa ve li Hewlêrê kirin û 14 sîvîl kuştin û bi dehan kes jî birîndar bûn. Jî alîyê me ve şik têda nîne ku taşeron kî dibe ferq nake, li paş vê terorê jî Tirkîye, Îran û Sûrîye hene. Em wekî KNK vê kiryarê bi xurtî rûş dikin û serxweşîyê didine hukûmeta Kurdistana Federal û binemalên şehîdan û daxwaza saxî û şîfaya xêrê bo birîndaran dikin. Em bawer dikin ku xelkê Kurd dê bi hêza xwe ya yêkgirtî van provakasyonên dewletên cîran yê bêbext pûç derêxe.

Rûdanên bûn û bûyerên li Kurdistanê û yê ku bi pîrsa xelkê Kurd ve girêdayî li derveyî Kurdistanê jî dewam dikin. Rojeva Kurdan îro li bakur û Ewrûpayê bi kiryara jehrîdana dewleta Tirk ya li ser rêberê

KKKyê Abdullah Ocalan ve tijî ye. Tête zanîn ku di 1ê Adarê da rapora jehrîdana Ocalan ji teref awûkatên wî ve li Romayê hatibû aşkera kirin û ji CPTYê hatibû xwastin ku heyeteke doktorên bispor bişîne giravê Îmralî ku Ocalan muayene bikin û xelkê Kurd ji encamê agahdar bikin. Lê mixabin ku CPT heta îro jî bêdeng ma û ji cihê xwe nelivî. Vê xemsarîyê Kurd aciz kirin û ji 11ê Nîsanê pêve li bajêrê Strasburgê greveke bîrsîbûnê (birçîbûnê) organîze kirin û heta îro jî ev greve dom dike. Ji bo piştevanîya vê grevê li seranserê Kurdistanê kar û xebatên bi rengên cuda hatin kirin û ew jî didomin. Grevkerên Strasburgê hatine dereceya rîzîkoya jîyanî û li goreyî agahîyên doktorên Heyva Sor ya Kurdistanê, jîyana çendek ji grevkeran di xeta alarmê da ye. Digel vê tehlîkeya jîyanî jî, CPT hêj jî bêdengîya xwe didomîne. Li ser vê yêkê 12ê Gulanê mîtingeke mezin, -ku nêzîkî 50 hizaran bû-, li Strasburgê pêkhat. Bi hizaran Kurd li Strasburgê kombûn û ev xemsarîya CPTYê û Konseya Ewrûpayê protesto kirin. Me jî wekî KNK bi xurtî piştevanîya vê grev û mîtingê kir. Piştî mîtingê jî daxwaza xelkê Kurd bi zelalî hate kivş kirin ku zûtirîn dem doktorên bispor ji bo Îmraliyê bêne rêkirin û Ocalan bête muayene kirin û rapora saxîya wî bo bîr û rehîya giştî bête aşkera kirin. KNK dê heta dawîyê li ser vê pîrsê raweste û hewildanên xwe bidomîne ku di meha Adarê da nameyek jî ji mezinên UN û YEyê ra hatibû şandin. Em hêvî dikin ku di serî da CPT û Konseya Ewrûpayê û organîzasyonên dî yê têkildar, dê xwe bilivînin û vê pîrsê çareser bikin û daxwaza xelkê Kurd bi cih bînin.

Yêk ji bûyerên giring jî wergirtina biryara hîlbijartinan e li Tirkîyeyê. Dewleta Tirk li ser hîlbijartina serokkomar kete nav krîzeke kûr û nikarî xwe jê xilas jî bike. Di encam da ertêşê muhtirayeke faşîstî da hukûmetê û hukûmetê jî biryara hîlbijartinan wergirt û bi vî rengî hîlbijartina serokkomarî ma bo parlamenta nû. Di vê prosesê da Partîya Civata Demokratîk, DTPyê, jî ji ber astenga baraja seda dehê, biryar da ku bi namzetên serbixwe bikeve hîlbijartinan. Li ser vê yêkê, hukûmet û partîyên opozîsyonê, ku berhingarî hev bibûn, dijî vê biryara DTPyê, di cepheyê Tirkbûyîna da gihîştin hev û biryara lîsteya yêkpare ya partî û namzetên serbixwe dan. Hukûmet û partîyên opozîsyonê bi vê biryarê, politîka « em û ew » derêxistin pêş. Deşîfîreya vî formûlê wan ev e ; « Tirk û Kurd »!

Li ber vê biryara wan ya antî demokratîk û şovenîst, em wekî KNK, di hîlbijartinan da biryara DTPyê ya beşdarîya bi namzetên serbixwe, di cih da û maqûl dibînin û piştevanîyê dikin. KNK hêvî dike ku Kurd

# Grûba KNKyê li Kurdistana Federal

bi tifaqeke herî fireh û xurt bikevin hilibjartinan û ji mezra û gundên herî dûr heta bajêran, her Kurd bi berpirsiyarîya Kurdetî û neteweyî ve biçine ser sindoqan û rehîyên xwe bidine namzetên ku DTPyê kivş kirî. Kurd divêt bi kêmasî ji hejmara grûbê, ku 20 e, zêdetir « wekîlên xwe » rêbikin parlamenta Tirkîyeyê ku têkoşîn, berevanî û parastina mafên xelkê Kurd di vî çeperî da jî bête dan.

KNK di çarçoveya maddeyê 140ê yê makqanûna Iraqa Federal da, li ser referandûma xelkê Kerkûkê, ku dê îsal pêkbêt, bi micidahî radiweste û dê xebata xwe berfirehtir bidomîne.

KNK herwisa dê hewildanên xwe yê avakirin û mayîndekirina têkilî û dîyaloga navxweyî ya neteweyî jî bêyî rawestan bidomîne.

Bi biryara KNKyê « 14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî » ewil car îsal tête pîroz kirin. Em wekî KNK « 14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî » li neteweyê Kurd pîroz dikin û hêvî dikin ku xelkê Kurd dijî asimilasyon û otoasimilasyonê berxwe bide, zimanê xwe di her xelesa jîyanê da bi kar bîne, biparêze û pêşve bibe.

Komisyona Jinan ya KNKyê di 16-17ê Hezîranê da « Konferansa Jinên Kurdistanê » kom dike. Em hêvî dikin ku konferans serkevtî derbaz bibe.

KNK kombûna xwe ya mezin jî bi beşdarîya hemû endaman di 23-24ê Hezîranê da li merkeza KNKyê li Brukselê dike. Agahdarî ji endaman ra hatine şandin. Em hêvî dikin ku endamên KNKyê dê bi hazirî beşdarî vê kombûnê bibin.

Bi hêvîya serkevtinên mezintir.

## Konseya Rêvebir ya KNKyê

### 13 Gulan 2007, Bruksel

**Not :** Di demê belavkirina daxuyanîyê da, xeberekî bi xem, kul û keser gihişte me ku li bajêrkê Kurdistana Federal li Mexmûr êrişeke terorîstî pêkhatiye û di encama peqandina bombeyekê da nêzîkî 50 kes mirine û nêzîkî 70 kesan jî birîndar bûne. Şik têda nîne ku li paş vê kiryarê jî dewletên cîran yê bêbext û bi taybetî jî Tirkîye heye. Em wekî KNK vê kiryara terorîstî rûreş û şermizar dikin û serxweşîyê didine hukûmeta Kurdistana Federal û malbatên şehîdan û ji bo birîndaran jî şîfa xêrê daxwaz dikin.

Grûbeke KNKyê seradanîya Kurdistana Federal kir. Grûb ji endamên konseya rêvebir Adem Uzun, Felemez Başboga û endamê KNKyê Hesen Nuzhetzade pêkdihat. Grûb di navbeyna 14ê Adarê heta 24ê Nîsanê da li Kurdistana Federal man û gelek havdîtîna pêkînan. Ji partiyên iqtidarê heta yê muxalefetê û gelek kes û hêzên ronakbîrî hatin dîtî û gotûbêjên berwer bi wan ra hatin kirin. Ji grûbê Felemez Başboga ev agahî dan:

„Me sê armanc kivş kiribûn ji bo di mîdehê gera Kurdistana Federal da:

1. Li ser rewşa rêberê KKKyê Abdullah Ocalan hêzên polîtîk û yê sivîl û demokratîk û xelkê me yê Kurdistana Federal agahdar bikin ku dijî jehrîdana Ocalan piştewanîyeke xurt bête organîze kirin.
2. Ji bo komkirina konferanseke neteweyî û avakirina dîyaloga navxweyî ya di navbeyna parçeyên Kurdistanê da gotûbêjeke berwer bikin û zemîne xebateke hevrayî amade bikin.
3. Pirsê vekirina buroya KNKyê çareser bikin.

Di wan rojên ku em çûyî da serokê Iraqa Federal Mam Celal Talabanî jî ji xestexaneyê derketibû û hatibû Silêmanîyê. Me jî xwast di vî keysî da zîyareta Mam Celal bikin û xwezîyên xwe yê şîfaya xêrê jê ra bêjin. Lê belê, doktoran destûra zîyareta rûbirû nedidan, lewma Dr. Behram Salih, ku cihgirê serokwezîrê Iraqa Federal e, em pêşwazî kirin. Me jî daxwaza saxî û şîfaya xêrê bi rêya Dr. Behram Salih bi Mam Celal ra gihand.

Bi berpirsiyarên hukûmet û partiyên polîtîk ra têkilîyeke germ pêkhat. Digel berpirsiyarên çapemenîyê û rêxistinên sivîl û demokratîk hevdîtînen baş û berwer hatin çêkirin.

Li “Warên Parastinê yê Medyayê” em digel berpirsiyarên KKKyê jî rûniştin. Berpirsiyarên KKKyê jî em gelek germ pêşwazî kirin û em digel wan jî li ser rewşa xelk û welatê me û herweha pirs û pirsgerêkên rêxistinî yê KNKyê û rola KNKyê rawestan. Berpirsiyarên KKKyê dubare piştewanîya xwe gotin û hevdîtina me digel wan jî gelek berwer bi dawî hat.

Me jî di hevdîtînên xwe yê bi çapemenîyê ra agahîyên berfireh dan li ser rewşa Ocalanî û bang kir ku hevkarî û piştevanîyêke xurt bête nîşan dan. Hasilî, di nav rojên 14e Adarê û 24ê Nîsanê da, jî Duhokê heta Hewlêr û Silêmanîyê me hevdîtînên berfireh pêkînan û xebateke baş kir. Divêt ev têkilîye bêne domandin. Di nav vê gera fireh da, em çûne Kerkûk û Kampa Mexmûran jî...”

\*\*\*

## Heyetek ji KNKYê, li Spanyayê hevdîtîn kirin

Heyetek ji Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê KNKYê ji bo danûstandinên dîplomatîk çû Spanyayê. Heyeta KNKYê, li paytext Madrîdê bi Partîya Gel ya Muhafezekar, Bloka Neteweyî ya Galîsya û Konfederasyona Sendîkayên Karker ra hevdîtîn pêkînan.

Heyeta KNKYê, ku ji serokê KNKYê Elî Egîd, nûnerê KON-KURDê Şivan Zerdeştî û psîkolog Seîd Uzun pêkdihat, di destpêkê da bi berdevkê têkilîyên derve yê Parlamentê yê ji Partîya Gel ya Muhafezekaran PP Alberto Rûîz Tîery ra rûnişt. Serokê KNKYê Elî Egîd dîyar kir, ku wan di vê hevdîtînê da derbareyê jehrdayîna rêberê KKKyê [nihe KCK] Abdullah Ocalan, zulma li ser Kurdan tête kirin û hîlbijartinên li Tirkîyê da agahî dane û destnîşan kir ku armanca wan ya sereke çareserîya demokratîk ya pîrsgirêka Kurd e. Di hevdîtînan da PPyê jî wisa got: ”Tirkîye pîrsgirêka Kurd çareser neke nikare bikeve YEyê”. Berdevk Rûîz Thîery jî da xuyakirin, ku heta Tirkîye pîrsgirêka Kurd û pîrsgirêka Qibrisê çareser neke, nikare bibe endamê Yekitîya Ewrûpayê. Thîery got: ”Em pîrsgirêka Kurd ji nêzîk ve dişopînin, hêvîdar in ku Tirkîye dê vê pîrsgirêka xwe bi rêyên demokratîk di demeke nêzîk da çareser bike.”

Heyeta KNKYê piştra bi rayedarên Konfederasyona Sendîkayên Karker CCOO û Bloka Neteweyî ya

Galîsya ya Parlema Spanyayê BNG ra hevdîtîn pêkînan. Serokê KNKYê Elî Egîd di hevdîtîna bi berpirsyarê têkilîyên derve yê Parlamentê Olaîa Fernandez Davîla ra da xwast ku derheqê rewşa tenduristîya Ocalan da bikevin nav bizavê. Davîla jî da xuyakirin, ku ew dê di asta Wezareta Karên Derve da bikevin nava bizavê û destnîşan kir ku ew têkoşîna Kurdan weke têkoşîna rizgarîya neteweyî dibînin.

31 Mayıs 2007

Serkanî: Mehmet Çolak ji ANF-Madrid / Yeni Özgür Politika

\*\*\*

## „Konferansa Jinan ya KNKYê“

Komisyona Jinan ya KNKYê, di rojên 30ê Hezîranê û 1ê Tîrmehê da li Elmanya, bi slogana “Jin Jîyan e, Jîyanê Nekuje”, “Konferansa Jinan ya KNKYê” pêkîna. Ji herçar parçeyên Kurdistanê û meydanên dîasporayê gelek jinên Kurd beşdarî konferansê bûn. Konferansê bi axivtina nûnera “Komisyona Jinan ya KNKYê” û serokê KNKYê Elî Egîd dest bi xebata xwe kir. Konferans bi vê programê pêkhat:

Şiddeta beramberî jinê û li çar parçeyê Kurdistanê rewşa jinê:

- \* Şiddeta nav malê [Fizîkî, psîkolojîk û cinsî]
- \* Şiddeta civakî [Recm, cinayetên namûsê, xwekujî, sunneta jinê]
- \* Şiddeta dewletê [Îdama jinan, îşkence, tecavuz, koç, şiddeta ekonomîk û y.d.]

Rola jinê ya di pêkhatina yekitîya neteweyî ya demokratîk da:

- \* Sewîyeya organîzebûnê ya jinên Kurd li her parçeyên Kurdistanê
- \* Tesîra vê organîzebûnê li ser warên polîtîk û civakî heta îro
- \* Di warê yekitîya neteweyî da sewîyeya gihiştina jinên Kurd ya heta nihe û pîrsgirêkên tene jîyan

Ji bo paşerojê pêşniyarên çareseriyê û metodên têkoşînê:

\* Di pirsra yêkitiya neteweyî da giringiya jinê û pêşniyarên ji bo çareseriyê

\* Di pirsra yêkitiya neteweyî da pêşniyarên eniya jinê û metodên têkoşînê û aletên bi kar înanê

**Organîzatorên konferansê; ji “Komisyona Jina ya KNKyê”:** Ferîde Abbasoglu, Hêvî Berwarî, Suna Tunc, Necîbe Qeredaxî, Nîna Ehmedî û Katibe Elî.

**Çend jinên ku bi axivtinên xwe beşdarî konferansê bûyî jî ev in:**

Sara Muhammedi, ji rojhilata Kurdistanê

Peyman Ebdullah, ji Berlînê

Leylê Guven, Şehridara Kuçukdikili ya Edeneyê

Suzan Mehmetoglu, ji rêxistina SELIS [Merkeza Jina ya Batmanê]

Perwin Ahmed, ji Berlînê

Herdem Kizilkaya, ji Bizava Demokratîk û Azad ya Jinê, ji Tirkîyeyê

Xelat Ehmed, Niviskar

Dr. Widat Akrawi, ji Danmarkê

Zeynep Zelal, ji Yêkitiya Jinên Azad ya Ewrûpayê

Beyan Şerefanî, ji Duhokê,

Pero Dundar, ji Partiya Civata Demokratîk [DTP]

Nigar Inayet, ji rojhilata Kurdistanê

Kadriye Imir, nûnera Dayîkên Aştîyê

Li jêr belavoka encamê, biryarên konferansê û axivtina nûnera “Komisyona Jinan ya KNKyê” didin.

**Belavoka encamê ya „Konferansa**

**Jinan ya KNKyê“**

**“Jin Jîyan e, Jîyanê nekuje“**

Konferansa jinan ya ku di peşengiya komisyona jinan ya KNKyê da hatîye organîze kirin, bi beşdarîya 50 jinên ji sazî û rêxistinên cuda hatî û ronakbîran, di navbeyna 30.06 - 01.07ê 2007 da bi şiyara “**Jin Jîyan e, Jîyanê nekuje“**, pêkhat. Ji her çar parçeyên Kurdistanê û dîasporayê jin beşdarî konferansê bûn.

Konferans wekî platformeke nêrînên cuda yê li ser pirsra jinê hate îfade kirin. Di konferansê da şiddeta ku dewlet, civak û malbat li ser jinan dikin, bi kûrahî hate riberiz kirin (munaqêşe kirin) û bi xurtî hate şermizar kirin. Di riberizan da hate dîyar kirin ku jin li kî derê be bila bibe, pirsgirêkên jinên Kurd hevbeş in û di her alî da têne tepisandin. Lê herçiqas ji bo netewetiyê kar bête kirin jî, heta ku jinên Kurd mafên xwe bi dest nexin, civaka Kurd ji zihnîyeta babşahî rizgar nabe. Bi civakeke paşketî û di bin tesîra dewletên serdest da mafên jinan çu caran nayên bi dest xistin. Di pêşxistin û guhortina civak û sistemê dewletên serdest da divêt jin pêşengiyê bikin.

Herçend jinên Kurd di bin hakimîyeta dewletên cuda yê kolonyalist da û herweha li Kurdistanê Federal jî bijîn, lê rengê êşên jinan nayê guhortin. Ji ber ku welatek azad jî bibe nayê wê manayê ku pirsgirekên jina çareser dibin û jin jî azad dibin. Sîstemê mêrşahîyê xwe di hemû saheya jîyanê da bi cih kirîye û jin di bin barê giran yê jîyanê da têne fetisandin. Jin ne xwedî vîna xwe ya azad in. Jin ji ber ku baş ne bi rexistin in, li beramber edetên kevn û qanûnên li dijî wekhevîya jin û mêran nikarin derbikevin û ji bin barê giran nikarin rabin. Herweha di derbareyê mafên xwe da, xwe bi zanyarî perwerde nekirine. Wekî çare dawîyê bi jîyana xwe tînin. Bêşik herçend xwe kuştin di aliyekê da wekî neqebûlkirina jîyana koletî bête biha kirin jî, lê baş tête zanîn ku li beramber şiddetê, xwekuştin ne çare ye û ev yêke, lawazîya jinan nîşandide. Jina ku cesaret dike ku xwe bikuje, cesareta wê heye ku li beramber jîyana koletî jî derbikeve. Di aliyekî dî da herçend ji bo mafên jinan qanûn bêne guhortin jî, dîsa mafên jinan nayên parastin. Ji ber ku di nav civata Kurd da, ji aliyê jîyana jinê ve, mixabin ku tesîra edetên kevnare û paşverû hêj jî bi zêdehî ve tête dîtin. Di civatê da bi giranî jin wekî malê mêran tête dîtin. Û di bin navê parastina şerefa mêran da kuştina jinan hindî hûn bêjin zêde ye. Anku ji bo ku mêr nekevin zîndanê jin mecbûrî xwekuştinê têne kirin.

Divêt jin di her alî da xwe bi hêz bikin, ji ber ku xebata azadîya jinan gelek zehmet e. Di vê xebatê da jî, jin li şûna ku ji dewletan, ji mêran hêvî û daxwazan bikin, divêt bi keda xwe xebata azadîya xwe bimeşînin. Herweha divêt ku ew zihnîyeta mêrşahîyê, ku dibe sebebê kuştin û xwekuştina jinan, bête kuştin. Ji bo ji halê rakirina vê zihnîyetê û guhortina qanûnên dijî jinan, yêkitîyeye xurt pêwîst e. Têkoşînê yêkekesî encam nagirin. Di her alî da avakirina rêxistin û sazîyên jinan û hevkarîya wan ya bi hevdu ra, dê hêza guhortinê jî bi xwe ra bîne.



Li kî derê li jinekê neheqîyek bête kirin, divêt her jinek wê neheqîyê wekî ku li wê hatibe kirin bibîne û helwesta xwe nîşan bide.

Em bawer dikin ku ev konferans ji bo hingavên hêj mezintir dê bibe bingehê xurt. Herweha vê konferansê, hêvîya jinên Kurd, ya di derheqê avakirina yêkitîya neteweyî ya demokratîk da, geştir û mezintir kir. Em hêvîdar in ku di rojên pêşîyê da, bi organîzasyonên hêj berfirehtir li Kurdistanê bigihin hevdu.

**30 Hezîran – 01 Tîrmeh 2007, Elmanya**

\*\*\*

## **Biryarên “Konferansa Jinan ya KNKYê”:**

1. Konferans bangî bîr û rehîya giştî dike ku şerê li rojhilatanavîn bête xilas kirin û aşîyêke mayînde bête pêkînan.
2. Konferansa jinan bangî welatên serdest yên Kurdistanê dike ku timamî xwestekên Kurdan yên demokratîk yên siyasî, sosyal û kulturî nas bikin.
3. Konferans, kuştina jinan ya bi navê namûsê, îdam, şiddeta wekî recm, lêdan, sunnet, îşkence, tecavuz û koça bi darê zorê û tedaya ekonomîk ya li ser jinan mehkûm dike û ji bo ku pêşî li van kirêtîyan bête girtin jî têkoşînê dide ku guhortinên qanûnî bêne kirin.
4. Konferans, xurtkirina yêkitî û piştgirîya jinên Kurd esas digire û li hember her reng şiddeta li ser jinan reftara (helwesta) hevpar nîşandide.
5. Konferans, qanûnên li welatên serdest yên Kurdistanê ku prensîba wekhevîya jin û mêr bînpê dikin, mehkûm dike û ji bo ku guhortinên qanûnî li goreyî huqûqa navneteweyî bêne kirin, tekoşînê dide.
6. Konferans, piştgirîya rêxistin û ronakbîrên ku ji bo rakirina maddeyê 7ê yê makqanûna Kurdistana Federal [ku „Şerîetê îslamê jî

yêk ji serkanîyên qanûndanerîyê dibîne“] têkoşînê didin, dike.

7. Konferans, bangî hemû partî, rêxistin û sazîyên civaka sivil û ronakbîran dike ku ji bo avakirina stratejî û siyaseteke neteweyî bigihin hev û herweha konferanseke neteweyî pêkbînin.
8. Beşdarên konferansê biryar da ku konferansa jinan salane bête çêkirin.
9. Konferansherwehahêvîdikekonferanseke jinan bi hevkarîya rêxistinên jinan yên li Kurdistana Federal jî li Kurdistanê bête amade kirin.
10. Hemû beşdarên konferansê li beramberî bicihînana biryarên konferansê berpirsîyar in.
11. Navê vê konferansê „Konferansa Yêkitî û Hevgirtina jinên Kurd e“.

Di konferansê da komîteyêke çavdêrîyê ya ji heft kesan pêkhatî jî hate hîlbijartin. Komîte ji van kesan pêkhat:

Beyan Şerefanî, Ronak Mustefa, Dr. Wîdat Akrawî, Xelat Ehmed, Ferîde Abbasoglu, Suna Tunc û Sozan Elyas.

**30 Hezîran – 01 Tîrmeh 2007, Elmanya**

\*\*\*

## **Axivtina vekirina konferansê ya nûnera “Komisyona Jinan ya KNKYê”:**

**Delege û mêvanên birêz,**

Ji alîyê xelkê Kurd û jinên Kurd ve di demekî giring da konferansa me ya ji alîyê KNKYê ve hatîye amade kirin, kom dibe û hûn hemû bi xêr hatin.

Helbet em xemgîn in ku konferansa me ji axa welat

dûr çêdibe, belê herweha hêvîya me xurt e ku eve dê gaveke dî me nêzîkî Kurdistanê azad bike.

### **Hevalên hêja,**

Di dinyaya sedsala 21an da, ku manayeke netewewewletan nemaye û tixûb [sînor] radibin, em wekî xelkê Kurd bi bedelên mezin ber bi xewna welatekî azad ve dimeşin. Em di polîtîkên roja îro da dibînin ku ev rêye bi gelek asteng û zorîyan ve tijî ye.

Sedan sal in ku li ser xelkê Kurd polîtîkên "parçe bike û di rê bibê" têne bi kar înan û eve dibe sebebê sirgûn, qetlîam, êş û rondikên çavan ji bo sedan mirovên me. Kurdistan ji aliyê cografîk ve, tenê bi parçebûnê ve nemaye, herweha sedhizaran mirovên me mecbûrî koçkirina li çarnîkarê dinyayê bûne, bi dehan Kurd di okyanûsan da xerq bûne, hizaran mirovên me jî mehkûmî jîyana varoşan bûne.

Li milekê polîtîkên navneteweyî yên ku Kurdan bi kar tînin, li milê dî axa û şexên ku van polîtîka bo berjewendiyên xwe bi kar tînin, jîyana xelkê Kurd felc kirine. Bi salan e ku şerê navxweyî yê eşîrî ji bo polîtîkên navneteweyî kirine malzeme. Dîsa cudahiyên mezhebî û dînî ji bo şerê nav Kurda kirine sebebên bingehîn. Şerê mezhebî yê di navbeyna Kurdên musulman, Elewî û Êzîdî da, bi xwe ra qetlîama hizaran mirovên me îname û li ser xelkê me birînên kûr vekirine û cudahiya di nav xelkê me da jî kûrtir kirîye.

Ev pêşhatine hemû bûyne sebebê bê îdentîtîtiya sedan salî, parçebûna rûhî û berzebûna bi xwe bawerîyê.

Sîstemê babşahiye [pederşahî - patriarchal], dijayetiyan [tenakuzên - konfliktên] mezhebî û eşîrî yên di nav xelkê Kurd da kûr kirîye û bi sedan sal e bi kar îname û xelkê Kurd bê welat hêlaye û vê yêkê ji aliyê sosyal ve jî meyardariya neyînî bi xwe ra îname. Pîvên jîyana feodalî û dînî li Kurdistanê her roj xurttir bûne û civat ji nav ve hilweşandîye. Wisa ku li Kurdistanê hebûna malbatî li şûna welat hatîye bi cih kirin, welatê Kurd bûye malbat û berjewendiyên welat ji bo berjewendiyên eşîrî û malbatî hatine gorî kirin.

Li Kurdistanê mêrê ku reîsê malê ye, malbata xwe wekî welatê xwe dîtîye û mal jî bi dilê xwe di rê birîye!

### **Jinên hêja,**

Qetlîamên dewletan yên li çar parçeyên Kurdistanê,

mêrê Kurd ji pêya kirîye, bawerîya bi xwe kuştîye, windakirina ji vê bêhêziyê û şkestina rûhî li ser jin û zarokan dizivire şiddetê. Adeta mêrê ku nikare sîstemê, tola vê janê ji jin û zarokan distîne.

Jina Kurd ji milekê ve dikeve ber şiddet, tacavuz, îşkence û bindestiya ekonomîk ya dewletê, li milê dî jî bi ber şiddeta ku bi tabûyên dînî û feodalî ve hevîr bûyî ya malbat û civatê dikeve. Recm, sunnet, lêdan, cinayetên namusê û têkilîyên ensestî, wekî qederê tûşî bedena jina Kurd bûne û jina Kurd ji ber van binasan çareyê di xwekuştinê da dibîne û xwe dukuje.

Di bin zulma salan ya dewletê, şiddeta malbatê û zora erf û edetên feodalî û herweha bê nasname mana sedan salan da, me gelek tişt ji jinîtiya xwe jî berze [winda] kirin. Em bûne karînaner û destekdarê sîstemê mêrşahiye [desthilata mêr].

Em kirin sebebê şerên eşîrî. Vînen [hezkirinên] me di nav dijayetiyan mezhebî da xerq bûn. Em ketin halekî wisa ku, me ji jinîtiya xwe şerm kir û em ji jinîtiya xwe tirsan. Kor, ker û lal mana di nav çar dîwaran da, me bo xwe kire garantiya jîyanê. Dinyaya me di nav çar dîwaran da, di navbeyna xizmet û fedakarîyê da hate şidandin. Me piştî xwe da jîyanê, rûyê xwe da mirinê û me wekî hebûnên obje jîyana xwe domand.

Hal ew e ku, sedan sal e digel hemû qetlîam, jenosid û asîmilasyona li ser Kurdan, ziman û kultura Kurdî, piştevanîya civakî û bihayên demokratîk me jinên Kurd gihandine îro. Herçend me dem bi dem di îsyanan da cisareta xwe nîşan dabe jî, lê çu caran em digel xwe aşt nebûn. Li milekê em silê xwe [xeyidîyê xwe] bûn, li milê dî lêgerînên me yên azadîyê di nav berzekirinên me da dilop dilop mezin bûn.

### **Hevalên hêja,**

Têkoşîna azadîyê, ku ev sih sal in li çar parçeyên Kurdistanê îmkân daye jinan, ji bo lêgerînên me yên azadîyê jî koşa xwe vekir. Hizaran jin ber bi mekanên azadîyê ve herikîn û hem xwe bi têkoşîna nasnameya neteweyî ve, hem jî azadîya jinê ve girêdan. Digel hilweşandina tabûyên dînî û feodalî, me tixûbên [sînorên] hêza xwe jî nas kirin. Me dijî nêrîn û reftarên ku jinê nîne dikin, hêza têkoşîna bi rêxistinî dît. Di vê qonaxa em hatinê da, em nezîktirî welatekî azad û jîyaneke azad in. Me bi hiş û îradeya xwe, sunneta jinê, recm, cinayetên namusê, ku li Kurdistanê tabû ne, dane riberiz [munaqêşe] kirin. Em tégîhiştin ku bi vê hêza xwe, em dikarin ji van kirinên xwe zêdetir tiştan bikin.

**Delege û mêvanên birêz,**

Em bawer dikin ku bi organîzebûnên xurttir, em dikarin çareseriyên mezintir biafirînin û di vê konferansa xwe da em dikarin yêkitîya neteweyî, ku heta îro me nikarîbû pêkbînin, vehûnin. Dîsa ve em dikarin êş û janên xwe yên ji jinîtiyê peyda dibin parve bikin û çareyên jê xilasbûnê jî bi hev ra bibînin.

Em mecbûr man ku vê konferansa xwe li derveyî welat kom bikin, belê divê em têkoşîna xwe bidomînin ku li ser esasê yêkitîya neteweyî li nav welat jî konferansên xwe bikin. Çareseriyên ku bi xwe ra azadîya jinê û demokrasîyê binin, bi têkbirin û şkandina polîtîkên babşahî [pedersahî] mumkun dibe. Bi vê baweriyê em hêvî dikin ku konferansa li pêşîya xwe li Amedê, li Kerkûkê, li Kobanî û li Makûyê pêkbînin.

Careke dî hûn bi xêr hatin û silav û rêz bo we hemûyan û konferansa me serkevtî be.

30 Hezîran 2007, Elmanya

\*\*\*

### **Sloganên Konferansê**

- Yêkitîya jinên Kurd, yêkitîya jîyaneke azad û bi rûmet e.
- Garantîya bizava azadîyê yêkitîya jinên Kurd e.
- Yêkitîya demokratîk û neteweyî ya xelkê Kurd bi azadîya jinê pêktêt.

\*\*\*

***“... Jina Kurd ji milekê ve dikeve ber şiddet, tacavuz, îşkence û bindestîya ekonomîk ya dewletê, li mîlê dî jî bi ber şiddeta ku bi tabûyên dînî û feodalî ve hevîr bûyî ya malbat û civatê dikeve...”***

# **Rojnamevanê “Yeni Özgür Politika”yê, Yeko Ardil, digel ROJAN HAZIM Endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê û serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KKNKyê întervûyek kir, li jêr didin:**

**YEKO ARDIL:** Kongreya Neteweyî di destpêkê de bêtir bi rengên xwe yên piralî û cuda xwe da nîşan, gelo sedem çî ye ku îro ev tengbûn hatiye himatê?

**ROJAN HAZIM:**

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ji ber hewcehîya “yêkitîya neteweyî” hatiye damezrandin. KKN ne organîzasyoneke îdeolojîk û ne partî anjî rêxistineke dî ye ku bi armanca desthilata polîtîk derketîye sehneya polîtîk ya Kurdistanê. Di meydana polîtîk ya Kurdistanê da biçûk mezin gelek rêxistin hene û hemû jî di programên xwe da li ser giringî û hewcehîya

”yêkitîya neteweyî” radiwestin, lê mixabin ku di pratîkê da bi cih naînin. KNK jî vê hewcehiyê derketîye ku di navbeyna van hemû rexistinan da têkilî û diyalogekê pêkbîne û heke mumkun be hemûyan, nebe jî piraniya maqûl di bin banê xwe yê demokratîk da kom bike ku pirs û pirsgirêkên neteweyî bi vê hevdengî û ahenga demokratîk bêne çareser kirin û dijî rejimên kolonyalist û dagîrker jî dengê yêkgirtî yê neteweyî derkeve pêş. Anku KNK organîzasyonêke sihwane ye. Esasen KNK di destpêka damezrandinê da jî bi firehiyêke ku dil dixwast pêknehat. Belê axir li goreyî wan şertan dîsa ve ji hemû parçeyan û diasporayê hejmareke bilind ya rêxistin û kesayetîyan di bin banê KNKyê da kom bûn. KNK di vî warî da bû tecrubeyeke baş, lê belê tradîsyona negatîv û heta dereceyekê jî kronîk ya sosyal û polîtîk ya di nav Kurdistan da dîsa ve ser ji ”şuûra yêkitîyê” stand û gelek kes û rêxistinan xwe ji nav KNKyê paşve kêşan. Binasên [sebebên] vê yêkê piralî ne, lê ya sereke ”subjektîv” e û kultura bi hev ra karkirina terefên ji hev cuda, di nav Kurdistan da di dereceya nîneyê da nebe jî nezîkî wê ye. Bîr û hizira ”xwe li ser hevdu ferz kirin”ê hêj jî bi giranî didome di nav rêvebirîyên sosyal û polîtîk yê bi giştî Kurd da. Hizira ”di asgarî muştêrekê da bi hev ra karkirin”ê bi gotina herî optîmîst ”kêm” e. Nebûn anjî kêmiya bîr û hizira ”rekabeta demokratîk” û xebatên koalîsyonal, bivê nevé di nav Kurdistan da ”ji hevdu dûr man” û ”dijî hevdu rawestan”ê bi xwe ra tîne ku eve jî encameke negatîv e û helbet sîrayetî nav KNKyê jî dike. Digel van hemû negatîvîyan jî, divêt neheqî jî neyête kirin ku îro di nav KNKyê da rêxistina herî mezin ya parçeyê bakur cih digire û stûna ragir ya KNKyê ye. Rast e, partîyên xwudan desthilat yê başûr ne di nav KNKyê da ne, belê jî xwe wan di serî da di nav KNKyê da cih negirt. Lê ji başûr, ji rojhilat, ji başûrarojava û diasporayê rêxistin û kesayet hene ku ew jî xwudan temsilîyet in li Kurdistanê. Belê rastîyek heye ku dereceya heterojenîya terkîba KNKyê ya îro ne bilind e û ne li goreyî ku tete xwastine. Eve jî ji rewşa sist û lawaz ya polîtîk ya Kurdistanê derdikeve.

**YEKO ARDIL:** Her çiqas bi teşe û rêbazên cur bi cur jî be, piraniya kurdan ji tunebûna ”Yekîtiya Neteweyî” bi gazinin û tim ev bang tê kirin. Li gorî we mercên yekîtiya kurdan hene?

**ROJAN HAZIM:**

Belê, Kurd bîst û çar seet behsê ”yêkitîya neteweyî” dikin, lê gava dor hate pratîkê xwe jê badidin. Problem jî xwe ev e. Gotin û kirina kurdan ya di derbareyê ”yêkitîya neteweyî” da hev nagirin û Kurd di pirsra

”yêkitîya neteweyî” da di nav paradokseke kûr da ne. Helbet heke bi çavekî objektîv lê binêrin, kêmasîya hemû alîyan ne wekî hev e û hindek organîzasyon digel hemû kêma û kasîyên xwe jî be, reftareke pozîtîv nîşan didin û îmkânên xwe didine xizmeta xebatên ji bo yêkitîyê, lê dîsa ve her alîyek li goreyî rewş, hêz û şiyana xwe xwudan bahr e di vî warî da. Digel vê rewşa negatîv jî şertên objektîv hindî hûn bêjin gihiştine ji bo tifaqa herî fireh ya Kurdistan. Heta ku nîrê kolonyalîzmê û dagîrîya welat bidome, dê şoreşa neteweyî ya demokratîk jî berdewam be û yêk ji karakterîstîkên şoreşên neteweyî û demokratîk jî ”cephegirî” ye. Divêt hemû baskên civatê li ser esasê berjewendîyên hevpar yê neteweyî bêne nik hev ku welatê xwe ji dagîrîyê û nîrê kolonyalîzmê rizgar bikin. Vêca organîzasyonên wekî KNKyê jî modelên cephegirîyê ne. Xala ”muştêreka asgarî” ya di navbeyna hemû elementên neteweyî da ”rizgarîya welat û azadiya netewe” ye. Di lojîka şoreşên neteweyî yê demokratîk da yêkitîya li ser vî bingehi bivê nevé ye. Ji ber hindê şertên yêkitîya neteweyî hene, belê mixabin ku ev kêmasî û qusûrên me li jor jî gotî dibin astenga herî mezin di pêşîya ”yêkitîya neteweyî” da û zemînê bi hev ra kar û xebat kirinê jî tete berze kirin.

**YEKO ARDIL:** Bi awayekî vekirî; feraseta KNKê ya derbarê yekîtiya neteweyî de çi ye?

**ROJAN HAZIM:**

Şertên hebûna KNKyê jî xwe ”yêkitîya neteweyî” ye. Misyonê KNKyê pêkînana yêkitîya neteweyî ye. Rola ku KNK pê rabûyî komkerîya dînamîkên neteweyî ye. Cihê ku belavîya hêzên neteweyî lê heye, wezîfeya KNKyê dest pê dike. Bêyî vî erkî, ji hebûna KNKyê nikare bête behs kirin. Belê divêt herweha jî rasyonel bin, anku ”yêkitîya neteweyî” tinê bi xwastin û hebûna KNKyê pêknayêt. Ji organîzasyonên sosyopolîtîk bigirin heta yê sosyokulturel û sosyoekonomîk yê Kurdistanê û herwisa jî kesayetîyên ronakbîr, di vî warî da ji bilî xwastina teorîk, divêt xwudanê reftareke pozîtîv ya pratîk jî bin. KNK dikare bibe zemînê tifaqeke herî fireh ya hêz û kesên neteweyî û dikare pêşengîya karekî wisa yê di xêra xelkê Kurd û xelkên di yê Kurdistanê da bike. Di halê hazir da tifaqeke ku dil dixwaze, tifaqeke piraniya maqûl ya dînamîkên neteweyî pêknehatîye. Belê hewildan hene û KNK di vî warî da aktîv e. KNK dizane, heta ku hêzên xwudan desthilat yê saheya polîtîk ya Kurdistanê meyardarên yêkitîyê nebin û di vî warî da însiyativê jî wernegirin, di çarçoveya fireh da pêkînana yêkitîya neteweyî zehmet e. Lê belê, bi giştî karên pêkînana



yêkitîyan ne sanahî ye û KNK di vê şûrê da ye û ji ber vê yêkê jî rasyonel hereket dike û li goreyî şertên heyî di gava ewil da li avakirina têkilî û diyalogê digere û kar û xebatên bi vî rengî dewam dikin.

**YEKO ARDIL:** Li aliyekî kurd hê jî bi klîşeyên weke perestîna û hebandina reng û simbolan ve ji hev diqetin û li aliyekî jî behsa yekîtîyê tê kirin, ev ne nakokî ye?

**ROJAN HAZIM:**

Belê rast e. Wekî me di serî da jî gotî, yêk ji paradoksên herî mezin yê Kurdan ew e ku, hem di dereceya fetîşîzmê da behsê “yêkitîya neteweyî” dikin, lê di pratîkê da jî berevajî gotinên xwe hereket dikin. Bi gotina gelerî, di derbareyê “yêkitîya neteweyî” da, fikir û zikirê Kurdan hev nagire. Hal ew e ku divêt di muştêreka asgarî da hevgirtinek hebe. Sembolên ku temsîla hemû neteweyî dikin, divêt xalên hevpişk yê Kurdan bin û bi giyanekî yêkgirtî divêt xwudanî li wan simbolan bête kirin. Lê mixabin ku di vî warî da jî bi gotina herî sade xemsarîyeke bê mana û sekterîzmek têtê dîtin di pratîkê da, ku ev reftare jî dibe asteng li pêşîya avakirina “yêkitîya neteweyî”.

**YEKO ARDIL:** Gelo fesihkirin ango navguherandina KNKê di rojevê de ye?

**ROJAN HAZIM:**

Wekî hûn jî dizanin, kombûna KNKyê ya mezin di rojên 23-24ê Hezîranê (2007) da li Brukselê pêkhat. KCKyê, ku hemû rêxistinên girêdayî sîstemê KCKyê endamên KNKyê ne, pêşniyareke konkret teklîfî KNKyê kir. Di wê pêşniyarê da, gelek aşkera têtê xwastin ku KNK û Kongreya Gel bibine yêk û biryar û reftara KNKyê têtê tika kirin. Kombûna mezin ya KNKyê jî selahîyeta biryara li ser vê pirsê daye konseya rêvebir ya KNKyê. Konsey li ser vê pêşniyara KCKyê radiweste û dê bersiveke pozîtîv bide KCKyê. Me di serî da jî got û di dubarekirinê da çu mehîzûr nîne ku şertên hebûna KNKyê hewcehiya yêkitîya neteweyî ye. Di pêkînanana yêkitîya neteweyî da KNK çu tabû û dogmayan nas nake û çu fedakarî hewce be dê bike û divêt jî bike. Organîzasyon ne armanc in, alet in di têkoşîna rizgarî û azadîya Kurdistanê da. Li goreyî vî formûlî, heke pêdivî be ku nav û program bête guhorîn û rengêkî nû bidine KNKyê, divêt bête kirin. KNKyê piştî kombûna giştî ya Gulana 2006ê jî aşkera got ku ew amade ye ku ji bo pêkînanana yêkitîya neteweyî hemû fedakarîyan bike û nav jî têda çu guhorînên hewce hebin bike. Ya giring ew e ku, yêkitîya têtê xwastin di xizmet û xêra xelkê Kurd û doza Kurdistanê da be. Helbet KNK

destkevtêk e û têtê nas kirin. Ji ber vê yêkê hûvîyeta KNKyê bête parastin û heke li hev hatinek pêkbê ku di nav KNKyê da yêkitîyeke berfirehtir bête ava kirin dê baş be. Lê dîsa ve, KNK ji bo pêkînanana her reng yêkitîyên pozîtîv nabe asteng û divêt nebe jî. Di vehûnandina yêkitîyan da teref li ser xaleke maqûl digihin hev. Ji bo armanca yêkitîyeke xurttir, “gotinek” li ser navê KNKyê dikare bête zêde kirin jî. Bawerîya me ew e ku dê li ser xeteke maqûl pêkhatinek derkeve meydanê. Mirov nikare îro jî “fesihkirin”ê behs bike, belê ji organîzebûneke bi reng û formekî nû dikare bête behs kirin. Pêşniyara KCKyê di rojevê da ye û hevdîtin, gotûbêj û riberizên digel KCKyê dewam dikin û têtê hêvî kirin ku encameke pozîtîv ya di xêra neteweyî Kurd û doza Kurdistanê da bête vucûdê û gaveke xurttir bête avêtin di warê pêkînanana yêkitîya neteweyî da.

**YEKO ARDIL:** We wek lijneyek li ser navê KNK ê serdana Başûr kir, hûn ji aliyê hikûmetê ve di çî astî de hatine qebûl kirin? Çavdêriyên we yê li ser Başûr çî ne?

**ROJAN HAZIM:**

Dawîya meha Çile (2007), wekî heyeta KNKyê, em çûn Kurdistanê Federal. Armanca me danana têkilî û diyaloga digel rêxistinên polîtîk, sosyal, kulturî û kesayetîyên Kurdistanê bû. Ji ber pozîsyona serbixwe ya KNKyê, em bi zanahî bi vexwandina rêxistinanan anjî hikûmetê neçûn û KNK bi timamî bi însiyatîva xwe çû başûr. Ji partîyên desthilatê heta yê opozîsyonê, ji kesayetîyên serbixwe yê polîtîk û ronakbîran heta rêxistinên kulturî û wezaret û wezîran, me seradanîyeke berfireh kir. Mexseda me ew bû ku di nav hevdîtinên sade û mutevazî da, armanca KNKyê bi terefan ra bigihînin û KNKyê bidine nasandin û li ser vî binge hî rêya têkilî û diyalogê xweş bikin û zemînê tifaqa neteweyî amade bikin. Di vê seradanîya başûr da, keysek pêkhat û em digel rêvebirîya KCKyê (hingê KKK bû) jî rûniştin û gotûbêjeke berwer pêkîna digel wan. Di mîdehê sê heftîyan da hevdîtinên pozîtîv hatin kirin û di avakirin û vehûnandina yêkitîya neteweyî da gavên konkret hatin avêtin ku yêk ji wan jî têkilîya KNKyê ya dîrekt bi dezgehên fermî û sîvil yê Kurdistanê Federal bû. Di pîrsa komkirina “Konferansa Neteweyî” da jî hişyarî û baldarîyek hate gihandin. Ji bo pîrsa we ya li ser rewşa başûr jî mirov dikare bi rehetî bêje ku bi giştî Kurdistanê Federal, di nav bizaveke mezin ya avakirinê da ye û çarnîkarê başûr adeta şantîye ye. Ji avakirina binaxeya bajêran heta çêkirin û firehkirina rêyan û dîsa çêkirina avahîyan

herketeke xurt tete dîtin li başûr. Helbet kê m û kasî û hetta şaşî jî hene, lê axir hemû li ser hev, ev pazdeh sal in ku tecrubeya Kurdistan Federal pêkhatîye û hêj gelek sava ye. Tiştê xuyayî ew e ku xelkê Kurdistanê bi avabûna Kurdistan Federal gelekî şa ye û hêviya xwe ya xizmetguzariyê jî diparêze. Bê îş û karî heye, lê xelk hêj jî ji ber azadbûna Kurdistanê û bîrhatina taze ya wan rojên reş û tarî yên demê rejîma Seddamê gorbîgor, krêdîyê dide hukûmet û partiyên desthilatdar û hêviya xwe ya ji bo paşerojê xweş û dilşa bi xurtî jînde digire.

**YEKO ARDIL:** Komîsyona Ziman a KNK ê hin hewldanan derdixê pêş, gelo KNK di warê bikaranîna zimanê dayîkê de çiqas dikare hîkarî li sazî û rêxistinên kurd bike?

### **ROJAN HAZIM:**

Komîsyona ziman û perwerdeyê ya KNKyê, ji destpêkê were, li ser pîrsa ziman û perwerdeya bi zimanê Kurdî, bi rêxistinên neteweyî û kesayetiyan ronakbîr yên Kurd ra di nav têkilîyê da ye. Kampanyaya axivtina zimanê Kurdî ya salekê bi serkevtî hate encamdan û bi vê kampanyayê ve, şûra Kurdî axivtinê hate xurt kirin. Baldarî û hişyarîyeke bilind hate afirandin di serê mirovê Kurd da. KNK wekî organîzasyonê sihwane, karên pratîk nake, belê biryar û perspektîvên li ser hewcehiyên neteweyî dide û dê vê mîsyona xwe jî bidomîne. Di pratîka salekê da û bi taybetî jî di nimûneya kampanyaya axivtina zimanê Kurdî û pîrozîya "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" da, rêxistinên sosyopolîtîk û sosyokultûrel yên Kurd û xelkê me jî, bi biryar û perspektîvên KNKyê ve girêdayî man û hevkarî û destekeke mezin dane KNKyê. Prestîja KNKyê di nav xelkê Kurd û rêxistinên Kurd da heye û beramberî biryarên neteweyî yên KNKyê rezgirtinek heye û pêşniyar û biryarên KNKyê di pratîkê da jî tene bi kar înan ku ewe bi serê xwe rewşeke pozîtîv û encamgir e ji aliyê KNKyê ve. Lewma KNK dê hewildanên xwe yên di derbareyê zimanê Kurdî da bidomîne. Ji xwe di kombûna mezin ya 23-24ê Hezîranê (2007) da, komîsyona ziman û perwerdeyê pêşniyar kir ku "Akademîya Zimanê Kurdî" bête damezrandin û ev teklîfa komîsyona ziman û perwerdeyê bi yêkdengî hate qebûl kirin û em dê vê organîzebûnê jî pêkbînin.

**YEKO ARDIL:** We di rapora xebatê ya Civata 7 emîn de behsa dilşadiya ku ji bo Cejna Ziman derketiye holê kir, gelo emê sala bê Cejna Ziman bi çî awayî û li kîjan deveran pîroz bikin?

### **ROJAN HAZIM:**

Di dîroka Kurdistanê da cara ewil tradîsyona "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" ji teref KNKyê ve hate dest pê kirin û cejna pêşiyê jî di 14ê Gulana îsal (2007) da hate pîroz kirin. Xelk û rêxistinên Kurd li cejnê xwudan derketin û cejn bi boşahî û çoşeke bilind li seranserê Kurdistanê û meydanên dîasporayê hate pîroz kirin. Ev cejn êdî bû tradîsyon û cejneke neteweyî û dê her sal 14ê Gulanê bête pîroz kirin û ji xwe ev biryardarî hem di mesaja KNKyê, hem jî di mesaja KCKyê (hingê KKK bû) da jî bi zelalî hebû. "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" dijî asîmilasyonê rejîmên kolonyalist û dagîrker yên Kurdistanê, çeperekî xurt yê bizava xwudan derketina zimanê Kurdî ye û dê hersal bi vê bîr û bawerî û şûrê bête pîroz kirin. KNKyê "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" di têkoşîna dijî kolonyalîzmê û asîmilasyonê da dîyarî neteweyê Kurd kirîye û xelkê Kurd jî bihayekî mezin daye vê biryara KNKyê û dê vê cejnê li her 14ê Gulanê bi giyanekî neteweyî pîroz bike. Li Kurdistanê û li her derê ku Kurd lê, dê "14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî" wekî cejneke neteweyî bête pîroz kirin û sala bêt jî dê bi vê bîr û bawerî û şûrê bete pîroz kirin û divêt bête pîroz kirin jî.

**YEKO ARDIL:** KNK di parlamentoyên wek Ewropa û hin deverên din de çalakî li dar dixê û axaftinan pêşkêş dike, gelo di qada navneteweyî de qebûlkirina KNKyê di çî astî de ye?

### **ROJAN HAZIM:**

KNK wekî rêxistineke sihwane ya neteweyî li derveyî welat fermî hatîye damezrandin û ji aliyê dem û dezgehên Yêkitîya Ewropayê ve jî fermî tete qebûl kirin û rêxistineke bi qedir û prestîj e. Dezgehên YEyê çu cara serlêdan, name û xwezîkeyên KNKyê bêbersiv nahêlin. KNK di hemû merkez, avahî û lokalên YEyê da kombûn û konferansan pêktîne, hevdîtinan digel berpirsiyarên YEyê dadine û didomîne. Yêk ji mîsyonê KNKyê jî pêkînana karê dîplomasîyê ye û têkilîyên KNKyê yên bi welat, dezgeh û organîzasyonên bîyanî ra di çarçoveya giştî da tene domandin. Belê dîsa ve, heke bi objektîvî bêjin, ji ber hukmê pêşîn yê hindêk derûdorên Yêkitîya Ewropayê û hetta Amerîkayê jî, têkilî di dereceya ku dil dixwaze da nayêne dîtin, lê ewe yêkser bi KNKyê ve girêdayî nîne, bi giştî bi rewşa bizava neteweyî ya xelkê Kurd, pozîsyona dewletên kolonyalist û dagîrker û herweha polîtîka navneteweyî ve girêdayîye û helbet

hisab û berjewendîyên navneteweyî jî roleke negatîv dileyizin di vî warî da. Lê axir kanalên vekirî hene û li goreyî hewcehîyên neteweyî têne bi kar înan. Tête hêvî kirin ku di rojên pêşîya me da têkilîyên navneteweyî hilkevin dereceya herî bilind û KNK jî ji bo vê yêkê kar dike.

21 Tîrmeh 2007

\*\*\*

## **Banga KNKyê ya li ser hîlbijartinên parlementa Tirkîyeyê yên 22ê Tîrmehê:**

### **Bo xelkê bi rûmet yê Kurdistanê**

Dewleta Tirkîyeyê ji ber krîza xwe ya navxweyî biryara hîlbijartinên pêşdem da û hîlbijartin di 22ê Tîrmehê da di bin siha muhtiraya ertêşê da dê çêbin. Di navbeyna hukûmeta Teyîb Erdogan û partiyên di yê sistemê da dijberîyeke xurt heye û dixwazin bi van hîlbijartinan hisaba hevdu safî bikin. Lê belê, gava dor hate pirs Kurdan, ev hevrikên dijwar, rikeberîya di navbeyna xwe da radikîn gardirobê û beramberî Kurdan tifaqa xwe ya bêyûm ya antî Kurd derdêxin pêş. Vê carê jî wisa kirin û daku rê li ber namzetên serbixwe yê Kurd bigirin, qanûna lîsteya yêkpare ya namzetên serbixwe û partîyan, di navbeyna seetekê da ji parlamentê derêxistin. Gava di warê sîvîl da hukûmet û partiyên sistemê ev qanûna dijminahîya Kurdan ji parlamentê derdixistin, ertêşê jî bi serê xwe biryara "navçeyên qedexekirî" îlan dikir li bajêrên stratejîk yê Kurdistanê û Hekarî, Botan û Sêrt dikire navçeyê leşkerî û jîyana sîvîl qedexe dikir. Herçend ev bajêre hatin bi nav kirin jî, lê di esas da hemû bajêrên Kurdistanê kirine navçeyên leşkerî yê qedexekirî û operasyonên

xwe didomîne. Dewlet ji hemû cepheyan ve êrişê dike ku bêhnê li xelkê Kurd û namzetên serbixwe yê Kurd çik bike. Dewletê çerxa dadîyê jî aktîve kirîye û li ser namzetên serbixwe yê Kurd doz li ser dozê tête vekirin. Welhasil dewleta Tirk, daku rêya parlamentê li temsîlkarên Kurd bigire, hemû kartên xwe dileyize, çî metodên dijminahîyê hebin bi kar tîne. Xelkê me di van şertên gelek dijwar û negatîv da diçe hîlbijartinan.

Vêca em wekî KNK bangî xelkê xwe, xelkê Kurd, xelkên di yê Kurdistanê dikin ku van hîlbijartinan giring bigirin, sist negirin, bi hemû hêz û şiyana xwe ve, xwe bidine ser hîlbijartinan. Dewleta Tirk bi hemû mekanîzma û îmkanên xwe ve cepheye şer vekirîye beramberî xelkê Kurd û Kurdistanê. Ji serokwezîr heta serokên partiyên mîxalîf, roj nîne ku li ser sehneyên mîtingan zimanê xwe yê kirêt dirêjî xelkê Kurd nekin, kîn û xereza xwe kîvş nekin beramberî xelkê Kurd û rêber û temsîlkarên xelkê Kurd. Ertêş li Kurdistanê gund bi gund digere û gefa li xelkê Kurd dike ku rehîyên xwe nedin namzetên serbixwe yê DTPyî. Eynî tehdît li bajêran jî têne kirin. Başê kî ne ev namzetên serbixwe ku dewlet hinde xofan jê dike? Xelkê me baş dizane ku di warê legal û polîtîka sîvîl û demokratîk da partîya ku hêz û şiyana temsîlkarîya xelkê Kurd têda heye, DTP [Partîya Civata Demokratîk] ye. Dewletê bi rengê antî demokratîk, baraja seda deh [% 10] kirîye qanûn, daku Kurd bi navê partiyên xwe nekevin parlamentê. Ji ber vê baraja % 10 ya antî demokratîk, Kurd mecbûr man ku bi namzetên serbixwe bikevin van hîlbijartinan. Berî DTPyê, HADEP û DEHAP ketin hîlbijartinan û digel hemû zor û zulma dewletê jî, % 6.5 rehî înan, lê ji ber baraja neheq ya % 10 nikarîn parlementerên xwe rêkin parlamentê û ew rehî ji bo partiyên rejîma kolonyalîst hatin hesab kirin. Bes vê carê xelkê Kurda rê neda leyiz û entrîkayên dewletê û mafê xwe yê ketina hîlbijartinan bi rengê namzetên serbixwe bi kar îna. Temsîlkarên xelkê me, ji hemû bajêrên Kurdistanê û bajêrên Tirkîyeyê, xwe wekî namzetên serbixwe yê DTPyî nişan dane. Di van hîlbijartinan da, êdî du cephe kîvş bûne û li milekê dewleta Tirk hemû îmkanên xwe seferber kirine ku namzetên serbixwe yê DTPyî neyêne hîlbijartin, li milê di jî hêza xelkê Kurd heye û xelkê me jî dixwaze temsîlkarên xwe rêke parlamentê. Di vê rikeberîyê da êdî roj roja xîretê ye û xelkê Kurd jî divêt hemû hêz û îmkanên xwe seferber bike û vî cepheye bêyûm yê dewletê di nîveka sîdoqan da xerq bike. Xelkê me divêt baş bizane ku her rehîya ku ji bo namzetên serbixwe yê DTPyî bête dan, dê dengê azadîyê xurt bike. Belê nedana her rehîyekê jî dê dengê azadîyê



kêm, jar û lawaz bike. Xelkê me terciha xwe kivş kirîye û divêt dengê azadiyê bête xurt kirin û ev rehîyên di sindoqan da kom dibin dê dengê xelkê Kurd gurtir bikin. Kurdistan divêt temsîlkarên xwe rêke parlementê ku doza heq ya xelkê Kurd li wê platformê jî bi cesaret bête parastin.

KNK hîlbijartinên 22ê Tîrmehê wekî roja hawara Kurda dibîne û divêt xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê biçine hawara namzetên xwe yên serbixwe yên DTPyî. KNK gazî xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê dike ku 22ê Tîrmehê biçine hawara xwe û rehîyên xwe bidin namzetên xwe, namzetên serbixwe yên DTPyî. Rehîyên Kurdistanê divêt bo namzetên serbixwe yên DTPyî biçin. Ji Kurdistanê divêt yêk rehîyek jî ji bo partîyên rejima dagîrker neçin!

KNK xelkê xwe gazî xîretê dike! Roja 22ê Tîrmehê her Kurdek, her Kurdistanîyek divêt biçe ser sindoqê û rehîya xwe bide xwe. Ew "xwe" jî namzetên serbixwe yên DTPyî ne.

Di hîlbijartinên 22ê Tîrmehê da serkevtin dê ya xelkê Kurd û tevayî xelkên Kurdistanê be!

### **Konseya Rêvebir ya KNKyê.**

**9 Tîrmeh 2007, Bruksel**

\*\*\*

## **Daxuyanîya KNKyê ya li ser hîlbijartinên 22ê Tîrmeha 2007ê:**

### **KNK xelkê xwe pîroz dike**

Hîlbijartinên parlamenta Tirkîyeyê yên 22ê Tîrmehê bi serkevtina namzetên serbixwe yên Kurdistanê ve bi dawî bûn. Aşkera bû ku 24 (\*) namzetên "Hizar hêvî" yên ku bi desteka DTPyê hatine nîşandan serkevtin.

Dewleta Tirk bi hemû mekanîzmayên xwe ve gelek sîstematîk xebitî ku rê li ber hîlbijartina namzetên serbixwe yên DTPyê bigire. Ji hêzên sîvîl heta yên leşkerî û îmkanên malî yên dewletê û herweha

zulm û zoreke nedîtî, anku pêkve çerxa dewletê wekî toka fetisandinê li dor namzetên serbixwe yên "Hizar hêvî"yê hate bi kar înan. Belê mîsa ve nikarîn hîlbijartina grûbeke namzetên serbixwe yên DTPyê asteng bikin. Xelkê me û herwisa namzetên serbixwe yên DTPyê bi cesareteke mezin û xebateke xurt û dînamîk hemû bend, asteng, dek û dolab û hîlebazîyên dewletê berteref kirin û relatîven jî be, encameke serkevtî bi dest ve înan. Ev berxwedan û têkoşîna xelkê me û namzetan nîşandayî bi serê xwe hêjayî hemû teqdîr û pîrozîyan e. KNKyê berî hîlbijartinan jî bangî xelkê Kurd û kêmanîyên dî yên Kurdistanê kiribû ku destekê bidine namzetên serbixwe yên DTPyê. Bi vê encama serkevtî têtê dîtî ku xelkê me wekî hemû rêxistinên Kurd, guh daye banga KNKyê jî û em spasî xelkê xwe dikin ku bi hejmareke bilind ya rehîyên xwe namzetên xwe rêkirin parlementê. KNK xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê pîroz dike û spasdar e.

KNK namzetên hatine hîlbijartin jî pîroz dike û hêvî dike ku di demê xebata parlementê da li goreyî mîsyonê bizava neteweyî ya xelkê xwe bixebitin, bi doza neteweyî û demokratîk ya xelkê xwe ve girêdayî bin û vê platformê layiqen bi kar bînin.

KNK hêvî dike ku kêm û kasî û hetta şaşîyên ku di demê hîlbijartinan da hatine kirin jî bi vê encama hîlbijartinan bibe tecrubeyek ku ji bo kar û xebatên paşerojê bibine dersdêr.

KNK herweha hêvî dike ku ev qonax û destkevtan nû bibe çeperekî xurt û pêşkevtî di prosesa têkoşîna xelkê Kurd û doza Kurdistanê da.

### **Konseya Rêvebir ya KNKyê.**

**24 Tîrmeh 2007, Bruksel**

(\*) *Dewleta Tirk, bi hemû hîlebazîyan rehîyên du namzetên serbixwe yên DTPyê [Edene û Mersîn], bi operasyoneke nivêşevê dane berze kirin û hîlbijartina wan betal kir. Bi daxuyanîya fermî ya dawîyê, ji lîsteya "Hizar Hêvî" 22 parlementer hatin hîlbijartin. Yêk ji wan serokê ÖDPyê [Partîya Azadî û Piştgirîyê] Ufuk Uras e. Ji 22 parlementeran 20 bûne endamê DTPyê û DTP fermîyên bû xwudan grûb di parlamenta Tirkîyeyê da. Di dîroka Tirkîye û Kurdistanê da, fermîyên nebe jî, pratîken ewilcar e ku parlementerên bi navê xelkê Kurd û Kurdistanê hatine hîlbijartin bi navê partîya xwe û wekî grûb di parlamenta Tirkîyeyê da cih digirin.*



**Behîname:  
Li ser mirina  
Orhan Doxan**

**Bi mirina Orhan Doxan  
xema me mezin e.**

Hizarcar mixabin ku Orhan Doxan mir. Orhan Doxan yêk ji têkoşerên bêtirs yê bizava neteweyî ya xelkê Kurd bû. Ji destpêka salên 90î were di nav xebata legal û demokratîk ya bizava neteweyî ya xelkê Kurd da cihê xwe girt û têkoşîneke bihadar da. Di vê prosesê da tûşî zor û zulma dewleta Tirk hat û ji 1994ê heta 2004ê deh salên xwe di zîndana dewleta Tirk da borandin. Piştî derketî jî digel hevalên xwe di organîzekirina bizava nû ya partiyetî da roleke giring leyist. Ji bo hîlbijartinên îsal yê 22ê Tîrmehê jî bû namzet, lê belê dewletê bi biryareke polîtîk rê neda Orhan Doxan. Belê Orhan Doxan dîsa ve xebata xwe sist nekir û kete nav xebateke xurt û ji bo propaganda hîlbijartinan li seranserê Kurdistanê gerîya. Orhan Doxan, jîyana xwe fedayî doza neteweyê xwe û hemû xelkên Kurdistanê kiribû û mixabin krîza dil jî ew li ser sehneya propagandaya hîlbijartinan li Bazîdê girt. Orhan Doxan li ser karê neteweyî canê xwe da û tevî karwanê şehîdên Kurdistanê bû. Neteweyê Kurd vî lawê xwe yê fedakar û egîd çu cara jî bîr nake û dê her dem bi rêzgirtinî bi bîr bîne. Orhan Doxan fizîken mir, belê ew bi bîr û bawerî û pratîka xwe ya neteweyî ve dê her dem bijî û bête jîyandin.

Em wekî KNK gelek bi xem in û şîrkê xema malbata Orhan Doxan in.

Bila serê neteweyê Kurd û xelkên Kurdistanê sax be.

Bila serê heval û hevrêyên wî û partiya wî DTPyê sax be.

Bila serê malbata wî ya bi xem, kul û keser sax be.

**Konseya Rêvebir ya KNKyê.  
29 Hezîran 2007**

**Li ser girtina endamê**

**KNKyê**

**Haydar Işık,  
daxuyanîya li jêr  
hate dan:**

**Dewleta Elman, derhal nivîskarê  
Kurd, Haydar Işık, berdin!**

Dewleta Elman bi girtina ronakbîr û nivîskarê navdar yê Kurd Haydar Işık bi timamî tixûbê sebir û tehemmulê bezandîye. Elmanya bi agir dileyize. Terora ku dewleta Elman li ser Kurda bi kar tîne kêmtî ya dewleta Tirk namîne. Êdî bes e, heqê Kurdan e ku bizanin, Elmanya dixwaze çî bike!. Rêvebirên bêberpirsiyar yê dewleta Elman divêt îzahatekê bidine xelkê Kurd ka nîyeta wan çî ye!. Hukûmet û hemû mekanîzmayên dewleta Elman ev demek e ku teroreke gelek sistematîk li ser Kurdên Elmanyayê bi kar tînin.

Roj nîne ku polisê Elman neavêje ser malek anjî komeleyeke Kurdan. Xelkê me yê li Elmanyayê gelek heq jî vê zulm û zora polisê Elman bêzar in û mixabin ku sistemê dadîya Elman jî girtinên bêhuqûq û bêqanûnî dike. Heta îro gelek polîtîkerên Kurd hatine girtin ku yêk ji wan jî Muzaffer Ayata ye ku ev nezîkî salekê ye girtîye ku endamê me ye.

Vê gavê jî endamê KNKyê nivîskar Haydar Işık hatîye girtin. Dewleta Elman bi vê polîtîka xwe gelek aşkera destekê dide dewleta Tirk û van êriş û girtinan li ser daxwaza dewleta Tirk pêktîne. Em baş dizanin ku têkilîyên dewleta Elman yê digel dewleta Tirk kevin in û di her demî da jî di eleyhê xelkê Kurd da hatine bi kar înan. Dewleta Tirk digel dewleta Elman di nav bazareke gelek kirêt da ye dijî Kurdan. Dewleta Elman bi van êriş û girtinên li ser Kurdan, esasen bihayên demokratîk yê Yêkitîya Ewrûpayê jî bînpê dike. Kurdên li Elmanyayê yêk ji xelkên herî organîze ne û digel bi kar înana mafên xwe yê demokratîk yê li Elmanyayê, berpirsiyarîyên xwe

yên neteweyî jî ji bîr nakin û gelek aktîv hêzê didine bizava neteweyî ya xelkê Kurd. Dewleta Tirk ji vê hêza organîze aciz e û fişareke mezin tîne ser dewleta Elman ku berpêyên Kurdan teng bike.

Dewleta Elman jî ji ber berjewendiyên xwe yên ekonomîk û polîtîk di kanalê polîtîkên dewleta Tirk da kiryanan dike dijî Kurdan. Girtina Haydar Işık jî dewama vê polîtîka dewleta Elman ya di çarçoveya tifaqdarîya bi dewleta Tirk ra ye.

Em wekî KNK vê despotîzma dewleta Elman ya li ser Kurdan şermizar û protesto dikin. Dewleta Elman divêt rojek zûtir, endamê me, nivîskarê navdar yê Kurd Haydar Işık berde û ji ber vê qusûra xwe û herweha reftara xwe ya antî demokratîk jî, hem ji Haydar Işık, hem ji KNKyê û hem jî ji xelkê Kurd lêborînê bixwaze.

Heta ku endamê me Haydar Işık bête berdan, em wekî KNK dê hewildanên xwe yên demokratîk û huqûqî bidomînin. Haydar Işık divêt derhal bête berdan!

**Konseya Rêvebir ya KNKyê.**

**06 Tîrmeh 2007, Bruksel**

[Haydar Işık, piştî protestoyên berfireh, 17ê Tîrmehê hate berdan.]

\*\*\*

**«... Dewleta Tirk digel dewleta Elman di nav bazareke gelek kirêt da ye dijî Kurdan. Dewleta Elman bi van êriş û girtinên li ser Kurdan, esasen bihayên demokratîk yên Yêkitîya Ewrûpayê jî binpê dike...»**

[Lêborîn: Ev spasnameya li jêr piştî seradanîya delegasyona KNKyê ya Kurdistanana Federal, ji kes û hêzên ku hevdîtin pêkhatî ra hatibû şandin. Me ji bîr kir ku di KNK Bulten hj.2yê da cih bidinê. Digel lêborînê di vê hejmarê 3. da diweşînin.

KNK Bulten]

## Spasname

**Xwûşk û birayên hêja,**

Ji Konseya Rêvebir heta hemû endamên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, dizanin ku yêk ji binasên hebûna KNKyê, avakirin û pêkînanana yêkitîya neteweyî, diyaloga navxweyî, têkilî û danûstandina hemû elementên neteweyî ye. KNK ji demê avabûyî were, ji bo vê armancê kar û xebata xwe didomîne.

Bi vê armanc û munasebetê, delegasyona me di peryoda dawîya meha Çile û serê meha Sibatê da seradanîya Kurdistanana Federal kir. Di demê vê seradanîyê da, we gelek ji dil û bi germahî em pêşwazî û mêhvan kirin. Hevdîtin û gotûbêjên digel we, gelek birayane borîn û em bawer dikin ku xizmeta yêkitî û tifaqa neteweyî kirin. Em hêvî dikin ku ev têkilîya pêkhatî berdewam û mayînde be.

Em ji ber mêhvandarîya we ya ji dil û germ ya wan rojên xweş, gelek spas dikin.

Digel rêz û silavên me.

**Delegasyona KNKyê:**

ELÎ EGID, serokê KNKyê

TAHIR KEMALÎZADE, cihgirê serokê KNKyê

ROJAN HAZIM, endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê

ADEM UZUN, endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê

**04 Adar 2007, Bruksel**

”... Piştî kombûna giştî ya Gulana 2006ê, KNKyê daxuyanîyek belav kiribû û wisa gotibû ; « ... di roja îro da konfilîkta sereke di navbeyna hêzên demokrasîxwaz û anî demokratîk da ye... » Ev tesbîte di derbareyê pirsê Kurdî da hem li Tirkîye, Iran û Sûrîyeyê û hetta di Iraqa nû ya Federal da, hem jî li seranserê cîhanê jî xala sereke ye. Rastîya vê tesbîtê îro jî kiviş e. Bizava neteweyî ya xelkê Kurd di rêza pêşiyê ya bizava giştî ya demokrasîyê da ye li rojhilatanavîn. Çareserîya konfilîkta sereke bêyî çareserîya pirsê Kurd pêşnakeve li rojhilatanavîn ku eve tesîrê li ser polîtîka cîhanê jî dike. Anku îro kilîlê vekirina pirsê girêkên li rojhilatanavîn ji çareserkirina pirsê xelkê Kurd derbaz dibe. KNK îro jî di vê bawerîyê da ye û em dê kar û xebata xwe li ser çareserkirina vê konfilîkta sereke vehûnin û ji bo pêkînanana tifaqa navxweyî ya neteweyî jî bê rawestan kar bikin...”

[Ji rapora Konseya Rêvebir ya KNKyê]

## Ji edîtorîya

### KNK Bultenê:

KNK Bulten sê meha carekê derdikeve.

Belê çapa perîyoda havînê jî ber tetîla çapxaneyê mehekê direng ket.

Me jî di vî keysî da daxuyanîyên di meha Tîrmehê da hatine dan jî li Bultenê zêde kirin.

Konferansa Jinan ya KNKyê jî 1ê Tîrmehê xilas bû, lewma me belavoka encamê û biryarên konferansê û herweha daxuyanîyên li ser hilbijartinên 22ê Tîrmehê jî di hejmarê sêyê da bi cih kirin.

Axir, nivîsar, nûçe û daxuyanîyên KNKyê yê mehên Nîsan, Gulan, Hezîran û Tîrmehê di vê hejmarê da ne.

Heta hejmareke dî, bimînin di nav xêr û xweşîyê da.

Edîtor

www.arsivakurd.org

---

**Adres:**

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]  
Rue Jean Stas 41 / 1060 Bruxelles, Belguque  
Tlf.: 0032 2 647 30 84 / Fax.: 0032 2 647 68 49  
[www.kongrakurdistan.net/com/org](http://www.kongrakurdistan.net/com/org)